# Heke Nehatina Kuştin dê Niha Hevalê Me Bûna

## Li Bajarên Kurdan Binpêkirinên Mafê Jiyanê yên Zarokan

Yasemin Soydan, Medzan Nakçi, Xemgîn Yusuf Görücü

HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ

HAFIZA MERKEZİ

**Heke Nehatina Kuştin dê Niha Hevalê Me Bûna**

Li Bajarên Kurdan Binpêkirinên Mafê Jiyanê yên Zarokan

**Nivîskar:** Yasemin Soydan, Medzan Nakçî, Xemgîn Yusuf Görücü

**Pêşgotin:** Ezgi Koman

**Wergêr:** Ferhad Çeper

**Hakikat Adalet Hafıza Merkezi**

Ömer Avni Mahallesi İnönü Caddesi Akar Palas No: 14 Kat: 1 Daire: 2 Beyoğlu,
İstanbul, Türkiye 34427

+90 212 243 32 27 | info@hafiza-merkezi.org | www.hakikatadalethafiza.org

Spasî bo Chrest Foundatîon û Komeleya Heînrîch Böll Stîftungê ji ber alikariya wan bo vê xebatê.

CHREST FOUNDATION

HEINRICH BÖLL STIFTUNG DERNEĞİ TÜRKİYE TEMSİLCİLİĞİ

# naverok


4 Pêşgotin

9 Destpêk

17 Cizîr (Cemile) Çağırga

30 Nihat Kazanhan

57 Rozerin Çukur

85 Xurbet (Selma) Kılıç

97 Xezal (Gazal) Beru

104 Pêlavek (Hevpeyvîn)

112 Hîn dîmenên ji pêvajoya xebatê

116 Grafîk

# Pêşgotin

Ezgi Koman

Gava em li rabirdûya nêzîk ya Tirkîyê dinerin em "rabirdû"yek cînayetên faîl nedîyar, wendahîyên di bin çavan de, revandin, koçkirinên bi zorê, miameleya xerab, êşkence, heqaret, cerdevankirina bi zorê, jîngehên hatine şewitandin, hatine valakirin, ji bo devjê berdanê hatine zordarîkirin, goristanên hatine xerakirin û hê gelek binpêkirinên mafên mirovan yên din tê de hene dibînin.

Ev "rabirdû" îro em jê haydar bin an jî ne haydar bin, em qala wê bikin an jî nekin a rast ji bo me hemûyan rewşek wêranker ku em nekarin pê re derxin serî çêdike, weke gabûsan digre serme: Ji ber ku ev rabirdû nehatîye qebûlkirin, ser wê hatîye girtin, pê re nehatîye rûberîhevbûn, lêborîna wê nehatîye xwestin ji destê me hemûyan pêşî heqîqet, paşê hesta me ya dadmendîyê talîyê ûjdanê me û hêvîya me distîne; hêza me ya avakirina dahatûyê kêm dike. Ev rabirdû encamek pevçûna li Tirkîyê ji 40 salî zêdetir e berdewam dike û bandorên wê yên wêranker e.

Ji vê encamê çi heyf ku zarok jî qet muaf nebûn. Heta zarok ligel ku wan bi xwe nedabûn destpêkirin jî, bi sedema pêvçûna ku belkî jî herî pir wan jê bandor girt ya 40 sal in berdewam dike, jîyana xwe ji dest dan, rasterast duçarî tundîya fîzîkî, zayendî, psîkolîk man an jî bûn şahidê vê tundîyê. Endamên malbata xwe, mervên xwe, hevalên xwe, mamosteyên xwe û nasên xwe wenda kirin. Weke ku duçarî êşkenceyê û miameleya xerab mana wan ne bes be di radeyên cuda de bi cihêkarîyê û vederkirinê re rû bi rû man. Ligel qedexekirina axaftina zimanê xwe yê dayikê nekarîbûn bigihîştina mafê perwerdehîyê, mafê tendurîstîyê, mafê di nava aştîyê de jiyînê. Zarokan ji ber feqîrbûna pevçûnê derxistibû holê feqîrî û tunebûn dîtin. Weke ev hemû ne bes bin bi zorê hatin koçberkirin. Li cihên çûnê neçar man ku bixebitin. Yên ku koç nekirin jî bi bandora pevçûnê an bûn "girtî"yên derdora polîtîk an jî bi etîketa "terorîst" bûn yên dewletê. Di heyamên pêşî yên pevçûnê de, di 1990an de, zarok bi piranî tenê dema jîyana xwe ji dest dan hatin rojevê. Lê rojev wê çaxê jî pir bi lez bû ku pir jî nekarîbûn di rojevê de bimana. Di serê salên 2000an de jî hê bêtir di lêkolînên "koç"ê de cih dîtin. Weha ku ev zarokên hatine koçberkirin li bajarên mezin an "tînercî" an jî "kapkaççî" bûn!

Muhatab stendina zarokan jî ya ji alî dewletê -û belkî ji alî civakê jî- di vê "rabirdû"yê de a rast di nîveka salên 2000an de destpê kir. Haydar Darıcı ev rewşa weke "destpêkirina têgihiştina ne bûyera edlî, tehdîtek berê xwe daye

dewletê û pergalê" ya zarokan pênase kiribû.[1] Bi rastî jî di 21ê Adara 2005an de pêşî dema pîrozkirinên Newrozê yên li Mersînê dîmenên şewitandina ala Tirkan ya du zarokan kete çapamenîyê. Paşê bi van dîmenan zarok ji alî rêvebir, nûnerên mixalefetê yên wê heyamê, bi eşkereyî weke armanc hatin nîşandayîn, weke "lenetkirî" û "yên nayên efûkirin" hatin îlankirin. Her çiqas ku zarokan gotin kesên bi bedil û bi krawat hatine cem wan û al dane destê wan û ew dane şewitandin jî bi ser van îfadeyanan de nehat çûyîn û zarok sûcdar hatin dîtin û hatin girtin. Piştî çar salan, dema lêpirsînên Ergenekonê derketibe holê ku îfadeyên zarokan yên wê heyamê rast bûn jî kesî wan nanî bîra xwe, meraq jî nekirin, lêborîn jî nexwestin...

Ji bo zarokan mêjûyek girîng ya din jî navbera 28-31ê Adara 2006an bû. Dema cenazeyê çardeh endamên rêxistinê, li Amedê protestoyan destpê kiribû, zarok û ciwan jî tevlî van protestoyan bibûn. Ligel ku ji ser îmzekirina Peymana Mafên Zarokan ya NY[*Neteweyên Yekbûyî*]yê -ji wê rojê şûnde- 11 sal derbas bibû serokwezîrê wê heyamê gotibû "Jin jî be zarok jî be ji bo hemû kesên bûne maşeya terorê ewê hewceya wê bê kirin" û heft zarokan jîyana xwe ji dest dabûn, bi sedan zarok hatibûn binçavkirin û girtin[2]. Tavilê piştî wê jî guhertina Zagona Têkoşîna bi Terorê re(TMK) hatibû çêkirin, pêşî lê hatibû vekirin ku zarokên ji 15 salî mezintir têkildarî sûcên dikevin bergehê TMKyê zarokbûna wan ji nedîtî ve bê û li Dadgehên bi Rayeya Taybet bêne darizandin. Vê guhertina bi awayê li dijî rêgezên pergala dadmendîya zarokan, Peymana Mafên Zarokan ya NYyê û Makezagonê "hin zarok" ji "zarok"bûnê derxistibû, "terorîst" îlan kiribû. Bi vî awayî di navbera salên 2006-2009an de herî kêm 4000 zarok di bergeha TMKyê de hatibûn darizandin, hatibûn girtin, duçarî êşkence û miameleya xerab hatibûn hiştin[3]. Bi hewldana civaka sivîl her ku tiştên zarok dijîyan berbiçav dibû, her çiqas ku zarok ji dêvla "terorîst" destpê kiribû weke "zarokên kevir avêtine" dihatin kategorîzekirin jî di zagonê de guhertin hatibû çêkirin, beşek ji zarokan ji bo demek kin be jî hatibûn berdan. Belê bi sazkirina nû ya di TMKê de hatibû kirin darizandina zarokên hatibûn berdan, destpê kiribû ku li dadgehên zarokan bêne kirin lê veya bergîya wê negirtibû ku zarok li dadgehan weke "terorîst" bêne dîtin û bi rêyên cuda bêne cezakirin.

1 Haydar Darıcı, "Şiddet ve Özgürlük: Kürt Çocuklarının Siyaseti,[Tundî û Azadî: Sîyaseta Zarokên Kurd]" Toplum ve Kuram[Civak û Teorî] 2 (2009), 17-41.

2 Radikal, "Zarok jî, jin jî be midaxeleya hewce dike tê kirin," (1 Nisan 2006): http://www.radikal.com.tr/turkiye/cocuk-da-kadin-da-olsa-gereken-mudahale-yapilir-776215/.

3 Rapora Sîtavê ya STKê[*Saziya Civaka Sivîl*] ya ji bo Komîteya Mafên Zarokan ya NYyê hatibû pêşkêşkirin

Di heman heyamê de zarok, weke girtina wan ne bes be, di sazîyên tê de dora wan hatibû girtin de jî duçarî binpêkirina hin mafan diman. Weke mînak bûyera li ragirtîxaneya Pozantıyê ji ber -ya herî sivik- sersarîya karmendên parastina înfazê zarokên Kurd duçarî tundîya hevtemenên xwe mabûn, herçî ku ji alî rayedaran hate gotin ku "munferît" e jî ji alî yên girtîgehan dişopînin dihat zanîn ku ne weha ye. Zarok bi awayekî dişibin veya li sazîyên cihên weke Şakran, Erzîngan, Xarpêtê jî duçarî tundîyê diman.

Ji bo zarokên nehatibûn girtin, dora wan nehatibû girtin jî çi heyf ku dîsa binpêkirinên mafê jîyanê yên ne munferît berdewam dikirin: Eyn weke Yahya Menekşeyê 16 salî ku di bin panzêrê de ma, Ceylan Önkola 12 salî ku bi guleya hawanê jîyana xwe ji dest da, Mizgîn Özbeka 10 salî ku di navbera pevçûnê de mabû, Erdal Saçakê 16 salî ku pêl mayinê kiribû an jî weke 19 zarokên li Roboskîyê gava sînor derbas dikirin hatibûn kuştin…

Mirinên zarokan di du salên pêvajoya bêpevçûnî û dîyalogê ya ku di sala 2013an de destpê kir de kêm bûn. Qe nebe di vê heyamê de ji ber pevçûnên çekdar yên rasterast mirinên zarokan çênebûn.

Madem pêvajoya bêpevçûnî bû, madem hêvîya aştîyê hebû, gava weke "divê zarok jî bibin kirdeyê aştîyek muhtemel" dihat axaftin van axaftinana li dorhêla bi pevçûn ya ku piştî hilbijartinên 7ê Pûşpera 2015an gurbûna wê her ku çû zêde bû cihên xwe ji bangewazîyên alîkarîyê yên lezgîn re hiştin. Di van rojên ji 5ê Pûşpera 2015an heta 16ê Gelawêja 2015an dirêj dibe de, êrişên Amedê û Sirûcê, li Rihayê kuştina du polîsan, operasyonên hewayî yên li dijî Pkkê pêk hatin, binçavkirin û girtinên girseyî pêk hatin û operasyon hatin destpêkirin. Di van operasyonên li qadên jîyanê yên zaroka hatin kirin de li gor raporên TİHVê herî kêm 123 zarokan jîyana xwe ji dest dan. Dîsa li gor daneyên TİHVê li 9 bajar û herî kêm 35 navçeyan, qedexeya derketina derve ya **herî kêm 111 heb bêmawe û bi dirêjahîya rojê** ku weke fermî dikarîbûn bihatana tespîtkirin hatin îlankirin[4]. *Di van qedexeyan de ligel mirinan* herî kêm 600 hezar zarok duçarî binpêkirina hin mafan man.

Ji Tîrmeha 2016an pê ve pevçûna gurbûna wê zêde ya li qadên jîyanê yên zarokan berdewam dikir bi dawî bû lê ji van deran hatina nûçeyên mirina zarokan berdewam dike… Êdî çi heyf ku zarok di encama lêxistina

[4] TİHV, "16 Gelawêj 2015-16 Gelawêj 2016 Nota Agahîyê ya Qedexeyên Derketina Derve û Sivîlên Jiyana Xwe Ji Dest Dane," (21 Gelawêj 2016): https://tihv.org.tr/sokaga-cikma-yasaklari/16-agustos-2015-16-agustos-2016-bilgi-notu/

wesayîtên zirxî yên ku li dorhêla bajêr û kuçeyan bêfikar tevdigerin an jî ji ber bermeyîyên pevçûnan jîyana xwe ji dest didin.

Li gor raporên İHDyê ji ber lêxistina wesayîta zirxî herî kêm hijdeh zarokan jîyana xwe ji dest dan. Ji van zarokan yê dawî Mîhraç Miroğluyê 7 salî bû. Mîhraçê ku di meha Îlona par de li navçeya Hezexê ya bi ser Şirnexê ve girêdayî ye gava bi piskilêta xwe digerîya di encama wesayîta zirxî li wî xist jîyana xwe ji dest da, jîyana wî çîrokek nîvcomayî ye...

Ev weşana hûn di destên xwe de digrin, ji alî zaroknî din yên ku ferqa wan ji zarokên di pêvçûna 40 sal e berdewam dike de jîyana xwe ji dest dane ya tenê ew e ku "nekarîbûn bihatana kuştin" ve hate amadekirin. Ji ber vê jî hem pir rast e, hem jî pir bandorker e... Ev weşan li hemberî gabûsa bi wêrankerîyek êdî em nekarin pê re derxin serî girtîye ser me, a rast bêhnek e. Ev weşan zarokan dixe navenda xwe û ji bo tiştên hatine jiyîn, ser qet tu ji wan neyê girtin, her yek ji wan bê qebûlkirin û rûberîhevî çêbibe, a rast alîkarîyek ji bo avakirina aşitîyê ye... Ji bo avakirina aşitî, dadmendî û hilbet azadîyê...

Ji bo hemû zarokên hatine kuştin û kesên ketine pey çîrokên wan yên nîvco mane bi rêzdarîyek kûr...

Ezgi Koman

# Destpêk

Yek ji encamên herî girîng ya li Tirkîyê pêvajoya bi pevçûn û polîtîkayên şer ên zêde dibe jî bûye binpêkirina mafê zarokan ya li bajarên Kurdan. Ev binpêkirinên ji binpêkirinên mafê zimanê dayikê bigrin heta mirin û birîndarbûna zarokan encamên kûr çêdike, gava weke tevahîyek tê lêkolandin tê dîtin ku perçeyek polîtîkaya sîstematîk e. Lê mirinên zarokan ên rû didin gelek caran di nav nûçeyên em dixwînin de ji nav destê me dişemite û dihere, em jê haydar nabin ku ne ev mirinana sîstematîk in û ne jî yên ji jîyanê tên qutkirin hê zarok in. Ji bilî vê em pê hayil nabin bê ka bûyîna zarokek li bajarên Kurdan dijî tê çi wateyê. Bûyîna zarokek li bajarên Kurdan, li gor zarokên li bajarên din dijîn tê wateya di îhtimala berdewamkirina jîyana we de kêmbûnek di rajeya berbiçav de. Û tê wateya li hember dema diherike, mirovên mezin dibin û her tiştî heta hetayê zarok mayînê: weke Nîhat, Cemîle, Ceylan, Xezal, Beytûllah û gelekên dinê... Di 21 salan de 385 hevalên me ji jîyanê qetandin:  Ewqas pir hevalên me zarok man ku, mirov naxwaze jê bawer bike ku evqas pir çîrok nîvco mane. Ê me, ferqa me ya tenê ji hevalên me yên em li pey çîrokên wan diherin em “nehatine kuştin” û  weke yên nehatine kuştin em dengê hevalên xwe yên hatine kuştin in. Lewra em vê hîs dikin: “Heke nehatana kuştin ewê bibûna hevalên me.”

Di heyamek mirina zarokan û birîndarkirina zarokan weha ji rêzê tê hesibandin û tê bêbîrkirin [hafızasızlaştırma] de em weke sê ciwanên di atolyeyên “Bîr û Ciwantî”yê yên Hafıza Merkeziyê [Navenda Bîrê] li dar dixist de hatin cem hev, me însîyatîf stend û em ketin pey çîroka hevalên xwe yên li bajarên Kurdan ji sala 2000an bi vir ve bi bandora şerê giran bûye û hêza dewletê hatine kuştin û hatine birîndarkirin. Gava me dest bi xebatê kir armanca me ya herî girîng ew bû ku em çîrokên hevalên xwen yên hatine kuştin û hatine birîndarkirin bi bîra zaroktîyê re pêwendîdar bikin. Lê gava me dest bi xebatê kir me dît ku hê xebatek daneyî ya bike ku ev binpêkirinana bi awayekî giştî  bên dîtin û bi nerînek tevahîkirî bên lêkolîn jî nehatibû kirin. Ji ber vê sedemê berîya em derbasî beşa bîra zaroktîyê bibin serê pêşîn me kedek mezin da berhevkirina daneyên belavbûyî yên di navbera salên 2000-2020an de. Bi vê armancê ji bo di derbarê mirina zarokan û birîndarkirina zarokan de em karibin agahî bistînin diviya em bigihîştana rapor û nûçeyên giştî yên mafên mirovan ên salane. Bi dirêjahîya xebata daneyî me raporên giştî yên salane yên İHDyê, raporên giştî yên salane yên ji alî TİHVê hatibûn amadekirin, raporên Gündem Çocuk Derneği, raporên MAZLUM-DERê û hê gelek çavkanîyên din (weke arşîvên

rojnameyan, hin bûyerên herêmî yên derbasî qeydan nebûne) di ber çavan re derbas kirin û me ew xwendin û ew lêkolandin. Herçî ku di hin mînakan de gîhaştina çavkanîyê hêsa bû jî carinan dibû ku rapor hatibin jêbirin. Di dawîya dawî de me ji van hemû raporên bi ser hev de ji hezaran rûpelî derbas dikin mirinên zarokan û birîndarkirinên zarokan berhev kirin. Û me ev daneyana veguherandin awayekî databaseke dîjîtal. Tabloya me bi keda xebata bi mehan berdewam kir derxistibû holê aktîvîstên li qada mafên zarokan kedê didin jî şaş dihişt. Ligel pirbûna bûyerên mirin û birîndarkirinê, sîstematîkbûna vana ya di nava xwe de me ber bi li ser daneyan bêtir kûrbûnê dahf da. Li gor daneyên me, di navbera salên 2000-2020an de ji ber şer û bermeyîyên şer û hêza dewletê "**385 zarok hatine kuştin û 850 zarok hatine birîndarkirin**". Û ev daneyana tenê yên derbasî qeydan bûne ne. Heke em li gor heyaman bi kurtasî qala van encaman bikin:

- Di pêvajoya navbera 2000-2005an de bi bandora şerê giran yê li qada çolterê û heyama OHALê, ji ber bermahîyên şer yên weke mayin û bombeyê, pir zêde mirin û birîndarî pêk hatine. Bi giştî ji binpêkirina mafê jîyanê yê 80 zarokan ku di vê pêvajoyê de hatine jiyîn 66 jê ji ber mayinên bejahîyê û teqemenîyên bêxwedî qewimîne. (Bi piranî gava pez diçêrandin di encama pêl mayinê kirinê de, gava bi narincokên li erdê dîtibûn dilîstin, gava bi madeyên teqemenî yên li zevîyê dîtibûn dilîstin...)

- Di salên 2006-2009an de jî hêdî hêdî ji hêlên çolter bêtir mirinên li bajaran û di xwepêşandanên civakî de hatine jiyîn hene. Di heyama ji 2000an digihêje heta 2020an de mirinên ewil yên di encama lêketina wesayîtên zirxî hatin jiyîn jî di van salan de pêk tên. Di vê pêvajoyê de hêmanek din a balê dikşîne jî dibe **mirina zarokan a girseyî**. Di sala 2006an de li Amedê ji alî komek bi navê TİK(Türk İntikam Tugayı [*Tûxaya Tolhildanê ya Tirkan*]) di êrişa bombeyî (Qetlîama Koşuyoluyê) ya hate pêkanîn de 7 zarok, di sala 2009an de jî li Mêrdînê di qetlîama gundê Bîlgeyê ya ji alî cerdevanan ve hate pêkanîn de 7 zarok tên kuştin.

- Di salên 2010-2014an de di eksena pêvajoya çareserîyê de giranîya şer hindik bibe jî mirinên zarokan di vê heyamê de jî weke polîtîkayekê berdewam dike. Di vê heyamê de di qetlîama Roboskîyê de ya ku yek ji qetlîamên herî rûreş a dîroka Tirkîyê ye 21 zarok tên kuştin. Di salên

2010-2014an de li hember ku hewldanên çareserîyê hebûn jî mirina 74 zarokan pêk tê.

- Salên 2015-2016an dibe heyamek ku binpêkirin derdikevin lûtkeyê û zarok li bajaran rasterast tên nîşan girtin. Di vê pêvajoyê de berevajî pêvajoyên din hê bêtir mirinên bi çeka agirber û rasterast nîşan girtinê pêk tên. Di vê heyamê de 8 zarok li jêrzemînên Cizîrê bi şewitandinê tên kuştin. Tenê di salên 2015-2016an de 136 zarok tên kuştin û 199 zarok tên birîndarkirin.
- Di salên 2017-2020an de jî bandorên li bajaran pêvajoya bi pevçûn berdewam dike. Li bajaran polîtîkayên ewlehîyê yên giran tên sepandin. Ji ber vê sedemê mirin û birîndarbûnên di encama lêxistina wesayîtên zirxî de herî pir di vê heyamê de pêk tên. Dîsa di vê heyamê de ji ber bermayîyên şer li navendên bajaran gelek mirin/birîndarî pêk tên. Ji bilî vê ji ber tevgerînên leşkerî yên li Sûrîyê, li bajarên li ser sînor in mirin/birîndarîyên zarokan yên zêde pêk tên.

Weke encam,

Salên 2000-2020an her çiqasî di bîran de weke pêvajoyek ji 90an vediqete xuya bike jî ya rast weke me bi daneyan jî derxiste holê heyama li Tirkîyê hikûmeta AKPê bû desthilatdar, ji hêla binpêkirinên hatin jiyîn ve weke berdewamîya 90an e. Em hebekî jî ji bo em vê rastîyê parve bikin evqasî xebitîn. Lewra ev pêvajoya di navbera salên 2000-2020an de ji alî nifşê weke me ciwan ve weke berdewamîya 90an nayê têgihîştin. Ev jî dibe sedem ku bi taybetî ciwan ber bi dahatûyê ve ji bîrek civakî nenerin. Dîsa divê em zanibin ku di van hemû pêvajoyana de ya herî pir berbiçav binpêkirinên mafê jîyanê û mafê hevgirtina laşî be jî li bajarên Kurdan zarok rastî binpêkirinên mafê perwerdehîya bi zimanê dayikê, mafê gîhaştina tenduristîyê, mafê rêzgirtina ji mirî re-veşartinê re û hê gelek binpêkirinên mafan hatine.

Bi dirêjahîya xebata xwe me vê fahm kir ku gava tê gotin ku li bajarên Kurdan mirin/birîndarîyên zarokan ev dibe derbirînek gelek awayên kuştin/birîndarîyên cuda dihewîne. Heke em ji bûyerên herî pir me şaş hiştin mînakan bidin;

- Gazal (Xezal) Beruya 11 salî di sala 2001an de, li Çewlîgê di encama leşkeran kûçik bi ser wê de berdan û ji bo êrişî wê bikin kûçik sor kirin hate kuştin.

- Beytullah Aydınê 11 salî, di sala 2015an de li Bağlara Amedê di encama polîsan heta kêlîya dawîyê bera dû wî dan ji qatê 7. kete xwarê û jîyana xwe ji dest da.
- Du bira Mihemedê 7 salî û Furkan Yıldırımê 7 salî  di sala 2017an de gava li salona mala xwe ya li Silopîyê di xew de bûn di bin panzêrê de man û jîyana xwe ji dest dan.
- Di sala 2011an de li Roboskîyê 19 zarokên temenê wan di navbera 13-18an de diguhere di encama bombebarana balafirên şerî de hatin kuştin.
- Heta îro gelek zarok gava bi bermayîyên pevçûnan dilîstin jîyana xwe ji dest dan.
- Weke dawî Mîhraç Miroğluyê 7 salî gava ji bo nan bikire bi piskilêta xwe diçû firnê di encama wesayîta zirxî li wî xist hate kuştin.

Me nexwest  em van tiştên hatin jiyîn weke hejmar an jî nûçe bibînin lewra her zarokek jîyanek û îhtîmalek  bêdawî ye... Ji ber vê sedemê ji bo ew neyên jibîrkirin, ji bo em çîroka hevalên xwe hîn bibin, em hevdu nas bikin, ji malbata wan, ji hevalên wan guhdarîya wan bikin em derketin rê û em çûn mekanên ew lê jîyabûn, kuçeyên wan, malên wan û em li çîroka jîyana Cizîr(Cemile), Nîhat, Xezal, Rozerîn, Xurbet, Beşîr gerîyan. Bi dirêjahîya xebata qadê ya me li navendên Cizîrê, Farqînê, Lîcê, Çewlîgê û Amedê meşand me çavdêrî pê kir ku li navendên bajaran sepandinên ewlehîyê yên hişk, tevgerîna wesayîtên zirxî û qereqolên li taxan hatine çêkirin hê bi giranî berdewam dikin. Sîya wesayîtên zirxî, çekan û qereqolan hê li ser “zarokan” e...

Me bandora van polîtîkayên sîstematîk di çîroka her hevalê xwe de dît: Weha ku di nav pirtûk, lênûskên dibistanê, lênûskên wêneyan yên malbatan li dû zarokên xwe veşartibûn de toma, panzêr û wesayîtên zirxî yên din ku em li wan wan rast dihatin ya rast awayê herî berbiçav yê vê rastîyê derdixin holê. Li bajarên Kurdan rewş e ku di awayê xwe derbirîna zarokan ya di hunera xwe de jî ne xweza, heywan, kuçeyên lê dilîzin, ev wesayîtên mirinê verdişin, ev polîtîka derketîye holê... Îja ku dîsa bi van wesayîtana kuştina zarokên van xêzana çêkirine sîstematîkbûna vê polîtîkayê radixe ber çavan. Ev polîtîkaya şer ya bi salan e zêde dibe û berdewam dike li bajarên Kurdan qada jîyanê ya zarokan ya herî xwezayî dagir kirîye. Weha ku polîtîkayek ne tenê li kuçeya xwe, li kolana xwe û li

parkên xwe gava em li salona mala xwe û di xewa xwe de bin jî ewê me ji jîyanê qut bike! (Du bira Furkan û Mihemed Yıldırım gava li salona mala xwe di xew de bûn di encama panzêr kete salonê û ew pelçiqandin de hatin qetilkirin.)

Li qadê rewşek balkêş ya lê dihat rasthatin ya din jî bîra “Tahir Elçi” bû. Hema hema di hemû hevdîtinên me de û di tiştên em li qadê hîn bûn de em pêrgî gelek tiştên di derbarê Tahir Elçi de hatin. Yek ji vana, kesê 24 salî ku me pêrê hevdîtin kir, yê ku di qedexeya derketina derve ya li Farqînê de hevalê xwe wenda kirîye û nexwest navê xwe bide, tiştên wî neqil kirin: “Tahir Elçi berîya bê qetilkirin hatibû Farqînê, lêkolîn dikirin. Sozek dabû me: ‘Ezê bibim şopînerê têkoşîna dadmendîya hevalê we’. Çi heyf  ku Tahir Elçi ji me stendin…”

Dayika Xurbeta ku di sala 2001an de hatibû qetilkirin Dayika Remzîye jî bi awayê “Piştî di sala 2001an de qîza min şehîd ket dema lêkolînên heyetê Tahir Elçi jî hatibû û têkoşîna hiqûqî jî dimeşand,” qala Tahir Elçi kiribû. Bavê Nîhat, Apê Emîn jî, gotibû “Tahir Elçi doz dişopand, soz dabû min jî ku ewê têkoşîna dadmendîyê bimeşîne…” û Tahir Elçi bi bîr anîbû. Me li her malê hîs kir ku di pêvajoya 20 salan ku em bi taybetî li ser wê hûr bûn de Tahir Elçi li her derê bûye şopînerê binpêkirinên mafê jîyanê yê zarokan, têkoşîna hiqûqî meşandîye û tu kes bi tenê nehiştîye. Li ber bîranîna wî bi rêzdarî…

Li hemberî dozên malbat û hiqûqzanên weke Tahir Elçi bi hewldanên mezin dimeşînin mirinên ji ber wesayîtên zirxî jî tê de ev hemû mirinên zarokan yên li bajarên Kurdan ji pêvajoyên bêcezatîyê yên weke hev derbas dibin. Weha ku ji ev pêvajoyên edlî yên piştî mirinan dest pê dikin re gotina ne “pêvajoya darizandinê” lê “pêvajoya jêpakbûnê[aklanma]” ewê hê di cî de be. Bi dirêjahîya xebata me ji dilê me jî nedihat em ji malbatan pêvajoya darizandinê bipirsin. Ji van mirovên ji canê wan can çûye di derbarê darazê de tim bihîstina heman peyvan jî perçeyek vê polîtîkayê bû: destûra lêpirsînê tune ye, bêtaqîbî û taloqkirin mewzûbehs e, delîl tune ye, zarok bi qisûr tê dîtin, bi dehan danişîn û di dawîya gişan de heman xal: “Jêpakbûn…”

Bi çavdêrîyek giştî ya ji rêzê jî ev mijarana derdikevin berçavan: Di pêvajoya darizandinê de ji dêvla yekeya kesên faîl tê de diviyabû ewlehîya edlî têketa navberê lê bi xwe meşandina vê pêvajoyê ya yekeya ewlehîyê ya ji bûyerê berpirsîyar, loma reşkirina delîlan, gef lê xwarinên berê xwe didinê… Destûrmendbûna ji bo destûrdana lêpirsînê ya fermandarên ji ber bûyerê dibe ku berpirsîyarîya wan î cezaî çêbibe û bi piranî jî nedana vê destûrê…

Di dosyeyên destûr hatîye dayîn de dirêjkirina pêvajoyên darizandinê û ji holê rakirina rêgeza darizandina bi dadmendî... Di mirinên sûc bi awayê herî eşkere li holê ye jî sepandina daxistinên rewşa baş, tahrîka neheq û hwd. ... Di dayîna cezayên pir îstîsnayî de jî bi biryarên weke paşde hiştina ragihandina biryarê, taloqkirina înfazê, wergerandina cezayê pereyê edlî û bi van biryarana veguherandina cezayê ji bo xelatê... Û di dawî de, çi heyf ku bi destê darazê pêvajoya jêpakbûnê temam dibe!

Weke ciwanên ji zaroktîya xwe nû derketine em jî dibû ku weke hevalên xwe bihatana gulekirin, bihatana qetilkirin, bermayîyên şer yên me yê bigota qey pêlîstok in dibû ku di destên me de biteqîyana, em dikarîbûn bibûna armanca bombeyên ji balafirên şerî hatine avêtin, dema me heywanên xwe diçêrandin me jî karîbû pêl mayinê bikira, gava em li malên xwe di xew de bûn em dikarîbûn bibûna armanca wesayîtên zirxî, gava em li malên xwe rûniştî bûn em dikarîbûn bibûna armanca bombeyên ji tankan tên avêtin, em dikarîbûn bibûna armanca kûçikên ji alî ewlehîyê ve hatibûn sor kirin bi ser me de dabûn êrişkirin, em dikarîbûn bibûna armanca  bombeyên gazê, di serdegirtinên malan yên şeveqê dihatin kirin de em jî dikarîbûn bihatana gulekirin û dikarîbûn çekên ji bejna me dirêjtir danîyana kêleka me, heta û heta em dikarîbûn bihatana şewitandin û di jêrzemînên xwe de bihatana qetilkirin! Lê em bi rasthatinî be jî dijîn û îro hesabê hemû hevalên xwe yên hatine kuştin dipirsin! Li dijî bêbîrîya normalbûyî çêkirina “bîr”ekê, peydekirina “hestyarîya civakî”, daxwaz kirina bi dawî anîna polîtîkayên bêcezatîyê yên di derbarê binpêkirinên mafê jîyanê yê li hember zarokên bajarên Kurdan û gotina “Careke dinê qet!” berpirsîyarîya me hemûyan ya lezgîn e...

Bi dirêjahîya pêvajoya me ya qadê evqasî lê xwedîderketina malbatan ya xebata bîrê û eleqedarîya wan ya zêde, li hember hemû êşên hatine jiyîn xurbûna hêza wan û bilindbûna enerjîya wan, îsrara wan ya di derbarê têkoşîna maf û dadmendîya zarokên xwe de carek din bi me da hîskirin ku divê em hê bêtir bi hêvî bin û hê bêtir kedê bidin. Ji malbatên weha nirx dan me re, ji koma Hafıza Merkezi ya ji serê pêvajoyê bi me re bi hemû îmkanên xwe piştgirîya herî xweşik nîşan dan re, ji beşdarên atolyeyê re, ji şêwirmendên me Adnan Çelik, Esra Dabağacı û Noémi Lévy Aksu yên ku di hemû qonaxan de li cem me bûn re, ji ber piştgirîyên wê ji Ezgi Koman re, ji İHD û ÖHDê re, ji Gülistan Zeren, Kerem Çiftçioğlu û Emrah Kavlakê di mijara daneyan û grafîkan de bi me re pir alîkarî kirin re, ji Ferhad Çeperê ku di wergerandina nivîsan ya ji bo Kurdî de kedeke mezin da re û ji hemû

kesên ku li cem me bûn û me nekarîbû navê wan yeko yeko li vê dera rêz bikira re, ji hemû mirovên xweşik re, em pir spasdar in.

Yasemin Soydan

Medzan Nakçi

Xemgîn Yusuf Görücü

*Çîrokek "Formula Bextewarîyê"*

# Cizîr (Cemile) Çağırga

Paul Connerton di pirtûka Civak Çawa Tînin Bîra Xwe* de dema mijara bîra civakî distîne dest, destpêkek wek "Di hundirê her cure destpêkê de hêmanek bîranînê radizê" dike. Pratîkên bîranînê ji ser cureyên bîrê ( bîra şexsî, bîra zanînî û bîra hînbûnî) distîne dest û bi hemû hêlên wê ve lê hûr dibe. Ezê jî ji nava van têgehan "bîra şexsî" bi kar bînim û ji ser çîroka hevala me Cizîr a ku di 7ê Îlona 2015an de sibehekê hat gulekirin û ji jiyanê hat qetandin hewl bidim ku "bîr"ekê ava bikim.

* "*Toplumlar Nasıl Anımsar"* [Civak Çawa Tînin Bîra Xwe], Paul Connertonn. Çev. [Wer.] Alâeddin Şenel, Ayrıntı Yayınları)

Medzan Nakçi

## Pevçûnên Salên 2015 - 2016



Wêneyê Cizîrê Ku Li Malê Hatiye Kişandin

Di xebata “bîra zaroktîyê” de ya min herî pir dixwest bixebitim û di bîra min î şexsî de herî pir bandor li min kirî Cizîr bû. Bi heman awayî, ji nav hevalên me yên çîrokên wan di nêvî de hate qutkirin, ji jiyanê hatin qetandin bû Cizîr, ya ku Xemgîn û Yasemin jî dixwestin bixebitin. Heke em rabin li heyama dawî ku nifşê me yanî nifşê ciwanan şahidîya wê kir binerin em dikarin bêjin salên 2015-2016an ji bo nifşê ciwanan heyamek pir girîng a bîrê û şahidîyê ye. Di wan salan de me şahidîya pevçûn û kaosan kir li erdnîgarîya şer. Gelek hevalên me ji jiyanê hatin qetandin di vê heyamê de. Em ji heyamek ku mirov li taxên xwe, li kuçeyên xwe, li parkên xwe; heta ku dema li malê radizan ji ber guleyên topan ên ji tankan dihatin avêtin û li malên wan diketin ji jiyanê hatin qutkirin derbas bûn. Heyamek ku ji sedî zêdetir hevalên me, Nîhatên, Umîtên, Bîlalên, Rozerînên û hê gelek navên din ên, ji jiyanê hatin qetandin û çîrokên wan di nêvî de hatin qutkirin... Û dîsa qetlîam, teqîn û pevçûnên di wan salan de hatin jiyîn îro hê jî cihê xwe yî di “bîra civakî de” diparêze ji bo kesên şahidîya wê heyamê kirin.

Di “Rapora Di Heyamên Pevçûnê De Binpêkirinên Mafên Zarokan” a TİHVê[5] ( Türkiye İnsan Hakları Vakfı [Weqfa Mafê Mirovan a Tirkiyê] ) amade kiriye de tê gotin ku zarokên di salên 2015-2016an de dema qedexeyên derketina derve jiyana xwe ji dest dane li gor qeydên bi sînor herî kêm 123 ne ... Li gor me di xebata daneyî de tespît kiriye jî qedexeyên derketina derve yên salên 2015-2016an jî di nav de hevalên me yên jiyana xwe ji dest dane bi giştî 138 in... Li dorhêla şerî zarokbûn çi qas dijwar e ji daneyan jî dikare pir zelal bê xwendin. Ji nav hevalên me yên jiyana xwe ji dest dan ku hejmara wan sedî derbas dike, naveke sembol jî Cizîr e. Em dikarin bêjin ev mirinana, nîşan didin ku di wê heyamê de li dorhêla şerî zarok çi jiyan. Di demên ji

[5] Rapora Di Heyamên Pevçûnê De Binpêkirinên Mafên Zarokan – TİHV, https://tihv.org.tr › 2020/04PDF Encamên webê

malê derketin, li kuçê bi lîstikan lîstin, cî bi cî razana li malê jî dibû xetere de hevalên me yên ji ber guleyên topan, guleyan, wesayîtên zirxî ji jiyana xwe xatir xwestine/xatir bi wan dane xwestin…

## Cizîr

Dema min nûçeya Cizîr cara pêşî bihîstibû min hestên tarîfa wan bêderfet e hîs kiribûn û hê jî weha hîs dikim; qet bi tu awayî kêlîyekê jî ji bîra min naçe mixabin! Bi vê re di wê heyamê de li erdnîgarîya me rîska jîyanê ya hemî zarokan hebû; li derve şer hebû, li taxê şer hebû û em jî dikarîbûn weke Cizîr di wê heyamê de bihatana gulekirin. Heta malbatên me jî dikarîbûn me weke malbata hevala me Cizîrê di wê sarincoka sawdar de bisekinandana… Min her dixwest tiştekî bikim: bigihêjim Cizîrê, bi çîroka wê zanibim, bîranîna wê bidim jiyandin. Berî em dest bi xebatê bikin me bi Xemgîn re hevdu dîtibû, hevdîtina me ya pêşî li Sûrê bû! Û me şahidîya wan heyamên tarî kiribû. Dema em li ser wan pêvajoyan diaxivîn min derbarê wê heyama tarî de eva parvekiribû ku min sê zivistanan li “Lorîka Cemîla”yê[6] guhdarî kiribû û her Cemîle bi bîr anîbû. Di zêmara “Lorîka Cemîla” de weha tê gotin: “Ez ê çi bikim ne ewrek im, ku bibim Baran û vî agirî vemirînim.” Ev çarînana pir bandor li min dikirin û hê jî berdewam dikin bandorê li min bikin.

## Gihîştina Cizîrê

Di dawî de min ê karîba tiştin bikira, bi saya alîkarîya Hafıza Merkezi[Navenda Bîrê]yê. Dema em gihîştin agahîyên tekilîyê yên malbatê ez pir bi kelecan û hestyar bûm. Ji ber ku dibû ez li ber hestên xwe têk biçûma min ji Xemgîn re got “Tu têkeve têkiliyê ewê çêtir be”; bila sax be, got dibe. Dema Xemgîn bi bavê Cizîrê, Apê Remezan re hevdîtin kir û vegerîya tê bîra min, min wî hembêz kiribû… Hevdîtin xweş derbas bibû. Xemgîn got Apê Remezan hevdîtin pejirandiye û ew pir bi moral e. Piştî qada me ya Farqînê ewê qada me ya Cizîrê dest pê bikira. Ji ber ku xebata me ya qadê ya Farqînê pir erênî derbas bibû motîvasyona me li cî bû. Bi wê moralê em ber bi Cizîrê ve derketin rê. Dema di rê de min dîsa li “Lorîka Cemîla”yê guhdarî bikira hebekî bûya jî ezê karîbama bibama “baran” û bibarîyama… Di dema rêwîtîyê de em di Nisêbînê re derbas bûn, ez herî

[6] Muzîka ku Mem Ararat ji bo Cemîle (Cizîr) nivîsandîye û besta wê çêkiriye. https://youtu.be/0wqfbQCbDaA

dawî di sala 2009an de çûbûm Nisêbînê. Min têgeha sînor li wir nas kiribû, lê sînorên bi têlek direhîyan hatine veqetandin. Di dîtina min a vê carê de Nisêbînê cuda bû. Di neh salîya xwe de dema min dîtibû sînorek tenê hebû lê niha, piştî sêzde salan ez bi du sînoran re rû bi rû mam. Sînorê ewil bi têlên direhî, yê duduyan jî bi betonan hatibû lêkirin. Axir otobus bilind bû û min dikarîbû Qamişlo bidîta... Bi qasî ku min ji nûçeyan şopandibû min dikarîbû texmîn bikira piştî şer rewşa Nisibînê ya nû. Min qet xerîbî nekişand, xanîyên yek tîp ên li Sûrê hatibûn lêkirin mixabin li Nisêbînê jî hebûn... Me nuqteyên bê hejmar ên  tetbîqê(lêgerînê) li dû xwe hiştin û wextî em bigîhîştina Cizîrê...

 Piştî em di ketina Cizîrê de dîsa nuqteyek lêgerînê ya mezin derbas dikin em bi hevalan re dikarin bêjin“Ji Cizîrê re merheba!”. Li Cizîrê avahîyên nû, li serê her kuçê wesayîtên zirxî û xemgînî pêşwazîya me dike. Piştî şer Cizîrê bajarekî ku bi li serê her kuçê wesayîtên zirxî û kamerayên mobese hatiye rapêçandin e. Piştî şer bi temamî xemgînîyê Cizîr rapêçaye, hema hema hemû kesan merveke xwe, hevaleke xwe, zarokeke xwe, cîraneke xwe wenda kiriye... Zarok, li kuçeyan bi qasî ku tu bêje tune ye hindik in, li her taxê çendîn qereqol, li kuçeyan wesayîtên zirxî... Dem teng dibe, em ji kuçeyên zaroktîya Cemîle lê derbes bûye, lê mezin bûye, lê jiya ye, lê bi lîstikan lîstîye û lê hatîye gulekirin derbas dibin û digihêjin Taxa Cûdîyê mala Cemîleyê... Bavê Cemîleyê Apê Remezan me li ber derîyê hewşî pêşwazî dike. Gava em nêzîkî malê dibin Dayika Emîne li ber derîyê mala xwe xuya dibe, gavên em davêjin ji bo me bêtir bi kelecanî dibin. Em Dayika Emîne hembêz dikin û derbasî odeya mêvanan dibin.

Dema ez di derbarê salên 2015-2016an de bîra xwe ya şexsî li bin banê bîra hevpar difikirim “Cemîle (Cizîr) Çağırga” di bîra mezin de, di bîra min de cî digire. Ji ber vê ji pratîkên bîranînê yên Connertonî min hewl da bi bikaranîna têgeha “bîra şexsî”  destpêkekê bikim. Ez pir nêzîkî Cemîleya ku di bîra min a şexsî de li cîyên herî girîng disekine bibûm; emê wê ji Dayika Emîne, bavê wê Apê Remezan û Kekê Baran guhdarî bikin û nas bikin.

## “Navê Cemîle yê esasî Cizîr”

Berîya hevdîtinê em çûbûn serdana malbatek Cizîrî bi hevalan re. Malbatê, ji me re gotibû berîya heftakê şîna malbata Çağırgayan hebû. Çawa ku em derbasî odeyê bûn ji ber ku me zanîbû şîna wan heye me Fatîhe xwend, piştî me Fatîhe xwend em noqî sohbeta Apê Remazan a xweş bûn. Di wê

navberê de çayê anîn, bi vexwarina çayê re em hîn bûn bê ka amade ne ji bo em dest bi hevdîtinê bikin an na û tavilê me destpê kir pirsên xwe pirsîn… Em ji bavê wê hîn bûn ku navek Cemîle yê din jî heye: “Navê Cemîle yê esasî Cizîr bû! Dema ew çêbû karmendê nifûsê di nasnameyê de Cizîr qebûl nekirin. Me jê re digot Cizîr, tu bêje Cemîle kes nas nake, piştî şehîd ket bi navê di nasnamê de hate naskirin. Hê jî tu ji cîranan ji mervan bipirsî navê Cemîle weke Cizîr dizanin…”  Bi vî awayî em hînî çîroka navê Cemileyê bûn. Di pirsa xwe ya pişt re me yê bixwesta ku qal bikin bê ka Cizîr zarokek çawa bû lê bêyî ku hewce bike em bipirsin bav didomîne. “Cizîr, her tim diçû dibistana xwe û wanegeha xwe. Hê temenê wê biçûk bû dilê xwe dibijand birayên xwe û tim ji me re digot min bişînin dibistanê. Ez jê pêve endamê Meya-Derê[7] [Komeleya Mezopotamya ya Alîkarî û Piştgirîya Kesên Mervên Xwe Wenda Kirine] bûm carinan bi min re dihat sazîyê. Li sazîyê pir biaqil tevdigerîya, alîkarîya me dikir; çay digerand, çi ji destê wê bihata dikir. Zaroka herî biçûk a malê bû, me pir ji wê hez dikir. Pir jî biaqil bû.” Dema em ji dayika wê dipirsin em hîn dibin ku pir xêrxwaz bû û jê pir dihat hezkirin. Dayika Emîne: “Yeka min nedikir dudu, pir rêzdar bû. Zarokek di halê xwe de bû. Cîranan pir ji Cizîrê hez dikirin, hevalên wê jî. Di karên malê de alîkarîya min dikir. Herçî ku zarokek biçûk bû jî dema karên jinbira wê hebû ji bo jinbira wê pir neweste li birazyê xwe dinerî…”



Saeta Ku Navê Cizîr Li Ser Nivîsandiye, Li Eywana Malê Daleqandiye

## “Cemîle li ku ye?“

Malbata wê dibêje têkilîya Cizîr bi hevalên wê re bi malbata wê re û bi derdora wê re pir baş bû.

[7] Meya-Der ku di sala 2007an de hate ava kirin, di derbarê tespîtkirina wendayîyên gerîlayan û faîlî meçhûlan de bi TİHV û İHDê re dixebite û komeleyek armanca wê alîkarîya aştîya civakî bike ye. Çavkanî: https://hakikatadalethafiza.org/calisma/sivil-toplumun-kurt-sorununun-cozumune-etkin-katilimi-icin-kapasite-gelistirme/turkiyeden-stklar/1445-2

Bi gotinên “Cizîr hevala min a biçûk bû, piştî ew çû min got min hevala xwe wenda kir... Bi min re carinan dihate Meya-Derê. Hevalên me yên li sazîyê dixebitîn pir ji wê hez dikirin. Dema li Kobanê şer hebû, em her roj li sazîyê bûn. Cizîr piştî dibistanê dihat sazîyê; alî me dikir, çay digerand, di temenê biçûk de jî pir hestyar bû. Bi derdora wê re têkilîyên wê ha weha bû, hemû kesan pir jê hez dikir, me jê hez dikir...” wê bi bîr tîne bavê wê.

Dayika Emîne jî vana lê zêde dike: “Bi Cemîle re têkilîya me pir xweş bû, niha ji hemû hevalên wê, ji cîranan bipirsin, ewê bêjin jê pir razî bûn. Li malê tim digot ‘Dayê tu neweste ezê alî te bikim’... Bi hevalên xwe re li ber derîyê dibistanê bi lîstikan dilîstin. Di demên dawî de min wê dibir dibistanê, digot êdî tu neweste ez dikarim bi tena serê xwe herim dibistanê. Pir dilbirahm bû qîza min...”

Birayê wê jî qala hem têkiliyên xwe yên bi Cemîle re hem jî têkilîyên wê yên bi mirovên din re dike: “Me pir henek bi hev dikir, li hember me pir bi inyat bû.” (Dikene.) “Dema tiştek ji me dixwest heke me nekira bi me re dixeyidî. Dema me xercî hindik didayê ji me nedistend, bi me re dixeyidî... Piranî bi hevalên xwe re li derve dilîst, heta ku me bangî wê nekira berdewam dikir bi hevalên xwe re li derve dilîst... Li gel vê li biraziyê xwe yê biçûk jî dinerî. Piştî Cemîle çû dest pê kir tim li wê pirsî. Digot ‘Cemîle li ku ye?’...”

## “Hestyar, dilbirehm û biaqil”

Dema em pirsa “Cîyekî ku Cizîrê ji çûna wê pir hezdikir heye?” dipirsin birayê wê Baran dibêje “Ji parka Birca Belek pir hez dikir,”. Pê re birayê wê Baran, ji me re rengê Cizîrê jê hezdikir got. Ji sorê pir hez dike Cizîr... Dibêjin malbatê berê dewar xwedî dikirin. Birayê wê hezkirina Cizîrê ji bo çêlek û golikan û eleqedarbûna wê bi wan re bi me re par ve dike. Dema dayika wê digot Cizîrê xwarin nedineqandin lê bi taybetî ji petatên qelandî hez dikir birayê wê Baran jî dibêje “Ji me doner dixwest, ji donerê pir hez dikir”. Dema em pirsa hûn kesayetîya wê çawa pênase dikin dipirsin dayika wê qîza xwe bi van peyvana vedibêje: “Qîza min pir dilbirehm bû... Biaqil bû û pir wêrek bû. Carekê dema em tevlî çalakîya Dayikên Şemîyê bibûn ew jî hatibû. Polîsan destûr nedabûn çalakîyê, di wê navberê de Cemîle bi dayikên din re têkildar dibû, gava em çûn sazîyê çay pêşkêşî wan dikir. Weha yanî pir biaqil û wêrek bû...” Gava ku dayika wê bîranîna xwe ya bi Cizîrê re par ve dikir ez kêlîyekê çûm zaroktîya xwe. Li Parka Koşûyolûyê Dayikên Aştîyê ketibûn greva birçîbûnê wexta ez bi bavê xwe re çûm

serdanê, min jî ava bi şekir pêşkêşî dayikan kiribû... Bavê wê û birayê wê jî lê zêde dikin: “Pir wêrek bû, bêtirs bû, dilpak û dilbirahm bû...” Dema em xeyalên wê dipirsin derdikeve holê ku Cizîr pir hestyar û dilşo bû. Em ji birayê wê Baran hîn dibin ku Cizîr ji malbatên li Meya-Derê bandor girtiye û xwestiye hebekî be jî alîkarîya wan bike, em ji wî guhdar dikin çima xwestiye bibe parêzer jî: “Xeyalên zarokan hê bêtir bi tiştên li malbata xwe û derdora xwe dibînin dîyar dibe. De heyamên em diçûn Meya-Derê de ji me re gotibû ez dixwazim bibim parêzerek, gava me jê pirsîbû çima dixwaze bibe parêzer gotibû li vir pir malbat mexdûr dibin ji bo ez mexdûrîyeta wan çareser bikim ez dixwazim bibim parêzer.” Li erdnîgarîya şer, xeyalên zarokan jî di eksena şer de tê sêwirandin û di eksena aştî û têkoşînê de tê diyarkirin...”

## “Em li rastîya wê binerin li Cizîrê di hemû heyaman de wehşet heye”

Her çî ku em bi atmosfera polîtîk ya heyamê zanibin jî  di dema hevdîtina bi malbatê re  tu bixwazî nexwazî vegotinên derbarê wê heyamê de derdikevin pêş. Li hember gotinên Apê Remezan bi hevalan re dilê me diqefile: “A rast weke Kurd em bi sedan salan e ku zirarê dibînin. Mixabin ku em jî bûn şahidê van wahşetana! Di salên 90î de ji malbata me ‘heft’ kes şehîd ketin li Cizîrê. Wê wextê em ji polîsan direvîyan, malên me xera dikirin, her roj digirtin bi ser malên me de. Li Cizîrê di hemû heyaman de wehşet hatine jiyîn, her tişt hatîye serê vî bajarî... Di heyama dawî de bawer bikin li Cizîrê şer tune bû bi temamî ‘wehşet’ hebû. Qîza me tenê şehîd neket, di wan rojan de gelek mirov dihatin gulekirin... Li jêrzemînên Cizîrê qetlîam dihatin jiyîn... Piştî qedexe hate rakirin gava em çûn jêrzemînan hestîyên kesên şehîd ketî jî xuya nedikirin, me bedenên kesên hatibûn qetilkirin dixistin qabên biçûk... em hê çawa vebêjin, bi temamî ‘qetlîam’ hebû...” Tiştên Apê Remezan ê ku şahidê rasterast ê heyama dawî ya bi pevçûn e ji me re vegotin di dema hevdîtinê de pir bandor li me kiribû. Wehşeta ku me dixwend û ji dûra ve dişopand bihîstina ji devê Apê Remezan ê ku rasterast şahidîya wê kiribû xwîna di canê me de sar kiribû...

Wehşeta ku Cizîr jiyabû hindik be jî derdikeve çapemenîyê, li ser meselê nivîsa Semra Topal jî tiştên hatine jiyandin radixe ber çavan û axînekê dide kişandin:

Cemîle dilîst, direvîya, digirîya, dikenîya. Li kuçeyên bi toz ,di nav dîwarên xerabe re xeyalên derbarê pêşerojê dikirin. Ewê ji nav vê koma bermayîyan derketa, bigihîşta rojên xweş ên tên. Di nav van xeyalan de dengên ku guhê mirov ker dikin jî hebûn; dengê topan, dengê hewanan, dengê guleyan. Bi dengê vana şiyar dibû her sibeh Cemîle. Tu dibê qey guhê wê hîn bibûn. Li hember wan dengên tirsnak derdiket ber derî û bi lîstikan dilîst; a dawî zarok bû. Ewê ji ku zanîbûya guleya ji nav komên bermayîyan pekîyayî ewê dilê wê perçe perçe bike. Cemîle weke temenê pinpinîkekê hêdîka hilweşîya hembêza dayika dilbirahm. Peyva wê ya dawî bû "Ax! Dayê". Ewê wê axa kî bidîtana kî dizane...[8]

## Çi bi Cizîrê hat?

Piştî bêdengîyek kûr li ser gotina Apê Remezan a hûn çi dixwazin bipirsin, dilrehet bin, em pirsa Cizîrê jîyana xwe çawa ji dest da dikin... Pêşî Apê Remezan dest bi vegotinê dike, "Wextê şer dest pê kir ceyran û ava me hatibû qutkirin jixwe. Ez ji malê derketim û çûm taxa jêrê da ku hela bê em nekarin çareyekê bibînin. Em çûn li taxê bi çend kesan re rûniştin, dema em rûniştî bûn ji nişka ve bû ku heçkû dilê min bi tiştekî bihese. Paşê min ji hevalan re got ezê herim malê, hevalan gotin şer heye niha neçe, bila hebekî bisekine tê wê çaxê herî. Ez rabûm hatim heta binya malê, min niherî li ber malê qelebalix heye. Min pirsî bê çi bûye, gotin 'Cizîr gule kirine'... Me Cizîr hilgirt, bir odeyê..." Dayika Emîne berdewam dike: "Sibe bû, em li malê bûn. Cemîle derketibû ber derî. Gava li ber dîwarê malê bû hatibû gulekirin. Piştî cîranan gotin Cizîr hatîye gulekirin ez revîyam... dema ez çûm cem wê gote 'ax dayê' û çû qîza min... piştî me wê anî hundir heta serê sibê min li ser çonga xwe wê xiste xew..." Cezayê di demek sibehekê de derketina kuçeyê, lîstina li ber deriyê malê , bûna hedefa guleyên ne dîyar e ji ku tên û bedenên me yên bê can ên li ser çongên dayik û bavên me ye...

## "Me hine li destê wê kir"

Bav berdewam dike pêvajoyê neqil dike: "Me Cizîr anî hundir, hilbet ne ambûlans dikare were ne em karin wê bibin nexweşxanê. Me nekarîbû serê xwe jî ji malê derxista! Wê heyamê raste rast gule berdidan. Me nedizanîbû emê çi bikin, li taxa jêrê şer hebû. Hilbet li taxa me şer filan tu

---

8 Semra Polat, 28 Ağustos 2021, https://eujusticeint.org/vefa/cemile/

tiştek tune bû. Heta sibehê Cizîr ma, me sibehê ew şuşt, me hine li destê qîza min kir… Hewa pir germ bû, em rabûn çûn ji bo cendek me ew sarincoka anî, ji bo ku bêhn nekevê. Li malê me Cizîr xiste hundirê sarincokê. Wekîlê me hebû li vir, Faysal Sarıyıldız ew hat. Telefonî karmendên dewletê dike lê qet nagihêje wan, telefonên xwe venedikirin. Piştî du-sê roj derbas bûn telefonî wekîl kirin, gotin cendekê bînin. Em jî rabûn, cîranên me giş bi me re bûn em pir qelebalix bûn, me rahişt cendekê xwe, em daketin taxa jêrê; du panzêr hebûn. Wele ewê gule bera me jî bidana. Qet bi tu awayî destûr nedan kes derbas bibe. Hew hiştin wekîl û lawê min tenê cendek bibin. Di cî de cendekê me xistin ambûlansê û ew revandin Şirnexê, em şok bibûn, erê cenazeyê me revandin. Piştî heftakê cendekê me ji Şirnexê anîn; pêşî ewê karên veşartinê wan bikira me destûr neda, me got çawa dibe ku hûn cendekê me veşêrin. Me ew veşart, Cizîr ne tenê bû, 14-15 şehîd hebûn…" Birayê wê Baran lê zêde dike "Dema me cendek vedişartin hemû gelê Cizîrê li wir bû… Jixwe qedexe piştî Cemîle li raya giştî kete rojevê rabûn. Hemû dinyê êdî zanîbû li Cizîrê wehşetên weha tên jiyîn…" Cizîr tê gulekirin, bi muameleya dermirovî tê sekinandin û bi awayekî desthinekirî xatir ji jiyanê dixwaze...

## Di şeş salan de hew danişînek tenê


Piştî ewqas bêhiqûqîyên hatin jîyandin em pêvajoya darizandinê ya bûyerê dipirsin. Birayê wê Baran dibêje "Piştî bûyerê bi salekê doz hate vekirin. Lêkolîna cihê bûyerê û hwd. tune ye. Jixwe li nexweşxanê rontgenên wê guhertibûn. Gule jî weke guleya terorê derbasî qeydan kiribûn, helbûkî gule li cem me bû jixwe… Dadgehê carekê bangî me kir me çû îfade da, ji hêla hember li dadgehê qet bi tu awayî kesî îfade neda. Dadgehkirin qaşo berdewam dike li hember ku 5-6 sal derbas bûye… Wan çaxana 280 parêzeran ji me wekalet stendibûn ji bo dosyê. Hilbet pişt re ji bilî parêzerek du parêzeran kesek pir li ser dosyeyan nesekinî. Wê çaxê piştgirîya STK[Saziyên Civaka Sivîl]yan hebû lê niha kes pir li ser dosyeyan nasekine. Hê em li bendê ne, ev 5-6 sal in ku em dixwazin dosye bi hemû hêlên xwe ve bê şopandin." Em li ewlehîya filmên rontgenê diguherîne û dosyeyek ku qet bi tu awayî nayê lêkolîn û lêpirsîn rast tên. Ligel hebûna STKyan, bi sedan parêzerên bi dosyê re têkildar û hestyarîya civakî ya di wê pêvajoyê de pêş diket jî weke birayê Cizîrê dibêje: nesekinîna li ser dosyê rave dike ku ji bo hestyarîya civakî bê kêmkirin çawa tê hewldan û polîtîkaya



Cil Û Bergên Cizîrê



Kefiya Cizîrê





Helbesta Bi Navê “Gol” Ku Ji Aliyê Cizîrê Ce Hatiye Nivîsandin


bêcezakirinê çawa dewam dike.

## Pirsa me nekarîbû bipirsîya

Di çarçoveya rêzikên etîk ên xebatê de, ji bo ku alîyê mexdûr mexdûrîyetek




Deftera Cizîrê



Xêzên Ji Deftera Cizîrê

duyem nejî me pirsa “Tiştên zaroka we tînin bîra we çi ne?” nekarîbû ji malbatê bipirsiya. Di encamê de li holê cendekek bi awayekî dermirovî hatiye sekinandin heye, di vê rewşê de em ji malbatê napirsin bê çi Cizîrê bi bîr tîne. Lê Dayika Emîne di salvegera mirina Cizîrê de di hevpeyvîna bi Ajansa Mezopotamyayê re dike de bersiva pirsa me nedikarî bipirsiya bi awayekî zelal dibêje jixwe: “Ji wê rojê bi vir de kengî em derîyê sarincokê vekin em heman êşê dubare dubare dijîn.”[9]

## Deftera biçûk

Kekê Baran, ji odê derket û piştî demekê di destê wî de kincên Cizîr ên herêmî bi paş de vegerîya. Bi çavlêketinê re ez pir kelecanî bûm. Dîtina kincek ji Cizîrê mabû bibû sedema ez hestên nayên tarîfkirin bijîm. Di 10 salîya min de yê min jî kincê min ê herêmî ku dişibiya yê Cizîrê hebû, heta rengê qumaşê wê jî wek hev bû... Dibêjin Cizîr di rojên taybet de, di dawetan de, di Newrozan de kincê xwe yê herêmî li xwe dikir, kefî li nava xwe girêdida û diçû. Min jî weha dikir lê rengê kefîya min û kefîya Cizîr ji hev

---

9 http://www.mezopotamyaajansi35.com/tum-haberler/content/view/145707

cuda bûn. Birayê wê, deftera dibistanê ya biçûk a Cizîr jî tîne. Tê bîra min dema min defter dît destê min ricifîn, destê min bi ricif ez tiştên li deftera Cizîrê dixwînim û pelan yeko yeko diqulipînim… Notên dersan bi awayekî pir




Kêla Cizîrê

baş hatine nivîsandin. Ez di nav notên dersan de spartekên çêkiriye, kompozîsyonên nivîsandîye, hevpeyvînên bi dê û bavê xwe re kiriye, çend nivîsan û şiîra “Gol” a Cizîr li nava defterê nivîsandîye û wêneyê laleya li binê wê xêz kiriye vedikolim… Ez serenavek weke “Formula Bextewarîyê” dibînim; li bin serenavê Cizîr çend tişt nivîsandine, “Heke rojekê ez bibim zanyarek mezin, ezê van xeyalên xwe gişan pêk bînim.” Û berdewam dike, “Ez dixwazim li hemû dinyayê û hemû cîyên bêhnên xweş lê hene ku dibin sedema dilê min bi kelecan lê bide bigerim… Li ser meselê ez stranan bêjim ezê bextewar bibim…” Min nekarîbû çavên xwe ji deftera biçûk qut bikira, min kêlîyekê jî nedixwest defter xelas bibe… Ezê di bîra xwe ya şexsî de Cizîrê bi xeyalên wê yên di nivîsa “Formula Bextewarîyê” de û helbasta “Gol” ê bi bîr bînim…

Em nêzî dawîya hevdîtinê dibûn. Piştî em xwestina xwe ya ji bo çûna ser gora Cizîrê dîyar dikin bila sax be birayê wê jî bi me re tê, em ber bi ereba wan ve diçin. Di dema rêwîtîyê de jî ev dîyalogana tên bihîstin: “Ji wî girê hember guleya topê diavêtin taxê, li avahîyên hember segvan hebûn, ev avahîyên hûn dibînin li ser cihê malên Cizîrê yên di jêrzemînên wan de qetlîam hatin jiyîn hatin lêkirin” Bi derketina me ya ji taxê re em bêhnek kûr dikşînin. Em bi gavên hestyar û kelecanî ber bi ketina goristanê ve diherin. Nerîna li kevirê gorê yê Cizîr ku li goristana Mem û Zîn hema ji hêla rastê yê

derîyê ketinê yê sêyem piştî pênc metreyan dûr e, piştî yê wê bênavbir jî nerîna li kevirê gorê yên şehîdên(vir goristanek şehîdan a ku kesên ji heftî



Wêneyê Cizîrê

heta hefteyî yên di salên 2015-2016an de jiyana xwe ji dest dane lê ne ye) dawîya wan nayê yên wê heyamê, xwendina kevirên goran pir dijwar bû; 1995-96-97-98-2000-2001-2002... weha berdewam dikirin dîrokên jidayikbûna wan... Piştî ez li kêleka Cizîr rûdinêm û li hember Çîyayê Cûdî hebekî wext derbas dikim ez ji wê, bi bêhna pûjana bêhempa ya li ser axa wê hatîye çandin xatir dixwazim. Ji bo vê gavê bi xatirê te...

*Li Cizîrê Zarokek: Nîhat*

# Nihat Kazanhan

Ji hevalê me Nîhat re...

Ez bawerim ku mirin rastîyek vê jîyanê be jî jîyan xwedî hêza ku têkeve pêşîya mirinê ye. Em berdewamîya jîyanê temsîl dikin û vê hêzê bi hevalên xwe re bi hebûn dikin, emê bi hebûn bikin...

Yasemin Soydan

## Di hundirê şer de jiyîna weke zarokekî/ê...

Zaroktîya me bi hevrûbûnek mezin derbas bû û min xwe di hundirê zaroktîyek ku min qet tu carî nekarîbû xwe azad hîs bikim dîtibû. Di hundirê şer de jiyîna weke zarokekî/ê tê çi wateyê? Azadîyek heye û hêzek qet nahêle em vê bijîn heye. Rastîya vê pergalê bi pêşketina temen re tu zelaltir têdigihêjî. Ez dibêm qey hêvîya pergalê ji me ew e ku bêyî em lê bifikirin weke mirovekî/ê divê em çawa bijîn tenê em divêtîyên tiştên jîyan me rastî wan tîne yanî divêtîyên pergalê bi cî bînin û bijîn. Ji ber ku fikirandin teşe dide jîyanê û te ber bi lêgerîna bîra hatiye qedexekirin û veşartî maye dahf dide. Tiştekî weha ye ku em ji fikirînê jî ditirsin; pergal me mecbûr dihêle ku em rabirdûyê ji bîr bikin. Divê weha be? Jîyanên me di hundirê vê bêbîrîyê û van sînoran de çiqasî dikare heqîqetê bibîne? Heke em dixwazin bi vîna xwe û jîndarîya xwe dahatûyê ava bikin ev hilbet nekare ji rabirdûyê bê



Dîmenên ji Newroza 1992yan

cudakirin. Ma em dikarin tiştên me di rabirdûyê de jîyaye dînin aliyekî  û di çîna tiştê pergalbûyî[*düzenlenmiş olan*] pêşkêşî me dike de û bi jiyîna karîyera ew pêşkêşî me dike em dikarin bextewar bibin? Ji bo me hemûyan jîyanên hatine pergalîkirin ên dîyarkirî hene, di temenên dîyar de hêvîya tiştên dîyar tê kirin, jîyanên dikarin bên pêşdedîtin; pêşî di rûneştokên heman dibistanê de dest pê dike paşê bi awayê li gor vê çînîkirinê[*sınıflandırma*] dibe xwedîyê karîyerekê, jîyanên li gor a hatiye pergalkirin tên jiyîn. Lê ya herî dijwar ev e ku mirin hene di hundirê heman jîyanê de, mirovek çawa dikare ewqas mirinan ji bîr bike?  Bi ser de jî vana

mirinên hesabê wan nehatibin pirsîn be. Vê ez ber bi lêgerînek ewê qet dev ji min bernede dahf dida û min xwe hertim nêzî mirovên xwedî vê hîsê bûn didît, ez li wan digerîyam. Da ku belkî bersivê li gel wan bibînim... Weke yeka zaroktîya wê weha derbasbûyî dibêjim ku: Em zarokên nekarîbûn me bikujin in, em ketin pey çîrokên hevalên xwe yên hatine kuştin ji ber ku em weha fikirîn: "Nehatibana kuştin ewê bibana hevalên me."

## Bîra zarok/tîyê ya li Cizîrê bi dehan salan e nayê guhertin...

Ez ber bi Cizîrê ve diherim... Ber bi naskirina hevalên me yên hatin kuştin Nîhat û Cemîle ve... Em sê heval niha kelecanek ji dema me biryara kirina vê xebatê dabû mezintir dijîn. Li ser rêyan, di nava bajêr de, gava em bi malbatan re dipeyivin, em hînî pir tiştan dibin, em pêvajoyê ji nêztir ve dinasin; berxwedana her derekê ya li gorî xwe bi çîrokên cuda re digihêje hev. Her malbata ku dibihîze em ji bo vê xebatê hatine û malbatên em li mala wan dimînin ji me re pêvajoya berxwedana xwe û hê pir çîrokên din vedibêjin. Em di jîyana wan de pêrgî gelek tiştên ku me bêrîya wan dikir tên. Me ji malbatên hê me cara pêşî hev nas kiribû çi û çi guhdarî kiribû. Malbat, atmosfer bajêr bi xwe, erdnîgarîya wê, mirovên wê, çîrokên hevalên me... Hîsek pir cuda bû. Bi dirêjahîya rêya digihîşt bajaran em sê heval tiştên hîs dikin pev re parve dikin. Em ji camê li derve dinerin û bi rê ve diherin, bi dirêjahîya rêya hîsa bi taybetî hatîye xemilandin dide ji nav zerahî û keskahîyên taybetmend yên cî bi cî diguherîn, em ji Amedê digihêjin Cizîrê. Di heman demê de ez difikirim; "mirov çawa dikare debar bike ku zengînîyek weha bê talankirin û çarenûsa wê ji biryara kesên din re bê hiştin?"... Em li bajarekî ji ber şer weha hatîye talankirin, diherin hevdîtina gelek tiştên me wenda kirîye...

Cizîr, Newroza 1992yan, pêvajoya 2015an, jêrzemînên wehşetê... Cizîr bajarekî bi giyanê berxwedêrî dijî ye. Bi taybetî vîdyoya Newroza 1992yan Cizîrê bi hemû rastîya wê vedibêje. Sirûd, îsrara pîrozkirina Newroza qedexe, ajotina panzêran ya raste rast bi ser gel ve, li hember vê fîkandinên gel, li hember zordarîyê hêza îsrara civakî, mirovên bi zorê bi panzêran dihatin xirxirandin û stendin, kuştinên faîl nedîyar, a rast ên faîlên wan dîyar... Di wan dîmenan de em dibin şahidê sekna zarokekî/ê dema sirûd tê xwendin; dengê sirûdê bilind dibe û zarok kulma xwe bilind dike, ev wêne bîra zarok/tîyê ya bi dehan salan e li Cizîrê nayê guhertin nîşanî me dide lê di hundirê xwe de hêvîyêkê jî hildigre... Lewra Cizîr bi dehan salan e di bin

zordarîyê de ye, lewra Cizîr bi dehan salan e di berxwedanê de ye, lewra Cizîr ji bo aştîyek bi rûmet bi îsrar e...

## Û zarokek di 2015an de hate qetilkirin... Hevalê me Nîhat...

Nûçeyek... "Di mêjûya 14yê Rêbendana 2015an de Nîhat Kazanhanê 12 salî yê ku li ber derîyê mala xwe dilîst, ji ber guleberdana hêzên ewlehîyê bi gulekirinê hate kuştin."



Nîhat an jî zarokên din ên hatin qetilkirin, hemû ji nivîsêk nûçeyê, ji jimarekê pir zêdetir in... her zarokek gerdûnek biçûk e... Bi vê armancê em ber bi çîroka hevalê xwe ve diherin. Em li Cizîrê ne... Bi Xemgîn û Medzan re...

Em li ber Tirba Mem û Zînê disekinin; ewê bavê Nîhat me ji vir bistîne, me bi wî awayî li hev kiribû. Bi hevalên xwe re em hebekî sohbetê dikin, em qala bîrek nayê jêbirin dikin. Li bajarê Mem û Zînê li Cizîra Botan em li çîroka hevalekî xwe digerin. Jîyanên nemir ên Cizîrê derdikevin pêşberî me û em jî hatine tiştên mirinê nekarîbû ji me bistîne, bîrekê qeyd bikin. Li bajarê ku du dildaran temsîl dike, li bajarekî ku bûye temsîla zordarî û berxwedanê jî...

Bavê Nîhat hat me bi erebê stend û em pev re ber bi mala wan ve ketin rê. Bav hebekî qala xwe kir, me jî xwe da naskirin. Em derbasî mala wan bûn û piştî em li hêwanê rûniştin dayika Nîhat jî hat cem me. Em pir xweş hatibûn pêşwazîkirin. Xebata me pir cidî stendibûn û amade bûn ku alîkarîya bi her

awayî bikin. Helwesta wan zelal bû û bi me re hîsa dudilîyê çênedikirin, em bi hêz hatibûn pêşwazîkirin û ev bi me pir baş hatibû. Gava me têkilîya pêşî danîbû bersiva hatibû bi me weha baş dabû hîskirin ku bi dirêjahîya rojê me qala vê xweş pêşwazîkirina wan kiribû. Lewra gelek cîyan xwestina me ya hevdîtinê red kiribûn, Cizîrê em pir xweş pêşwazî kiribûn. Hem malbata Cemîle Çağırga hem malbata Nîhat Kazanhan bêyî tu dudilîyan gotibûn amade ne ku alîkarîya bi her awayî bidin vê xebata me û em kengî biwazin dikarin bibin mêvanî wan. Ji malbatan ji bo xebata me hatina alîkarîyek weha me ewqas motîve kiribû ku me li her derê qala wan dikir û ji bo me bibûn çavkanîyek dilgeşîya domdar. Niha dema em bi hev re rû bi rû hatin jî bi heman helwesta zelal me pêşwazî kiribûn, pir rihet didan hîskirin. Dê jî bav jî li kêleka me rûniştin û keçka wan a biçûk Çîçek, ez, Medzan, Xemgîn me bi hîsên xweş dest bi sohbetê kir. Jixwe cara pêşî me xebatek weha dikir û herçî ku derbarê divê em çawa tevbigerin de ji hevdîtinên me yên berê me hebekî be jî tecrûbe girtibe ji ber ku ji alî her malbatê em bi awayekî cuda dihatin pêşwazî kirin li vir jî bi kelecanek cuda, bi atmosferek nikî nû me dest bi sohbeta xwe kir. Piştî me xebata xwe vegot me êdî gotin ji wan re hişt.

Bav peyv ji dayikê re hişt: “Çi pirsa we hebe ji wê bikin, ew dizane.” Bav wê heyamê ji ber bi gelemperî diçû Iraqê berpirsiyarîya malê bi piranî li ser dayikê bû û bi qasî me fahm kir kesa malbat temsîl dikir ew bû. Dayik kesa ku li malê bi zarokên xwe re dibilîya ji ber vê jî di heman katê de ya bi wan re herî pir dem derbas dikir bû. Ji ber vê ji bo em Nîhat nas bikin bav gotin ji dayikê re hişt. Me jî ji tiştên Dayika Eyşê vegot dest bi naskirina hevalê xwe Nîhat kir:

## “Zarokek di halê xwe de bû, hurmetkar bû, bi hezkirin bû”

“Em li vî bajarî bigerin ez yekî weke Nîhatê xwe bi hirs, bi namûs, hurmetkar nabînim. Pir bi hirs bû, ez dikarim bêjim ku pir efendî bû. Ji min pir hez dikir. Min jî pir hez dikir, ez pir bi ser lawê xwe de bûm. Heta ku ez sax bim ezê Nîhatê xwe ji bîr nekim. Şikir ji Xwedê re hem diçû dibistanê hem Quran dixwend. Heta emayê xwend Quran. Carinan ez diçûm min lê dinerî bê ka di çi rewşê de ye. Mamosteyê Nîhat ji min re vedigot. Digot ku 100 xwendekarên min hene, ji nav hemûyan ez bi Nîhat bawer im. Ez perê xwe didimê ew çixara min dikire, ez 100î didimê 50yî didimê bi heman awayî bi paş de tîne, ez bi Nîhat pir bawer im. Wî dixist hembêza xwe û serê wî maçî

dikir û digot: ‘*Xwedê ji te re bihêle, Nîhat gelekî nestele ye*.’ Ji ber ku weha gotibû pir kêfa min hatibû, ez bextewar bibûm. Nîhatê min gava dema xwendina Quranê dihat destnimêja xwe digirt û diçû cem seydayê xwe. Ji dibistanê jî şeş mamoste hatin şînê, şeşê wan jî rûniştibûn û girîyabûn. Zarokek di halê xwe de bû, ‘*nestele bû*’, hurmetkar bû, bi hezkirin bû.”

## “Zarokek bi inyad bû”

Ji hestên dayikê me dikarîbû fêhm bikira Nîhat pir bi dayika xwe ve girêdayî bû. Me pirsa we lawê xwe bi gotinekê derbibirîya ewê ev gotin çi bûya kir:

“Zarokek bi inyat bû, dema tiştek digot diviya weha biba, tiştek bixwesta diviya bihata kirin. Nedigirîya lê ji bo bihata anîn inyat dikir. Çi bixwesta teqez dida anîn. Li ser meselê çeşîdek xwarin tenê qebûl nedikir. Diviya li ser sifrê pir tişt hebûna, nexwara jî diviya li ser wê sifrê 3-4 çeşîd xwarin hebûna. Digot divê li ser sifrê pir tişt hebin. Yanî weke xwarin ji sifreyên qelebalix pir bêtir hez dikir.”

Em pirsên xwe yên di derbarê Nîhat de bi dorê ji dê û bavê wî dikin û berdewamî naskirina wî dikin.

## “Piştî mirina wî salekê ji ber wî min nekarîbû kebap çêbikira”

Ji pirsa me ya “Xwarinek wî jê hezdikir a taybet hebû?

dayika wî  bersiva “Ji doner û kebabê pir hez dikir,” dide.

Bavê wî lê zêde dike:

“Li malê nedixwar, ji bo em ji sûkê xwarinê bînin îsrar dikir. Me li malê jî xwarin çêdikir lê wî bi îsrar ji xwarina sûkê dixwest.”

Dayika wî dikeve navberê:

“Piştî mirina wî salekê min ji ber wî nekarîbû kebab çêbikira, min neda zarokên xwe. Ketibû xewna xwişka xwe, li gor qîza min qal kir di xewna wê de me hemûyan xwarin dixwar wî jî gotîye ku dayika min goşt û kebab naxwe ez jî naxwim. Piştî hingê min çêkir.”

Ji wechê Dayika Eyşê dîyar dibû ku pir di bin bandora mirina Nîhat de maye. Ewqas ku ji me re vedibêje ku xwarina Nîhat herî pir jê hez dikir jî

piştî mirina wî qet çênekirîye. Piştî Nîhat hatîye xewna xwişka xwe dest bi çêkirina wê xwarinê kirîye. Dikare bê gotin ku ev hebekî jî teyisîna  êşê ye, li vê erdnîgarîyê êş pir ji kûr ve tê jiyîn û em dixwazin ji hemî tiştên piştî mirinê dimînin dûr bikevin. Dikare bê gotin ku zordestî û çek ne tenê zarokên me, canên me, ji van jî wêdetir pir tiştan ji me distînin. Weha ku li dû yê/ya mirî em nekarin dest bidin strana, mekana, helbesta, xwarina wî/wê jê hez dikir. Tundî û zilm carinan dikare me ji xwarina xwarinek pir ji rêzê jî dûr bixîne...

## "Ji sor pir hez dikir, fenerlîyek fanatîk bû..."

Gava em pirsa rengê jê hez dikir dikin bavê wî, bi awayê "Ji kincên sor pir hez dikir" dibersivîne û dayika wî lê zêde dike,

"Ji reş jî pir hez dikir. Û spî jî. Tim digot ku ji van sê rengan ji min re bikire."

Pirsa "Tîmeke pir jê hez dikir hebû?" bavê wî dibersivîne:

"Fenerlî bû. Fanatîk bû."

## "Hew wê şevê li cem min ranezabû"

Em pirsa Nîhat di nava rojê de çi dikir dikin. Dayika wî ji me re vedibêje.

"Pir dernediket. Pir radiza, ji xewê hez dikir. Min jî qet qêmîşî wî nedikir ku wî ji xewê şîyar bikim. Hevalên wî dihatin dipîrsîn digotin ka Nîhat li mal e, min digot ne li mal e ji bo şîyar nebe. Rojê 10 kes dihatin dipirsîn bê Nîhat li mal e, pir jê hez dikirin. Hevaltîya wî pir xweş bû."

Li vir dora gotinê ya bavê wî ye:

"Piranî li malê radiza, heta hevalên wî dihatin bangî wî dikirin dernediket,  ne yekî ji derketina derve pir jî hez dikir bû.

Ji min pir hez dikir lê fedî dikir. Pir bi ser dayika xwe de bû. 12 salî bû lê sibê êvarî di hembêza dayika xwe de raneza debar nedikir. Zarokek di halê xwe de bû, bi hirs bû, sakîn bû, diçû dibistana xwe jî, dibistana xwe jî dixwend. Di navbera me de pirsgirêk dernediket; em li malê jî bûna li derve jî bûna... Me jî pir zêde ji wî hez dikir, ne zarokê me yê tenê bû lê pir xwînşêrîn bû."

Em pirsa mekanek Nîhat pir jê hezdikir hebû yan na dikin.

Bav bi awayê “Dema ez derdiketim sûkê îsrar dikir digot ezê jî werim. Ji wext derbaskirina li wir pir hez dikir. Ez jî bi dizîka, min xwe vedidizî û diçûm sûkê,” vedibêje.

Dayika wî dikeve navberê û dihere bîranînan:

“Hatibû 12 salî jî lê her şev, li her derê li cem min radiza. Hew wê şevê li cem min ranezabû.”

## “Ji stranên Kurdî pir hez dikir”

Pirsa me ya “Ji muzîkê hez dikir, herî pir li çi guhdarî dikir?” dayika wî bi gotina “Hez dikir” dibersivîne.

Bavê wî qala strana wî jê hez dikir dike:

“Stranek wî hebû pir li wê guhdarî dikir, stranek Kurdî hebû. Di telefona wî de teqez ev strana hebû. Telefona qîza min hebû, bi hevalên xwe dabû qeydkirin.”

Dayik jî têvlê dibe:

“Belê, pir pir hez dikir. Ji sirûdên Kurdan jî pir hez dikir.”

Em pirsa “Heywanek wî pir jê hez dikir hebû?” dikin.

Gotina pêşî dayika wî dibêje:

“Ji kevokan pir hez dikir. 3-4 kevokên wî hebûn.”

Bavê wî dibêje “Hevalên wî dabûnê, ez li malê ji heywanan hez nakim lê ji bo xatirê wî me dengê xwe nekir.”.

Dayik lê zêde dike:

“Min jî dest nedayê. Li malê dima wan xwedî dikir. Me cihê wan amade kir, ez û qîzên xwe jî tevlî wî bûn û me cihê wan bi hejikan bi naylonê çêkir. Tim bi wan re dilîst, pir ji wan hez dikir. 3-4 mehan wan xwedî kir, paşê firîyan, mirin, hatin firotin ez nizanim. Dema şehîd ket zivistan bû, kevokên wî tune bûn.”

Nîhat zarokek biçûk bû lê eynî weke me meraq û hezkirina wî ya jîyana wî digîhand wateyê hebû. Mirov bi xwe seknek e. Weke tevahîyekê gerdûn û xweza seknek e. Nirxandinek hemû kesan a li jîyanê zêde dikin heye. Ev hemû [*nirxandin*], bi milyonan mirovan ji hejmarbûnê derdixin û gerdûnek

bêdawî  ya nirxan ava dikin. Di pirtûka Gökçer Tahincioğlu berhev kirîye ya bi navê *Kayıp Adalet* [*Dadmendîya Wenda*] de Emel Ataktürk Sevimli di nivîsa pêşkêşîyê de weha dibêje: “Di înfazên sîyasî de yên tên kuştin û bi zorê tên wenda kirin ne ‘mijarek dosyê’ an ‘hejmar’ek in. Hemû, mirovên wextekê bûne hezkirî, dê, bav, keç an jî kurê hinekan.” Nîhat jî eynî weke me bi van hemû taybetmendîyên xwe seknekê hildigre. Zarokek ji rengê sor pir hezdikir bû. Zarokek ji guhdarîkirina stranên Kurdî, ji çûna sûkê pir hez dikir bû, zarokek li mala xwe kevok xwedî dikir bû. Ev hemûyana li vê erdnîgarîya me tanî cem hev sekneke cudatir bû. Lewra em li cîyekî hema hema hemû zarok bi taybetî li çîyayên bê ser û ber dimeşîyan, ji ava wê ya paqij vedixwarin, xwedî dibûn, bi şênkayîyê re dihatin cem hev, pêl erdê dikirin, ajal weke heval didîtin dijîyan. Eynî weke gundê Rozerîn Çukur, kûçikê Bîlal Meygil ê bi navê Conî, cîyê Beşir lê mir û weke çîya û kaşên biçûkîya min lê derbas bû sekneke xwezayê li me zêde dikir hebû. Tiştê me dikir em, hebûna me ya li qadên me yên jîyanê yên me nêzî xwe hîs dikirin bû. Xwezayê hezkirin û tiştê ji dil dida me; di stranan de, di hezkirina ajalan de, di lîstikên ber bi kuçê ve dest pê dikirin de…  Em bi zaroktîyek ji cewherê dihat mezin dibûn û hê pir tiştên ewê bihatana jiyîn hebûn ji bo wan jî…

## Xwestine navê “Nûhat” lê bikin

Em berdewam dikin ku Nîhat bi bîr bînin, wî nas bikin, dayika wî vê carê çîroka navê wî vedibêje:



Davut jî weke me 20 salî ye niha. Davut tiştên roja bûyerê jîyaye, hîsên xwe ji rojnama *Yeni Özgür Politika* re qal kiriye

“Nîhatê min çêbû hemû kesan pir ji wî hez dikirin. Digotin ‘Sê qîzên we hene, lawê we tune ye’, pir kêfa wan ji çêbûna wî re hatibû. Navê wî jî bavê wî lê kir. Min got bila Mihemed be, wî got bila Nîhat be.”

Bavê wî jî di mijara nav de tiştekî lê zêde dike:

“Ez vê jî bêjim ku ferqa keç-lawan li cem me tune ye. Lê gava zarokek keç, a duyem keç, a sêyem keç çêbû me digot xwezî lawek me jî hebûya.” (Bi ken vedibêje.) “Xwedê piştî zaroka sêyem Nîhat da me, pir kêfa me hatibû. Me navê Nîhat lê kir yanî yê nû hatî, di Kurdî de ‘nû hat’ e.”

Dayika wî dibêje “Li nexweşxanê hemşîrê jî navê Mihemed lê kiribû, min jî pir dixwest Mihemed be. Lê bavê wî got bila Nîhat be. Bi çêbûna wî kêfa hemû kesan hatibû, bi mirina wî jî hemû kes pir qeherîn. Hemû kes hatibûn şînê jî”.

Mirov nikare lê nefikire, heke Nîhat bijiya ewê niha 18 salî bûya. Gelo ev taybetmendîyên, wî dikin ew kes û dikin ku em Nîhat nas bikin ewê çiqasî biguherîyana? Bersiva vana tune ye hilbet lewra heke Nîhat bijîya dikarîbû ev bersiva bidaya. Lê Nîhat weke zarokekî ma!


## Li ser bêewlehîyê

“Ji Nîhatê min mezintir 3 qîzên min hebûn, 2 jê biçûktir hebûn. 5 qîzên min hebûn û Nîhatê min hebû. Min pir qedr û qîmet dida Nîhatê xwe. Carekê ewê di rojek bi firtone û baran de Nîhatê min biçûya dibistanê, min jî got îro pir bi firtone û baran e, ezê Nîhatê xwe neşînim dibistanê. Rojek dibû dikan, sûk girtî dibû, ez difikirîm ku dibe erebeyek li bin guhê wî bikeve. Min texmîn nekir ku ewê dewlet li ser serê lawê min bisekine û wî bikuje. Heta ku ez sax bim *min sed zaro hebin, min sed dinya dîtibe* ez nekarim yekî weke Nîhatê xwe bibînim.”


Li gor Dayika Eyşê dibêje berîya Nîhat bimre, wê rojê Dayika Eyşê ji malê derketîye lê pir temî li Nîhat kiriye ku ji malê dernekeve. Di wê pêvajoyê de li Cizîrê pir zarok hatibûn kuştin. Bi taybetî ji veya pir tirsîyaye. Li Cizîrê hîskirina mirov a li qada jiyanê ya xwezayî be jî li taxa xwe be jî ne li dorhêlek ewle ye tiştekî sawdar e. Dibêjin panzêr bi hinceta heyama şer bi hêsanî diketin her derê û derdiketin. Diketine kuçeyan, navbera peyarêkên em lê rûdinên û sohbetekê parve dikin, nav zarokên bi lîstikan dilîstin, heta hewşa malan jî. Cihekî weha mala mirov be jî ewê mirov nekaribe ku xwe

lê ewle hîs bike. Ango jiyîna li Cizîrê bes e ji bo wesayîtên zirxî hemû qadên we yên jiyanê dagir bikin, qadek tenê jî ne ewle ye; her der hatiye veguhestinî qada şer. Ev hemû, çi karê alavên şer di hundirê jiyanê de heye bi mirov didin gotin. Hêzên ewlehîyê di pozisyona ewlehîyê tune dikin de ne, ev jî ji bo Cizîrê nakokîyek bi dehan salan e berdewam dike ye. Dayika Eyşê ji me re vedibêje; nekare ji malê derkeve, dema derdikeve jî dilê wê bi zarokên wê re dimîne. Heke panzêr li gor kêfa xwe dikeve hewşê jî ji bo dayikekê li ser navê ewlehîyê ewê çi bimîne?

Ji bo dayikekê zaroka/ê wê her tişt e. Dayika Eyşê yeka bi taybetî li van xetereyan baldar e, ji bo wî di ewlehîyê de bihêle pir hewl daye. Dayikek qêmîşî zaroka/ê xwe nake; ji bo erebe li bin guha nekeve, ji bo necemide naşîne dibistanê. Paşê wesayîtên zirxî yên ku hemû kuçeyên me, kolanên me, hewşên me, bajarê me dagir dikin zarokekî, hevalê me, Nîhat bi kuştinê diparêzin!




**Di**




Hin Xêzên Zarokan Ên Ku Di Çalakîya Komeleya Gündem Çocuk Di Gulana 2015An De Li Cizîrê Bi Zarokan Re Çêkiriye (Nûçe Dilşah Özdünç/ Bianet)



(Wêne: Ajansa Nûçeyan a Demirören – 24ê Îlona 2015an, 15:20)

## nava ewqas tiştan de em tenê zarok bûn...

“Hevalên wî niha jî -Xwedê temenekî xweş bide hemûyan- min li ku bibînin destê min maçî dikin. Hemû gir û mezin bûne. Hê hurmeta wî nîşanî min didin. Hemû jî pir xemgîn bûn, di nav hiznê de fetisîn, psîkolojîya hemûyan xera bû. Hê jî hevalên wî hurmetê nîşanî min didin, ji bo xatirê wî. Hevalên wî pir bûn, hevaltîya wî xweş bû, pir ji wî hez dikirin, zarokan pir ji wî hez dikirin.”

Dayika wî, dema gotin dihat ser qala hevalên Nîhat dikir. Wê rojê yên bibûn şahidê bûyerê ew bûn û ez dibêm qey yên herî nêzîkî Nîhat hîs dikirin ew zarok bûn. Lewra wê rojê dibû ku di şûna Nîhat de ew jî bûna! Li gor Dayika Eyşê dibêje Nîhat û hevalên xwe dema li ser girikê li hember nexweşxanê dilîstin polîsên di aqrepa li hember wan bi cî bibû de bûn ji wan re tilîkên xwe kil kirine û gefa emê we yeko yeko bikujin xwarine. Tekane sedema hê 12 salî bi gefên weha re rû bi rû manê bûna li Cizîrê zarokek Kurd î dilîze ye...

Wêneyê hevalê Nîhat, Davut ê dema li wêneyî wî dinerî hatiye kişandin di bîra me hemûyan de cî girtîye.

## Polîs: Emê we hemûyan bikujin!

Davut Yanıkê ku dibêje roja Kazanhan hate gulekirin qet ji bîr nake, wê rojê weha vedibêje: “Roja 14ê Rêbendanê em li taxa jêr a Yafesê bûn. Cihekî nêzîkî sînor bû. Paşê em derketin cihê Nîhat lê hate kuştin, yanî hêla nexweşxanê. Polîs jixwe li wir disekinîn. Gava du wesayîtên zirxî ji cihê em lê bûn derbas bûn, zarokan bi tiliyên xwe îşareta serkeftinê kirin û slogan avêtin. Polîsên li hemberê disekinîn dest pê kirin ber bi me ve gule berdan. Ez bi qasî ku karibim bibînim kî guleyan berdide nêzîk bûm. Ez paş de zîvirîm û min ber bi jêr ve dest bi revê kir, lê Nîhat nekarîbû birevîya. Di wê navberê de wî gule kiribûn. Bombeyek gazê ya cuda davêtin ser me. Biçûk bû, nedişibîya bombeyên gazê yên din. Nîhat, hema li pişt min bû. Min dît kete erdê. Paşê yek revîya û rahişt Nîhat. Wî xiste qemyonekê û bir nexweşxanê. Kesên gule bera me dan bi wesayîtên zirxî ketin qereqola li Yafesê. Heman polîsan li wir montek li xwe kirin. Montekî dirêj bû. Rûpoj jî dan ser çavên xwe û hatin guleyên vala yên li cihê Nîhat lê hate gulekirin



Wêne: Sertaç Kayar

dan hev. Di wê navberê de me bertek nîşan da, lê dîsa gule bera me dan û gef xwarin gotin 'Emê we hemûyan bikujin' û çûn."

## Dibû yê ku hate gulekirin ji me yekî din bûya

Yanıkê ku dibêje piştî çûna polîsan em çûn nexweşxanê, dibêje li nexweşxanê hîn bûne ku Kazanhan mirî ye. Yanıkê ku bûyerê bi awayê "Weke xewnekê bû. Her tişt ji nişka ve qewimî bû. Nîhat bi carekê re hatibû gulekirin û miribû" vedibêje, dîyar dike ku polîsên hatibûn wir ji bo hinan bikujin hatibûn wir. Yanıkê dibêje "Yê ku hate kuştin dibû ku ji me yekî din bûya, lê li Nîhat rast hat", dema Kazanhan hate kuştin çi hîskiriye jî weha vedibêje:


"Zarok bûn em. Hevalê me li ber çavên me kuştin. Li cihekî din bûya ewê qiyamet raba lê kesekî me nedidît. Ê ku li Nîhat weya kir ewê li me jî bikira. Jixwe kuştina Nîhat bû destpêk. Ji bo me demên dijwar dest pê kiribûn. Piştî wê rojê, zarokên xweşkayî bi lîstikan lîstin jî nebûn li Cizîrê. Jixwe paşê şer dest pê kir û gelek zarok kuştin. Gelek zarok birîndar kirin. Em bûn ku êdî dernakevin kuçê jî."[10]

Weke Davut dibêje, tiştê tenê dikare bê gotin: "Zarok bûn em."

---

[10] Yeni Özgür Politika, 28 Kewçêr 2021

Dayika Eyşê, ji me re got ku Nîhat li lênûska xwe sûretê panzêrekê çêkirîye. Lênûska wî nîşanî me dan, me her sêyan got gelo lênûska Nîhat ewê çawa be û me bi meraq hebekî tev da. Herçî ku lênûska ji bo dibistanê bi kar tanî be jî Nîhat dîsa jî ji xwe hin tişt li lênûskê zêde kirine. Encama ev mijûlîya di rûpelekê de bû sedema bişirînek li ser çavên me. Ez ji lênûska Nîhat rûpelek weha  dihêlim. Zarokek biçûk be jî hevokên bi Kurdî nivîsandine ewê bişirînekê çêbikin.



Tiştên Di Lênûskê De Hatine Nivîsandin: *Diya Min Bave Min Pismamam Hevalen Gele Başin*.(Dayika Min, Bavê Min Û Pismamên Min Hevalên Gelek Baş In.)
Hevalen Min Ya Heribaş Birane. [Dibe Ku Xwestibe Bêje: Hevalên Min Yê Herî Baş Yên Rast In.]
Hevalen Min Ya Heribaş Birane)

Em hertim dibêjin ji çavên zarokekî dîtina dinyayê. Bersiva herî rast û ya herî durist ji wan tê. Ê me em weke zarokên bi şer re di nav hev de bûn jîyana me hebekî din cuda bû, di mercên herî tund de rastîya me didît mezintir bû. Lewra tu di serdemên xwe yê herî biçûk de bi qedexeyan, bi  zordarîyan re hev nas dikî. Dewlet tundîyê nîşanî te dide û malbata te, hevalên te dikuje. Ez hê biçûk bûm min dest bi hîskirina divê ez xwe biparêzim kiribû. Ji ber ku her dera tu tenê dimîne yan namîne bi xetere ye. Leşker, çek, panzêr li her derê jîyana te ne. Vê zor dida min ku ez her gav amade bim ji bo xwe biparêzim.

Her kêlîya tu ji mirinê xelas dibî, li hember mirinê tu hebekî dinê bêtirs dibî. Li gel vê jîyana te berdewam dike. Tu berdewam dikî jîyana xwe jî dijî. Ango her du pev re derbas dibin, dema tu dijî di heman demê de tu hewl didî xwe biparêze jî. Di pêvajoya 2015an de piştî pevçûnên li Geverê rû dan bi demekê ( di pêvajoya 2016-2017an de) çend hevokên min nivîsandibûn weha bûn:

> *Jiyanek ku hemû kes hûr hûr jê haydar dibûn û heta mecbûr diman jê haydar (bûyî) bijîn, divê tu her kêlî hişyar be dest pê kiribû... Ji ber ku di kêlîyek pir ji rêzê de gava tu qet pê hayil nedibû encamek ji bo te girîng, ji bo wan basît pêk dihat: MİRİN. Em ên di nav xetereyê de dixwendin bûn, me ders didît. Carinan di nava dersê de ji nişka ve pevçûn derdiket û avahîya me ya gelekî kevn ji serî ta binî bi gaza îsotan tije dibû. Di demên weha de me avahî vala dikir û me ew roj tenê bi axaftina li ser vê derbas dikir. Carinan jî em nekarîbûn dûr biketana. Demên me ji dûrahîya dikarîbû dengê çekan pir zindî hîs bikira dibihîst çêdibûn, ji dûrahîya bi qasî di navbera qatê herî jor ê avahîya me ders lê didît û qatên herî jêr. Û em hemû xwendekar ji paceyên ku hemû dîwarên qatan radipêçan dûr diketin û tam li navenda qata herî jor dicivîyan û em li bendê diman ku ev biqede. Lewra piştî ev biqedîya an me yê dersê xwe berdewam bikira an jî heke tevlihevîya bi xetere berdewam bikira emê ber bi malên xwe ve belav bibana. Ders û mirin pev re derbas dibûn. Tu dibê qey me nizanîbû kîjan girîngtir e, an jî mirin êdî bibû weke hînbûnek di jiyana me de negirîng, belkî jî em bi qasî ku ji bîr bikin ku kuştin tiştekî mezin e hîn bibûn. Sedema mirinan çi bû; an ji ber kesê nasnameya wî jê hatiye xwestin nasnama xwe nedaye an jî ji ber bersiv nedaye pirseke ji haş û belaş hatîye pirsîn... Diviya sedema mirinê girîng bûya lewra belkî ji bo em negihên vê encamê em ji yên newêrek û nekarîbûn bedel bidana bûn. Lê niha ji ber 'hêza vê biryarê hema jixwe pêk tîne' li kuçeyên te her kêlîyê li pişt stûyê te mirinek hêvî lê nedihat kirin hebû. Ya sedema wê wan diyar dikir û belkî hema jixwe ji rêzê, hema jixwe nepêwîst, tenê li ser kuştinê!*

Dema ez li kuçeyên Geverê dimeşîyam tiştên dihatin hîskirin kûr bûn, li kuçeyên Cizîrê tiştê Davut hîs kiribû, tiştê Nîhat hîs kiribû... Li kuçeyên me

yên ez hema jixwe lê dimeşîyam mirin pêk dihatin.  Kuştina yên bi ser malên wan de dihate girtin, mirina yên ji pêlikan ber bi jêr ve dihatin avêtin, dengên çekan û pişt re mirin... Şahidîya mirina mêrê kal ê ku gava li kuçeya dermanxaneyan dimeşîya bedena wî bi panzêrê hate pelçiqandin ji bo min hedê herî dawî bû. Çavên me,  çavên me yên ku nîşandarên rastîyê yên herî baş in ewê me hê bi pir tiştan re rastî hev bianîyana. “Zarok bûn em” lê em pir zû mezin dibûn.

Van gotinên bavê Nîhat jî vê didin fikrandin:

““Biçûk bû lê li gor biçûktîya xwe weke yekî 20 salî bû; fikrên wî hebûn, bi hirs bû, xerabî qebûl nedikir, neheqî qebûl nedikir.”

Her ku min Nîhat nas dikir min rastîya xwe didît. Ez ne tenê bûm û ew jî ne tenê bû. Em hê hebûn û em zarokên ewê hînî mirinê jî qetlîaman jî nebûna bûn. Ji ber ku hînbûn devjê berdana lêpirsînê ye, devjê berdana haydarbûnê ye. Li hember her rewşa li dijî rastîya me, li dijî têgihiştina me ya jiyanê ewê bawerîya ji nû ve afirandinê hebe. Heta ku em dev ji vê bernedin em hene. Ji ber vê emê hîn nebin!

## Nîhat zarokek ji aştîyê hez dikir bû...

Em dîsa jî xweşik difikirîn, me xeyala aştîyê dikir. Tundî ji bo me bi ferzkirina êrişkaran çêbibû, me tundî bi wan nas kir. Di nava van pevçûnan û nexweşikîyan de, ên li qadên me yên xwezayî dijîn, ên vir bi hemû xwezahîya xwe li gor cewhera wê didin jiyandin hene. Bi taybetî yên zarok, bê berjewendî, bê hesab tênê bi xîreta mirovbûnê jiyana xwe li qadên lîstinê, li malên xwe, li parkên xwe, li kuçeyên xwe, di pirsên xwe yên paqij de derdewam dikin... Ev hemû pevçûnana, pêvajoyana, mirinana tenê û tenê encama mirovmayinê û serî netewandinê ne. Mirina zarokeke li Cizîrê ji dîroka Cizîrê veqetandin berê xwe guhertina ji vê bîrê bi xwe ye. Goristanên vî bajarî jî bîreke pir tûj neqil dikin. Ji 90an bi vir ve pir tiştên nayên guhertin hene li Cizîrê... Mirin... Panzêr... Lê ya herî girîng “berxwedan”... “îsrara aştîyek bi rûmet”...

Bavê wî, dîyalogek xwe ya bi Nîhat re weha neqil dike:

“Carinan min dipirsî tê bixwînî tu difikirî bibî çi, digot ku heke ezê ji we veqetim ez nabim tu tişt...”

Dayika wî jî lê zêde dike:

“Dema qetlîamên li Rojava dihatin jiyîn pir xemgîn dibû, pir pir pir diqeherî, pir melûl bû, diqeherî. Zarokek bi ruhê aştîyê dijîya bû.”

## “Di wê pêvajoyê de pir zarok dimirin...”

Ji bo mirov wê pêvajoyê nas bike divê lê vegere û binere, çi dikare bibe êşa herî kûr ya mirovek dikare bibe şahidê wê. Vîdyoyek min lê temaşe kiribû hebû, hevpeyvîna bi dayikekê re hatibû kirin jî hebû di hundirê vîdyoyê de. Dayika Ümit Kurtê ku yekî ji nav zarokên di pêvajoya 2015an de hatin kuştin e, dayikek li Taxa Cûdîyê di nava şer de lawê xwe wenda kirîye, di hevpeyvînê de dipeyivî, ez ji wê vîdyoyê beşek weha datînim: “Dewleta Tirk gelek tiştên xerab anîn serê me, em ji vê ditirsin. Heyfa me, em hatin rewşek weha ku di dawîya dawî de emê giş xwe bişewitînin. Carin ez dibêjim di hundirê vê malê de ez agir bera xwe bidim. Hêza min a ez bêtir bipeyivim nema, dilê min dike bisekine ji qahran, ji êşê. Min pir ji wî hez dikir. Lawê min bi neheqî kuştin. Wî qetil kirin.”

Em niha li Taxa Cûdî ne û li gel malbata Nîhatê di wê pêvajoyê de hate kuştin in. Herçî ku ji dilê me nayê em ji dê û bav daxwaza vegotina wê pêvajoyê bikin jî bi herikîna sohbetê re ew jixweber dixwazin pêvajoya 2015an û tiştên hatin jiyîn vebêjin.

Pêşî bavê wî dest pê dike:

“Wê heyamê zarokên din jî hatibûn kuştin. Hê li Cizîrê qedexê dest pê nekiribû. Carinan li taxê, li kuçeyan digerîyan, nexweşî hebû, digirtin ser malan. Piştî wê heyamê Hatip Dicle hate vir, ‘Divê em bisekinin, divê aştî çêbibe, lazim e ev zarokana ( bi giştî mirov) nemirin.’ Wê heyamê hat ji ber ku digirtin ser taxa me, pir kes, pir zarok hatin kuştin di wê pêvajoyê de… Dema ew hat derdor aram bû, baş bû. Ez jî serê wê sibehê çûm İraqê. Gava ez çûm Nîhat hê di xew de bû. Gava Hatip Dicle axaftina xwe kir, eyn di wan saetana de nêzî sed polîs, tîmên taybet hatibûn vir lê ne yên vir bûn. Li ser meselê ji Meletî hatibûn, ji cihên din lê ne yên Cizîrê bûn. Li hember nexweşxanê bûn, li wir qereqol heye lê ne li qereqolê bûn. Li hember nexweşxanê girek heye li wir me aqreba reş dît, zarokan jî ji xwe re li wir dilîstin. Hilbet zarok jî tiştekî fêhm nakin tenê noqî lîstika xwe bûne, wesayîta zirxî jî tam li hember wan bû. Teqez ku malûmatek wan, nêytek wan hebû. Lê dîyar bû tiştekî baş nedixwestin. Saet li dor 2-3yan bû.”

Dayika Eyşê dikeve navberê:

“Hê derengtir bû. Nîv saet, saetek nemabû ji êvarê re.”

Bavê wî berdewam dike:

“Paşê ji min re telefon hat, hevalekî min di telewîzyonê de dîtîye xeber jê re hatîye nizanim, gote hal mesele ev e, ji min pirsî got Nîhat kî ye. Gotîye qey hevalê min e nizane lawê min e, ji min re dibêje Nîhat kî ye, ez li İraqê me. Min pirsî ku çi bûye? Rewş vegot... Lê rojek wek wê rojê ez zû çûbim İraqê tune bû, di rewşên asayî de lêgerîn çêdibû, sekinandin çêdibû lê wê rojê em pir zû çûn. Min got *xwedê xêr bike*, tiştek di vê de heye. Di rewşên asayî de sekinandin çêdibe, pêşmerge hene, qelebalix heye lê ew qelebalix wê rojê tune bû. Ev 7-8 sal in ez diherim wir, wê rojê hebekî cuda bû. Ez çawa gîhaştim wir agahî dan min, gotin tenê birîndar e. Min jî erebe li wir hişt, ez vegerîyam. Gava ez vegerîyam Cizîrê rêya navendî ji xwe nêzîkî me ye, li cem nexweşxanê jî li her derê pir zêde mirov hebûn, hemû kes derketibûn, serhildanek mezin hebû. Ew tevgera eşkere ditîbûn loma serhildanek mezin hebû. Gel zordarîya dihatin kirin didît. Gava ku tiştek li holê tune be, ma tu bi kêfî li vir î?”

Dayik dikeve nav peyvê:

“Kêfî bû!”

Bavê wî berdewam dike:

“Kêfî bû çi bû werhasil, tu ne leşkerê vir î, ne polîsê vir î; tu ji ku tê vir tevlîhevîyek weha derdixî. Ha ji ber vê sedemê serhildanek mezin çêbû. Piştî bûyerê jî dinya rabû ser nigan, piştî Tirkîye rabû ser nigan. Piştî wê karmendan, dozgeran, dadgeran bang li me dikirin. Jixwe piştî heftakê dîmenê wê yê eşkere derket. Me digot polîsan tevger çêkirîye, wan qebûl nedikir. Serokkomar, Serokwezîr Ahmet Davutoğlu paşê daxuyanî da got ‘Tiştekî polîs bûye sedama wê tune ye’.”

Hestên Dayika Eyşê dema ji Davutoğlu gazinan dike encax gava di zimanê dayikê de tê neqil qirin wateya xwe wenda nakin:

“Erê wele Davutoğlu. Xwedê bela xwe bide te. Rebî, bike xatrê xwedê çawa kezeba min şewitîye ya Davutoğlu jî welê bişewite.”

Bavê wî jî tiştekî lê zêde dike di vê mijarê de:

“Digot teqez polîsê me weha nekirîye. Dîmen ketin destê çapemenîyê, derket holê. Dadgehê dîmen xwestin. Dozger, dadgeran jî ji ber ku mesele mezin bû gotin em derxin holê. Di navbera wan de pevçûnek çawa derket nizanim.”

## “Polîsan em kuştin...”

Dayika wî berdewam dike bûyerê vedibêje:

“Hevalên wî di derbarê TİM[*yekîneyên hêzên taybet*] de digotin, ‘Polîsan em kuştin’, tilîya xwe ber bi me ve kil dikir û gef dixwar digot ezê we hemûyan yeko yeko bikujim. Saeta Nîhat kuştine li zarokan jî weha kirine, li hember ku zarokek kuştibûn jî. Zarok direvin, polîs bangî zarokan dike dibêje ezê we hemûyan yeko yeko bikujim. Zarok ji dadgêr re got ku polîs ji me re weha gotîye. 20 zarok hene li wir, ji xwe re bi lîstikan dilîzin. Koncalek kolane, hundirê wê tije kevir kirine bi lîstikê dilîzin wê hingê. Polîs bêsedem bangî zarokan dike, dibêje ezê we hemûyan yeko yeko bikujim.”

## “Şîna wî şeş mehan berdewam kir.”

Em dixwazin ji malbatê pirsa li Cizîrê bi taybetî di heyama şer de ji malbatê re ji civakê piştgirîyek çawa hatîye bikin. Li gor vegotina malbatê şîna Nîhat pir dirêj berdewam kirîye. Ne tenê ji Cizîrê, ji bajarên din, ji STKyan[*Sazîyên Civaka Sivîl*], ji parêzeran û heta ji dervî welat jî gelek kes hatine. Mirina Nîhat dinya hejandîye. Bi awayekî xurt dikeve rojeva wê heyama berxwedan digihêje asteke xurt û gel ber bi kuçeyan ve diherike. Em dibin şahid ku di vê pêvajoyê de girseyek mezin li gel malbatê pir îsrar kirine ku faîlên Nîhat qe nebe di pêvajoya darizandinê de bên cezakirin. Bavê wî ji me re dest bi vegotina vê pêvajoyê dike:

“Ez şeş mehan li şîna wî mam. Şîna Nîhat şeş mehan berdewam kir. Ji baroyê parêzer hatin, Tahir Elçi weke serokê baroyê hat. Ji bo li dozê binerin min wekalet da 112 parêzerên Cizîrê. Dozê berdewam dikir, qedexe jî hebû, di nav wê bêhizûrîyê de hemû parêzer li ser vê bûyerê pir sekinîn. Li qonaxa hikûmetê cî tune bû; ji Sêrtê hatin, ji Enqerê hatin parêzerên ji hemû bajaran tev lê bûn hebûn.”

Dayika wî lê zêde dike:

“Ji hemû bajaran parêzer hatin.” Dia dike û dibêje: “Xwedê xêra wan bibîne, ez gorî serê hemûyan bim înşellah, hemû emanetê Xwedê bin.”

Bavê wî dibêje “Piştî ew dîmen derketin hayê dinyê ji neheqîyê çêbibû. Yên ji dervî welêt hatibûn jî hebûn, zimanê me jî fêhm nedikirin, yên bi rêwîtîya gelek dirêj hatibûn jî hebûn. Şîna me pir dirêj berdewam kir, şeş mehan berdewam kir.”

Em dipirsin bê ka ji civakê ji bo şînê pir piştgirî hatîye an na.

Bi awayê “Li şînê pir piştgirî dan. Lê di wê pêvajoyê de civak jixwe xerab bû, lewra piştî mirina Nîhat bi 6-7 mehan pevçûnan girantir berdewam kirin. Jixwe di wê pêvajoyê de hayê kesî ji kesî tune bû. Li bajêr bêhizûrîyên hê mezintir jî çêbûn.

Veşartina wî jî pir qelebalix bû. Ev şîn hebekî cuda bû; ji dixtoran bigre, heta karmendan hemû kes tevlê bibûn.” bersivê dide bavê wî.

Dayika wî jî asta piştgirîyê weha neqil dike:

“Gava mirina wî bavê wî ne li vir bû. Wê rojê ji ber qelebalixê ambûlans nedikarî biçûya. Ewqasî pir [mirov] civîyabûn ku, ji Silopîyê, ji Şirnexê ji her derê hatibûn. Dema wî dibirin Amedê jî apê wî pê re çûbû, apê bavê wî çûbû, digot nêzî pêncsed erebe hatin pêşîya ambûlansê.”

Tahir Elçi di bîra her malbatê de cî girtîye, weke nirxeke li her malê em qala wî dikin û piştgirîya wî hîs dikin li vir jî tev li sohbeta me dibe...

Ev rêwîtîya me li gelek bajaran derbas bû, me bi gelek malbatan re sohbet kir û di sohbeta bi her malbatê re Tahir Elçi jî tevlê bû. Ji bo têkilîya Tahir Elçi ya bi malbatê re em hîn bibin me bi taybetî pirsî:

“Têkilîya Tahir Elçi bi we re çawa bû?”

“Min Tahir Elçi li Newroza Amedê ya 2015an, li qada Newrozê dîtibû. Ez jî tevlî Newrozê bibûm, bi telefonê bangî min jî kiribûn. Di protokolê de ew jî hebû, mebûsên me, şaredarên me jî di protokolê de bûn. Min wî nas nedikir lê wî xwe bi min da naskirin. Pirsî gote tu kî yî, min vegot. Got min jî xwestibû ez te bibînim. Nimra min a telefonê dîsa stend. Hê doz bi encam nebibû. Piştî Newrozê ji min re got ‘Meraq neke, emê li dadgehê hev bibînin’. Li dadgehê jî hat, piştî dadgehê jî hat. Heta doz bi encam bû ew û hevalên wî tim bi me re bûn.” weha vedibêje bavê Nîhat.

Dayika Nîhat jî peyvên bavê wî erê dike:

“Li dadgehê ji min re got ku ‘Meraq neke keça min heta ez saxbim ji bo lawê te ezê heta Ewropayê herim’. Xwedê mekanê wî bike cinet, Xwedê heqê wî jî heqê me jî li erdê nehêle. Xwedê vê zilmê xelas bike înşellah.”

## “Dikenîya, dema wî dişuştin jî dikenîya”

Em li ser cendekê Nîhat jî dipeyivin. Bavê wî gotinên mele neqil dike:

“Gava mele jî wî dişûşt Mele Qasim digot: Min ewqas mirî şuştin min bedenek weke ya Nîhat hê sax mayî neşuşt.”

Dayika wî weha lê zêde dike :“Digot ku dikenîya, wexta me wî dişuşt jî dikenîya”

## “Li şîna me hemû kes hebûn”

Dema em pirsa ji qetlîamê heta dema veşartinê ji alî dewletê zordarîyek hebû an tune bû dikin pêşî bavê wî bersivê dide:

“Di veşartina me de tu pirsgirêk derneket.”

Dayika Nîhat weha vedibêje “Qet bela xwe di me de nedan. Ji gel pir qelebalix hebû, lê ji ber vê bûyerê ne girtin ser mala me ne girtin ser partîyê. Zanîbûn neheqî kirine. Zarokê min bêsedem kuştin, neheqî li me kirin. Lê piştî wê em li benda bi ser de girtina wan bûn jî lê qet nekirin.”

Bavê wî dîsa dest bi peyvê dike:

“Dozger, dadgeran jî me fêhm dikirin, wê heyamê piştgirî didan.

Li şîna me hemû kes hebûn. Min qoricî jî dîtin, polîs jî dîtin. Wan jî ji ber vê bûyerê xwe xerab hîs kiribûn. Wan jî vê zilma qebûl nekirin. Vê bi eşkerehî gotin jî.”

## “Heke hestyarîya raya giştî çênebûya, ewê faîlên Nîhat ceza nestendana”

Malbat pêvajoya darizandinê ji me re vedibêje. Di vê pêvajoyê de bandora piştgirîya civakî çawa bû? Faîl hatin cezakirin? Rewşeke hatîye hînbûn heye ku faîlên hemû mirinên li bajarên Kurdan bi bêcezatîyê tên xelatkirin. Lê bi mirina Nîhat re girseyek mezin serî hilda, meşên girseyî hatin lidarxistin;

belkî jî cara pêşî mirovên ji hemû alîyên civakê ewqas demdirêj hatin cem hev. Ne tenê li Tirkiyê, vê li hemû cîhanê deng veda. Îsrara civakê hebekî pêvajo meşand, dîmenên faîl eşkere dîyar dikirin belav bûn, ên pêvajoya darizandinê dimeşandin nekarîbûn vana ji nedîtî bihatana. Bi taybetî parêzeran pêvajoya darizandinê bi baldarîyek mezin şopandin, jixwe gelek parêzeran pêvajoya dozê pev re dimeşandin, ne tenê parêzer gel jî di danişînan de, li adlîyê jî piştgirî dan malbatê. Bav ji me re weha vegot: “Li raya giştî hestyarîyek mezin hebû, hemû sazî û dezgehan dişopandin, jê pêv ji dervî welêt jî heyet hatibûn.” û lê zêde kir: “Heke hestyarîya raya giştî çênebûya, ewê faîlên Nîhat ceza nestendana.” Weke malbat dibêje, bi bandora vê piştgirîyê jî faîl belkî cara pêşî hatin cezakirin.

Li bajarên Kurdan ji ber mirinan tabloyên em pêrgî wan tên bi piranî tim xeternak in; faîl dîyar be ne dîyar be pêvajoya hiqûqî bi awayekî rast nayê meşandin. Malbat piştî ewqas mirinên rû dane jixwe ji bendemana tiştekî ji pêvajoya darizandinê bêzar bûne. Tim heman tablo: Bêcezatî… Li hember polîtîkaya ji hiqûqê encam nayê stendin û mirinan dike tiştekî ji rêzê belkî piştî demek dirêj cara pêşî ye ku serhildanek ewqas mezin a girseyî çêbû. Bav ji me re dibêje ku hestyarîya civakî li pêvajoya darizandinê bandorek weha kirîye û kirîye ku hebekî be jî bergîya polîtîkaya bêcezatîyê bê girtin.

Lê hilbet di pêvajoyek hiqûq weha xerab dihate pêk anîn cezakirinek hebûya jî ewê ev jî bi temamî bi dadwerî pêk nehata. Faîl dîsa hatin parastin, cezayê faîlan bi zêdeyî daxistin û pêk anîn: Kevir avêtina zarokan a polîsan weke tahrîqa neheq bi kar anîn û li hember qetlîamekê 13 sal ceza dan faîlan. Bav wê pêvajoyê ji me re weha neqil dike:

“Pêvajoya dozê weha bû ku yê pêşî hate girtin ne faîl bû, Kurdekî ji Meletî bû, çend heb Kurd hebûn. Gava 30-40 rojan di hundir de man îtiraf kirin. Ji bo dozê pir tevlêbûn hebû, 112 parêzer hatibûn, min wekalet dabû wan. Ji parêzeran bêtir gel jî pir hatibû, hewşa edlîyê pir qelebalix bû. Psîkolojîya me jî xera bibû. Piştî şînê pêvajoya dadgehê dest pê kir, pêvajo pir dirêj bû, em diçûn û dihatin. Faîlan û yên hatibûn girtin sûc davêtin ser hevdu. Di nav yên dihatin darizandin de Kurd jî hebû lê faîl Tirk bû. Em di çiqas wextî de çûn nayê bîra min lê pir dirêj bû.

Jixwe kamerayê faîl zevt kiribû, wî dîtin, 13 sal û 4 meh ceza danê lê me qebûl nekir, me bir Yargitayê[*dadgeha bilind*]. Eyşê jî qebûl nekir, li dadgehî li hember derket. Digot ev çawa dibe, li holê qetlîamek heye, hûn dibêjin 13 sal. Wan jî bir Yargitayê me jî bir, lê hê jî bi encam nebûye. Serokê baroya

vir Nuşervan Elçî şand Yargitayê, niha jî Rohat Dilsiz dişopîne. Bi neheqî darizandin jî, bi awayekî ne lazim daxistina tahrîqa neheq kirin. Xwestin ceza daxin. Lê ez dikarim vê bêjim ku heke gel pir li ser nesekinîya ev ceza jî nedidan. Lewra berî wî bi hezaran kes mirin lê bi rastî min nedît kesî jî weha ceza stend.

Neheqîyek mezn hebû, bêsedemîyek hebû. Gel jî pir rabû ser nigan. Ne tenê Tirkîye Ewropa jî rabû ser nigan. Jixwe yên ji Ewropa hatibûn jî hebûn."

## "Lawê min weke milyaketan bû..."

Dayika Nîhat li hember ên bûne sedema vê êşê bi hêrs e:

Bi awayê "Polîsê Nîhatê min kuşt jî Davutoğlu jî çawa dilê min şewitandibin înşellah dilê wan jî weha bişewite, weha perçe bibe. Ma Nîhatê min neheqîyek kirîye, cihêkarîyek kirîye? Lawê min weke milyaketan bû. Tenê ji xwe re bi lîstikan dilîst... Lawê min kuştin. Înşellah yên bûn sedem, yên li ser wî axivîn, yên bûyer berevajî kirin dilê min çawa şewitî be yê wan hê bêtir bişewite." daxwaza xwe tîne ziman.

## Şîrê qehrê...

Dema qala qîza xwe Çîçek dike jî ji me re dibêje ku bê êş û qahr çawa bûye xwedîyê jîyana wan: "Çîçek piştî mirina Nîhat bi demekê çêbû. Ew hebekî zeîf bû, bedenek wê ya zarîf hebû. Merivan tim digotin *şîrê qehrê* vexwarîye."

## Ber bi dawîya sohbetê ve

Sohbeta me nêzîkî xelasbûnê dibû. Di her sohbetê de tiştên malbatan bi me dida hîskirin ev bû: "Divê malbat tenê neyên hiştin û bi taybetî jî neyên ji bîr kirin." Ango ji ber ku bi me re ev sohbeta parve kiribûn herî pir wan hêz stendibû. Ê me jî gelek tiştên em hîn bibûn hebû û ji bo em vana parve bikin sebra me tune bû. Ji bo me pir bi qîmet bûn her parvekirinên wan lewra ji dil dabûn. Herçî ku ji bo em li mala wan bimînin pir îsrar kirin jî em mecbûr man pêşnîyara wan qebûl nekin. Dema veqetandina ji malê hatibû. Dayikê xwest bi me re bimeşe. Gava me xatir ji hev xwest me got ev ne xatirxwestinek e, emê car bi car dîsa bibin mêvan. Dayika Eyşê got ku me

weke mêvanan nabînin, em jî weke lawê wan Nîhat zarokên wan in. Me pir xweş hîs dikir, me heta dawîya kuçê bi rê kirin Dayika Eyşê û qîza wê Çiçekê.

## Û ber bi goristana Cizîrê ve...

Roja din piştî me bi malbata Cemîle re hev bidîta ji bo em hem gora Nîhat hem a Cemîle bibînin emê biçûna goristana mezin a Cizîrê. Em bêjin ji Cizîrê çi maye ewê nêzîkahîya me şaş be. Ev mirinana jî tiştên li bajêr qewimîn jî heqîqetek divê neyê ji bîr kirin e û îro jî bandora xwe berdewam dike. Xerakirin tenê di şerekî de pêk nehat, li peyarêka niha em li ser dimeşin li alîyê em berê xwe didinê rêz bi rêz TOKİ[*Rêveberina Xaniyên Komelî*] rêz dibin. Dema tu hemû rastîyê dixwînî û lê dinerî, dîmenên tevlî normalîyê bûne balê dikşînin. Gava em temaşa jêrzemînan, bîra di bin van TOKİyên hatine avakirin de, şopên rabirdûyê, her tiştê divê neyê normal kirin dikin û dimeşin em her avahîyekê weke perçeyek vê kavilê dibînin. Her tişt dîsa li ber çavên me disêwire...

Goristana Cizîrê mezin e û cîyekî bi meşê naqede ye. Ji rêya axê ya ji ketina goristanê ve destpê dike ango ji derbaseyê ve em ber bi pêş diçin. Li her derê gorên zarokan hene, hem jî pir zêde. Li ser kevirê hinên ji wan wêneyê wan heye, bi hin kevirê goran ve leçek hatîye girêdan, mêjûya rojbûna wan pir nêzîkî mêjûya niha ye... Em di bin bandorê de diman. Me dixwest em li bîranîna hevalên xwe xwedî derkevin; em çîrokên wan, gera  wan a wextekê li vir, kî bûn ew ji bîr nekin... Me dixwest têkilîya wan bi jiyanê re datanî hîs bikin û vê bidin jîyandin. Û li vir dev ji hînbûna çîrokên wan berdin zarokên ku nayê zanîn kî ne û li ser kevirê gorên wan navê wan nehatîye nivîsandin jî hene... Ew jî li van kuçeyan gerîyan, ê wan jî kulîlk, reng, çîrok, mekan û lîstikên jê hez dikirin hebûn: Ji bo hemû hevalên me yên navê wan hatîye nivîsandin û nehatîye nivîsandin ji dilê min ev tê, li dinyake aştî lê hebe ewê mirin evqas zû nebin.

Ji bo em hevalên xwe yên weha dil xweşik û bûne perçeyek çandina aştîyê bi hebûn bikin em jî bûn perçeyek. Û ez ji bo wan dibêjim ku:

“Ciwan in em, weke namlûyê / Û dilpola / Bêrîkarê aştîyê, cejnê / Ji bo xewên, kûr, bê xem, rihet / Ji bo kenê bi sî û du diranên xwe / Ji bo têr pev

şabûnê, xwarinê."[11] Ciwan in em û bi hemû lêgerînvanên heqîqetê yên ciwan re em heman dilî hildigrin. Emê li ser erdê vê erdnîgarîyê bi qasî dirêjahîya wê wêrekîyê biçînin, emê bi wêrekî bixebitin, emê azadîyê biçînin. Emê kedê û wateyê mezin bikin. Emê bi gavên bi hêz pêş de herin. Em ji hêvîyê re hene, ji şînbûnê re hene, ji afirandina bi keda giran re hene. Em "Ji cidî stendina jiyanê re" hene. Heta ku ji nexweşikiyê yek jê jî nemîne... Em ji veçirandina rastîyê re hene. Emê bawer bikin. Kî dikare me bisekinîne, ji me çêtir kî dikare bi ser keve? Emê bikin ji ber ku em heq dikin û emê bi ser kevin.  Em ciwan in û ji bo her tiştî amade ne. Heta ku zarokek tenê yê bêrîkarê hêvîyê, bêrîkarê azadîyê, bêrîkarê hezkirinê û aştîyê nemîne, li hember demê serî rakin, ciwan bimînin û ji bo bizirên xwe şîn bikin em hene; heta ku xelekên hezkirinê hemû dinyê rapêçe, heta ku ser rûyê erdê bibe rûyê eşqê em hene...

"*Bila ew roj bê, şadîya me nû bibe wê çaxê bibîne*

*Dinyayê hela bila aştî pêk were wê çaxê tu bibîne*

*Temaşe bike li gulê, li bilbilê*

*Cot bi cot hêv li ezman in*

*Her şev çardê  hêvê*

*Ewê çûk derbas bibin ji ser banîyan ve*

*Ewê çûk bilûsin li ser banîyan*

*Heke dengê peran bibihîzin û şîyar bibin*

[11] Ji helbesta "Te Dî Tu Gule Berdê Di Şevê Re Derbas Nabe" ya Ahmed Arif wergirtin.

*Bila dîsa bi çûkan re rakevin zarok*

*Tiştên dibin û diqewimin venebêje*

*Tiştê min qet nedîtiye ev*

*Çavê gur bêzar bûye ji kerî*

*Nîvê sêvê cemidî, nîvê wê germ*

*Li gîhayên jahrî gerîyaye goşî*

*Ewê ji tavê baran biherike*

*Bila biqede begîtîya serdema hesinî*

*Rojeke nû dest pê dike ango*

*Li ser rûyê erdê jiyîna bê tirs*

*Ji bo du milyar kesan dinyayek*

*Ji bo du milyar kesan du milyar nan*

*Ewê heyf be heke ev xewn nîvco bimîne*

*Heke roja aştîyê mafê mirov bê xwarin*

*Divê li peyva Köroğlu bê guhdarkirin*

*Ji bajarê Sêwasê gundê Banazê*

*Pir Sultan Abdal divê vebijî*

*Ax rojên min têrê bike ez te bibînim*

*Hêza min têrê bike ez pesnê te bidim*

*Serdema aştîyê, serdema zêr*

*Bila hozanê dawî bibim ez ê vê bêrîkirinê*

*Heke ev bêrîkirin xelas bibe*

*Bila ew roj bê, şadîya me nû bibe wê çaxê bibîne*

*Dinyayê hela bila aştî pêk were wê çaxê tu bibîne*

*Temaşe bike li hozanê dîn*

*Ji serî ta binî hezkirin, ji serî ta binî bengînî*

*Zimanê wî/wê ji hungiv şêrîntir"* [12]

[12] Helbesta Melih Cevdet Anday a "Bila Bibe û Tu Bibîne"

*Çîrokek kulîlka sakura: "Rozerîn"*

# Rozerin Çukur

*Ji hemû zarokên hatine kuştin re,*
*Ji yên nemirana ewê bibana hevalên me re,*
*Û ji hevala min, giyana min Rozerîn re...*
*Zarok, bi dengê çeka pêşîn weke ku ewê pîr bibin,*
*Hişk bi pêlîstokên xwe digrin!*
*Û bi şika ku ewê veguherin namlûyekê kulîlk,*
*Dixwazin bişkînin guldankên xwe!*

*Ahmet Erhan*

Xemgin Görücü

Weke kulîlka ku biharê û mirinê di hembêza xwe de hildigre tê qalkirin kulîlka sakura. Kêlîya pelên wê herî xweşik vedibin, di heman demê de kêlîya dikeve erdê ye. Ha Rozerîn, çîroka vê kulîlka em hîn bûn ku pir jê hez dikir parve dikir. Pir tişt xwendibû, pir tişt hîn bibû û weke kulîlkek silav dida biharê di 16 salîya xwe de bû Rozerîn. Lê ev, di heman demê de temenê ew ji jiyanê hatibû qutkirin bû.. Eyn weke kulîlkek sakura...

## "Em îro li vir in û me qet paşê xwe neda xeyalên xwe yên zaroktîyê"

Bi hevalên xwe re li kuçeyên Amedê  em bi gavên sivik ber bi çîroka Rozerîn ve dimeşin. Hundirê min bi hestan tije dibe.  Hizna wendakirina hevalek me, wendakirina Rozerînê, bi rûmet û wateya li pey çîroka wê çûnê re digihê hev ji bo em ên bi salan e ku wê bi bîr tînin. Em li Bexçeyên Hewselê yên ji Fîsqayayê dirêj dibin û diherin dinerin. Li keska dirêj dibe û dihere... Û belkî tam di wê kêlîyê de di dilê min re derbas bibû: "Em îro li vir in û me qet paşê xwe neda xeyalên xwe yên zaroktîyê."

## Tam jî wê rojê min Rozerîn nas kir...

Gava Rozerîn bi guleyek wê kiribû armanc çavên xwe li jiyanê girt di 16yên xwe de bû, ez jî di 15yên xwe de bûm. Li Stembolê di pola Lîse ya 2. de bûm. Di temenê xwe yê kurt ê 20 salan de heyamek din ku hemû hestên min bi vî awayî hev du dixwarin nayê bîra min. Mirin, mirin û mirin... Şer bi hemû tazîtîya xwe li holê ye, her mirin hê şîna wê nehatiye girtin cihê xwe ji mirinek dinê û şînek din a nayê girtin re dihêle. Zarok... dayik... alên spî yên ji bo segvan bera wan nedin dihatin vekirin... wesayîtên zirxî... cendek... ambûlansên nayên... Û li pişt van hemûyana girseyek bi bêçaretî, bi tirsonekî tenê li vana temaşe dikin û di nava wê girseyê de ez ek... Rozerîn tam jî di van deman de hatibû gulekirin. Min tam jî wê rojê Rozerîn nas kir...

Hê di 15yê xwe de, min Rozerîna ku dema dijîya min qet nas nedikir bi nûçeya "Li Sûrê zarokek din a 16  salî bû armanca guleyan" nas kir.  Çend zarokan weha nas kirine hevala xwe... Min ha weha nas kir. Ez zorê didim bîra xwe, diherim kêlîya ku min ev nûçe dîtibû. Tiştê tê bîra min tenê hêrs e... Hêrseke kûr li hember ên hevalên me ji jiyanê qut kirin û bûn sedem ku em bi wan re hew bi nûçeyên mirinê hev nas bikin... Ez ewqas di bin bandora vê pêvajoyê de dimînim ku li Bağcılara Stembolê  li lîseyekê hemû



hevalên min ên polê van rûdanan bi kêf û tîqetîqan didin bihîstin û ji ber ku bi nêrîna min a polîtîk û Kurdbûna min zanîbûn bi berdewamî qesta jêrzemînên Cizîrê dikirin û bi awayekî sîstematîk strana bi navê “Aşk Bodrum’da Yaşanıyor”[Eşq Li Bodrumê Tê Jiyîn]  vedikirin. Hilbet ev jî mirinek bû ji bo min… Hem jî mirinek her roj xwe dubare dikir.

## Heke tiştek divê em ji bîr nekin hebe ew jî ev e ku ewê di dîrokê de qet tu kes nekaribe ser fedîya vê heyamê, vê bîrê bi alan binuxumîne

Gava hûn ji dibistanê vedigerîyan malê dê, bav û xwişk û birayên bi nerînên mala şînê tîne bîra mirov li we dinerîn… lewra zarokên hatin kuştin, bajarên hatin xerakirin û jêrzemînên Cizîrê neçarîyên weha û wan neçarîyana jî trawmayên weha çêkirin ku… Ez dibêm qey tam di vê dera nivîsê de huşbûn hîn bêtir tiştan vedibêje lê tiştekî divê em ji bîr nekin hebe ew jî ev e ku ewê di dîrokê de qet tu kes nekaribe ser fedîya vê heyamê, vê bîrê bi alan binuxumîne.


Ha tam di vê heyamê de hewce bû ku ez xwe têxim dexlê tiştekî. Ne li dibistanê ne li malê ne li kuçê ne li medyaya civakî min karîbû bêhn bistenda.  Nizanim ji ber çi lê min xwe xistibû dexlê Rozerîna ku di temenê min de bû û hatibû kuştin. Min ji wê hêz distend. Her mirin wêrankerîyekê tîne.  Lê carinan mirinek dikare di radeyek pir cidî de bibe damezrêner jî. Rozerin jî ji bo min ha weha bû. Wêneyek wê hêla ruhê min a herî pir cemidî ye germ dikir û wêrekî dida hêla herî tirsonek, bêhêvîtî weke bi derzîyê bîrê bikole derdixist û davêt û hêvî bexş dikir li şûna wê.

## Piştî van tiştên qewimîn heke ilim ewê biharek bê, ev, çûna li pey armanc û çîroka hevalên me ye

Belkî jî sedema herî mezin a vê hestê ew bû ku min wê di temenê xwe de didît. Bi dirêjahîya 1,5 salî li ser ekrana telefona min bû ev wêne. Ev wêneyê wê, li cem min dibû sedema bîrek bi êş a her xwe nû dikir û di heman demê de sedema berxwedanê, hêvîyê. Kê dikarîbû bîr bibira ku min ê bi hevalên xwe Medzan û Yasemîn re piştî 5 salan bi Rozerîn re, bi hevala xwe ya hêz dida min bi rastî jî hev nas bikira... Ha belkî tam jî ji ber vê ez, Medzan û Yasemîn ji nû ve bi hevokekê bêhnê diden jiyana xwe: “Me paşê xwe neda hevalên xwe û xeyalên xwe yên zaroktîyê.” Ez dibêjim ku mirov ne pel e û ne demsala payîzê ye mirin. Lewra mirin, qet paş de nade tiştê stendîye. Biharê, kêlîya perenga pêşî dikeve, mirov weke pelên darekê can pê ve nayê... Lê piştî van tiştên qewimîn heke ilim ewê biharek bê, ev, çûna li pey armanc û çîroka hevalên me ye. Ez dizanim ku encax ev hestana dikarin mirinê bikujin û ava bikin jiyanê, wateyê...

## Bi berdewamîya axaftinê re çîroka em li pey diçin derdikeve holê

Roja ku ji bo em Rozerînê nas bikin çûbûn mala wan ji bo me hemûyan pir bi kelacanî bû. Gava em ber bi taxê ve dimeşin bavê Rozerînê Kekê Mistefa me pêşwazî dike. Rûyekî pir nas e Kekê Mistefa. Lewra dema li cendekê Rozerînê digerîya ew pêvajoya bi dirêjahîya pênc mehan min ji nêz ve ji çapemenîyê şopandibû. Em ber bi mala wan ve dimeşin. Di maweya wan pênc deqeyên em bi Kekê Mistefa re ber bi malê ve meşiyan min hest pê kir ku beşek mezin a çîroka Rozerînê li van kuçeyên dengê lîstik û tîqetîqên zarokan jê tê derbas bûye. Em ber bi qatê jor ê xanîyek serbixwe ve diherin. Em bi dayika Rozerînê Dayika Fexrîye re silavê didin hev. Dilşikestina bi me re bi germahîya Kekê Mistefa û Dayika Fexrîye re cihê xwe ji aramîyek watedar re dihêle. Bi berdewamîya axaftinê re çîroka em li pey diçin derdikeve holê. Dayika Fexrîye dihere oda kêlekê û kîsikek bi belgeyan, wêneyan, nivîsan tije tîne: hemû yên Rozerînê ne... Bi nivîsên xwe Rozerîn, bi sûretên kişandîye Rozerîn, bi serkeftinên jiyana xwe ya perwerdehîyê Rozerîn, Rozerîna wênesaz, Rozerîna helbestvan... Em bi hemûyan re hev nas dikin. Hilbet em jî pir kelecanî dibin. Û belkî jî di nav telaşa em xalek ji


1

Bence bu projedeki amacı en iyi şekilde anlamak, bunu gerçekten görüp yaşamaktı.
Bu amacı gerçekleştirmek heyecanıyla köyümüze yani yemyeşil bir doğa harikası olan herida diğer bir adıyla kırkpınara doğru yol aldık.
Yolculuğumuz arabaya binerek başlar. Arabayla gidiyoruz çünkü yolda karşılaşacağımız diğer harikaları kaçırmak istemeyiz.
Şehirden yavaş yavaş ayrılırken; o koca koca güzelim güneşin önüne geçip bizi güneşten mahrum eden binalar git gide azalıyor; ve önümüzdeki adeta bir gelinin bembeyaz duvağı gibi karlı dağların güzelliğini daha iyi göre biliyorduk.
Köye yaklaştığımız sıralarda yeşillikler artıyor kuş cıvıltıları ve şırıl şırıl akan şelalerin, derelerin sesleri kulağımızda müthiş bir müzik besfi yaratıyordu.
Böyle muhteş güzellikleri şehirde görülmesi kesinlikle imkansızdı. Bu sebeple bu muhteşem güzelliklere olan özlemimizi, dinleyerek ve o mis gibi çiçek bo kokularını koklayarak gideriyorduk.
... ilk kez gördüğüm bi

çîroka Rozerînê jî wenda nekin em amûra xwe ya dengtomarkirinê vedikin. Ji bo em wêneyê belgeyan bikşînin em destûrê dixwazin...

Bi dehan nivîsên Rozerînê hene, bi dehan wêneyên xêz kiriye, bi dehan sûretên kişandiye û pirtûkên xwendîye... Lê berî her tiştî divê em bi neqilkirina kelecana wê, enerjîya wê dest bi vegotina wê bikin... Ez jê piştrast im ku ya ku ewê kelecana Rozerînê herî baş neqil bike dîsa ew bi xwe ye. Di kaxizek ji nav kaxizên Dayika Fexrîye nîşanî me da de em tiştên Rozerînê dema bi bavê xwe Kekê Mistefa re diçûn gundê wan Herîdanê nivîsandine dibînin, weha dest bi vegotina rêwîtîyê kiriye:

*Bi ya min fahmkirina herî baş a armanca di vê projeyê de, vê bi rastî jî dîtin û jiyîn e. Bi kelecana em vê armancê pêk bînin em ber bi gundê me yanî herîda(n)a newazeyek xwezayê ye bi navê wê yê din kırkpınarê[çel kanî] ve derketin rê. Rêwîtîya me bi lê siwarbûna erebê dest pê dike. Em bi erebeyê diherin ji ber ku em naxwazin newazeyên din ên emê di rê de pêrgî wan bên ji dest me herin. Bi hêdî hêdî derketina ji bajêr re ew avahîyên gir û mezin ku dikevin ber tava delal û me ji tavê mehrûm dikin her ku dihere kêm dibûn û me dikarîbû xweşikahîya çîyayên weke xêlîya bûkekê bi berf çêtir bidîta. Gava em nêzîkî gund dibûn şînahî zêde dibin. Wîte wîta çûkan, xume xuma sûlavên diherikîn û dengê çeman di guhên me de kêfeke muzîkê ya mithîş çêdikir. Dîtina xweşikahîyên weha mithîş li bajaran teqez*


*bêderfet bû. Ji ber vê me bêrîkirina xwe ya van xweşikahîyên muhteşem, bi guhdarîkirinê û bi bêhnkirina bêhna wan kulîlkên weke miskê têr dikir.*

Rozerîn weke zarokekê ji hemû xweşikahî û nexweşikahîyan haydar e… ji çemê diherike… ji kulîlka bêhn dide… ji betona dikeve ber tavê û ya herî girîng ji tavê…

Hilbet em li pey çîrok û wateyek mezin bûn lê naskirina Rozerîna ku kesek evqas bihêz e li gel vana ji bo me pir efsûndar bû. Ez dikarim eşkere bibêjim ku ji bo kesek 16 salî zanîn û behreyek  mithîş a Rozerînê heye. Jixwe Kekê Mistefa û Dayika Fexrîye ewê ev şaşwazîya me bi hevokên saz dikirin kûr bikirana û me bi hevala me Rozerîn re bi van gotinan bidana naskirin.

## “Rozerîn pir çavvekirî bû”

Pêşî dayika wê dest pê kir: “Rozerîn pir çavvekirî bû. Ez ne ewqas çavvekirî me.” (Dayik kîsikek stûr ku tê de nivîs, wêne, belgeyên pêvajoya hiqûqî, sûret tê de hene tîne û hêdî hêdî dest pê dike nîşanî me dide.) “Ev nivîsana yê wê ne. Ev, çîroka wê nivîsandîye… Bavê wê ji înternetê jî nivîsên Rozerînê yên pir xweşik derxistin. Min karneyên wê yên dibistanê jî tim hilanîbûn. Ev raporên wê yên nexweşxanê ne, Rozerîn nexweşa dil bû. Ji zaroktîya wê ve xerabûna rîtmê pê re hebû. Nexweşa dil a kronîk bû. Bavê wê jê re makîneya wêneyan kirî.  Me niherî ku pir bimeraq e, me wê şand cem Sertaç Xoce(mamosteyê wanegeha sûretan).”



Wêneyê Pêşî Yê Rozerîn Xêz Kiriye




Çûkê Hudhud Ê Rozerîn Xêz Kiriye

## “Li dibistana seretayî hînî xwendinê bû”

““Li dibistana seretî dest bi xêzkirina wêneyan jî kir”

“Li dibistana seretî dest bi xêzkirina wêneyan jî kir. Cara pêşî ev desta xêz kir, piştî wê çûka hudhudê xêz kir. Min çi bigota ew çêdikir, şecere jî xêz kiribû. Hespek xêz kiribû, dibistanê ew mezin kiribû û xistibû çarçowê. Di ketina dibistanê de hê tê dîtin, li ser dîwarên dibistanê ker xêz kiriye, werdek xêz kiriye; wê xêz kiriye...” (Dayik digrî.)

## “Ji xwendinê pir pir hez dikir, pir dixwend”

“Dibistana seretî qedand, dest bi pola yekem a dibistana navîn kir. Min bir min got ku qîza min em ji te re pantorekî tiştinan bikirin. Ji min re got ku ji dêvla vê pirtûkan bikire. Me ji pirtûkfiroşê li hêla Xana Hesenpaşa pirtûk kirîbû. Ji xwendinê pir pir hez dikir, pir dixwend, Destana Gilgamêş heye, giş gişê wê xwend. Helbestek wê jî hebû. Di înternetê de vîdyoyek tê de helbestê dixwîne jî heye.” (Rozerîn li çalakîyekê helbesta Nâzım Hikmet a “Yaşamaya Dair”[*Di Derbarê Jiyînê De*] dixwîne.)

“Ha weha bû, nivîsên wê nivîsandiye hene. Li ser keçeke biçûk çîrok nivîsandiye: Dayika keçikê bûye qansêr, bavê wê miriye. Keçik hem li dayika xwe dinere hem dixebite. Hem li dibistanê dixwîne, li qatê jêrzemîna avahîyekê rûdinê. Çîrokek weha nivîsandibû.”

## “A rast li ser xwe nivîsandiye”

“Çîrokek wê ya din hebû. Keçek biçûk hebû, a rast li ser xwe nivîsandiye. Gava li taxekê dilîstin perê keçikê tune bû, kevnik dixistin hundirê kîsik û dikirin gog û pê dilîstin. Keçka biçûk ji dayika xwe tirş û nan xwestiye. Dayika wê gotiye were, min ji te re xwarin amade kiriye. Rozerîn piştî çîrok xwend got ku dayê ev keçka biçûk kî ye? Min got ewê kî be Rozerîn e. Gotibû tu ji ku zanî û şaş mabû. Min got ezê ji ku zanibim, te xwe vegotiye.” (Dayik dikene.)

## “Dayê, ez dixwazim bilind bibim”



Sûretên Ji Objektîfa Rozerînê

“Digot ku dayê, ez dixwazim bilind bibim. Min digot qîza min: hêdî hêdî; gav bi gav... bi carekê re tu nikarî bilind bibî. Carinan dihat, digot min ji vê dersê kêm stendîye. Min digot qîza min vê heftê bixebite; dixebitî, dihat û digot ‘Dayê min bilind stend’.”

## “Ez her tiştî ji wê hîn bûm”

“Ez her tiştî ji wê hîn bûm. Min bi tiştekî nizanîbû. Ew mezin bû ez her tiştî ji wê hîn bûm. Binere evana giş xêzkirinên wê ne. Dizanîbû her tiştî bike. Ji zarokan re kuafortî jî dikir. Porê Gulşahê(xwişka Rozerînê) çêdikir. Weke kuaforan jî bû cure cure por çêdikir. Matematîka kesên di pola wê de bûn kêm bû. Wan tanî, li vir ders dida, ew keçka niha kete zanîngehê. Ji van zarokan re, ji Gulşah, Baran, Murat re, ji hemû kûzenên xwe re digot werin, ders dida. Kaxiz, program amade dikirin. Digot ku di vê saetê de emê vê, di wê saetê de emê wê bikin.

Me xercî dida wê. Wê ew pere xerc nedikir, ji bo peran nede peya diçû dibistanê û dihat. Serê mehê me dinerî ku ew pera daye ser hev dîsa dide me û piştgirî dida me. Te çi bidayê di bêrîka wê de dima."

Her ku Dayika Fexrîye neqil dike ez ji mezinahîya çîroka veşartî maye ditirsim. Em jî weke Rozerîn zarokên bi hezar û du zehmetîyan ji taxên xwe yên xizan radibûn û diçûn dibistanên xwe bûn. Lê Rozerîn her tim dil û aqilek hemû zehmetîyan derbas dike hilgirtiye. Di nav wate û zanînê de cî girtiye. Bi sûretên xwe, xêzên xwe, nivîsên xwe, çîrokên xwe û serkeftinên xwe re tevahîyek e Rozerîn… Hevala me ye… Her em wê nas dikin ez hest pê dikim ku armancên me yên li ser milên me qat bi qat zêde dibin. Ji ber ku jiyandina Rozerînê tê wateya jiyandina keda wê daye jî. Her ku em hev nas dikin em bêtir hîs dikin ku eva hewceyî bi vîn û wateyek çiqas mezin heye. Lê dîsa jî enerjîya dide me wî barî sivik dike. Em tenê bi vê rewşê nehesiyabûn, hemû derdora wê malbata wê mamosteyên wê û hevalên wê jî di hişmendîya vê de bûn. Em ji Kekê Mistefa û Dayika Fexrîye guhdarîya vê hay jê hebûna derdorê dikin.

## "Em nekarin bi Rozerînê, wê bibe cem kesên pir zana"

Pêşî dayika wê dest bi vegotinê dike: "Di pola dawî ya dibistana navîn de bû mamosteyên wê bang li me kirin gotin ku em nikarin bi Rozerînê, wê bibe cem kesên pir zana, yan na ewê dîn bibe. Min jî pirsa ez bibim cem kê kir. Mamosteyê wê gotibû bibe cem doktor, parêzer û hwd. Wê heyamê min bir cem merva me buroya Parêzer Reyhan Baydemir.  Heta êvarê li buroyê ma. Piştî wê Reyhan got ku ewê Rozerîn bibe parêzer. Ewê li cem min stajê bike. Hilbet bi saetên dirêj pev re axivîn. Bêhna Rozerîn pir fireh bû. Hate malê dîsa acizîya wê dest pê kir. Vê carê min bir fakulteya tibê cem doktorekî. Doktor gihaşt min got ku ez li cem wê aciz mam, ew ji min zanatir e! Ewqas zana bû."

## "Ezê nebim parêzer, ezê bibim psîkolog"

"Tim digot ku dayê 'Divê ez bigihêm serkeftinekê. Ez bi milet re biaxivim, ji wan re vebêjim, alî wan bikim, alî xizanan bikim.' Min jî digot ku qîza min hêdî hêdî… Nebe lezgîn, tu niha bixwaze dîrekt bibe doktor tê bibe tu nikare bibe, wê çaxê hêdî hêdî… Digot ku "Dayê ez pir lezgîn im…" Pêşî dixwest bibe parêzer, paşê hat got ku dayê ez bibim parêzer yekî neheq were



Sûretên Ji Objektîfa Rozerînê

peran bide, ez dernexim derve perê wî bixwim guneh e, ez wî derxim derve guneh e... ez nikarim vê bikim. Got 'Ezê nebim parêzer, ezê bibim psîkolog'."

## "Bi me re heval bû"

Kekê Mistefa jî bîranînekê neqil dike: "Bi me re heval bû. Ez dikarim bêjim min zaroktîya wê nedît. Ji çaxa dibistana seretî bi vir ve weha bû. Rojekê di nûçeyê de nûçeyên Fîlîstînê derket. Min nahlet li Îsraîlê anî. Piştî nûçe qedîya telewîzyon girt, got bavo were hêla din emê tiştekî biaxivin, em li cem dayika min neaxivin. Paşê li hêla din, te çima nahlet lê anî ma tu rabirdûya Fîlîstînê zanî... Min jî bi kurtî vegot, min got 'dest danîne ser erdê wan şer dikin'; got 'Bavo hûn nizanin, hûn nahletê li wan tînin ew hê sûcê kalikên xwe dikşînin, divê kalikên xwe bidin lêpirsîn yên ewê lanet li wan bê kirin ew bi xwe ne.' Hê li pola 6. bû zarokek di wî temenî de vana lêbikole... Min nekarîbû ku ji wê re bigota zarok jî!"


## "Bi vî awayî ew Çemê Dîcle yê muhteşem ji şopa pêxemberekî tê afirandin"

Dema Rozerîn diçû gundê Herîdanê navçeya Pîranê û li Rojhilata Navîn du çemên watedar ên Mezopotamyayê jî derketine hember wê. Ferat û Dîcle... Li ser vana jî nivîsandîye Rozerîn... ez cara pêşî ji Rozerînê hîn bûm çîrokên Dîcle û Feratê. Belkî ev av tiştên dixwazin, bîrên xwe nekarin neqlî me bikin lê Rozerîn çîroka van her du çeman ji pênûsa xwe neqil kiriye:

*Navçeya Pîranê xwedîyê du çemên li Tirkîyê yên herî mezin û herî newaze ye. Ev çemên Dîcle û Ferat in. Li ser van çemana gelek çîrok û efsane hene. Ez dixwazim ji yên herî kinê wan vebêjim. Pêşî em ji çemê Feratê dest pê bikin. Çîrok weha dest pê dike. Wextekê mêrek hebû. Navê wî jî weke hûnê fêhm bikin Ferat e. Lawekî wî yê heq ku pir lê ji canê xwe jî bêtir jê hez dikir hebû. Rojekê gava lawê wî yê heq weke milyaketan di xewa şêrîn de bû; bavê wî yanî Ferat dikeve hundir. Ji ber ku tarî bû mixabin Ferat gotiye qey lawê wî diz e û wî kuştiye. Bavê ku ji ber vê rastîya tahl debar nekiriye xwe bera ber ava har a Çemê Ferat ê niha daye. Ha ev çîrok ji alî gelek kesan ve tê qal kirin heta ji bo vê çîrokê stran jî tê nivîsandin. Navê Ferat li vî çemê dawî li êşa Ferat anîye kirine û êşa wî nedane ji bîr kirin.*


*Çîroka me gavek berê vegot kurt lê pir tahl bû. Me çîroka Feratê dît. Niha jî em li çîroka Dîclê binerin. Li gor tê gotin Xwedayê mezin ê afirîner; emir daye Danyal pêxember. Dibê ku “Bi gopalê di destê xwe de ji devê şikeftê dest pê bike û çixêzekê xêz bike, ewê av li dû te bê. Lê heke tu gihaşt milk û malê sêwîyan, jinbîyan, xizanan, hejaran û weqfan rêgeha xwe biguhere da ku av ziyanê nede wan.” Danyal pêxember li gor vî emrê Xwedê tev digere û rêgeha Çemê Dîcle ji xala jê derdikeve dest pê dike bi gopalê xwe xêz dike. Her ku ew xêz dike av li dû wî tê. Bi vî awayî ew Çemê Dîcle yê muhteşem li pey şopa pêxemberekî tê afirandin. Tam jî heta Kendava Besrayê. Çiqas muhteşem e ne wa?”*

Rozerîn hê berdewam dike pir tiştan hînî min û hevalên xwe dike. Çîroka Dîcle û Feratê jî niha wê hînî min kir. Lê ya herî pir bala min kişand çîroka Ferat, êşa wî bû. Ji ber ku bi me hemûyan bêtir nas tê ev. Li hember ku Rozerîn jî di 16yên xwe de bû êşeke dişibe veya ya cidî jiyaye. Di pêvajoya



Bu yer hakkında bilgi edindiğimiz çok iyi olmuştu. Gezimiz daha eğlenceli hale gelmişti. Şimdide dicle ilçesiyle ilgili bilgileri paylaşmak istiyorum. Çünkü öğrendiğimde ben çok şaşırmıştım. Sizide bu yer hakkında araştırma yapmanızı tavsiye ederim. İnanın pişman kalmayacaksınız.
Dicle ilçesi türkiyedeki en büyük ve en harika 2 nehre sahip. Bunlar Dicle ile Fırat nehri. Bu nehirlerle ilgili birçok hikaye ve efsane vardır. En kısabından anlatmak isterim. İlk önce fırat nehrinden başlayalım. Hikaye şöyle başlar.
Bir zamanlar bir adam vardır. Adıda anlayacağınız gibi fırattır. Fıratın çok ama canından bile çok sevdiği bir öz oğlu vardır. Bir gün öz oğlu mışıl mışıl melek gibi uyurken; Babası yani fırat geri girer. Karanlık olduğundan fırat oğlunu maalesef hırsız sanıp öldürür. Bu acı gerçeğe dayanamayan baba kendini şimdiki fırat nehrinin azgın sularına bırakmıştır. İşte bu hikaye dilden dile dolaşır hatta bu hikaye için türkü bile yazılır.
Fıratın acısına son veren bu nehre fıratın adını verip onun acısını unutturmamışlardır.

Ji Pênûsa Rozerînê Dîcle Û Ferat



3
Az önce anlattığımız hikaye kısa ama çok acıydı. Fıratın hikayesini gördük şimdide Dicle'nin hikayesine bakalım.
Söylenene göre büyük yaratan Allah; Danyal peygambere emir vermiş. Der ki:
-Elindeki asa ile suyun çıktığı mağaranın ağzından itibaren başlayarak bir çizgi çiz su arkandan gelir. Ancak yetimlerin dul kadınların yetiştirgin zaman fakirlerin yoksulların ve rakiplerin malına ve mülküne güzergahını değiştirki su onlara zarar vermesin."
Danyal peygamber Allahın bu emrine riayet ederek, Dicle Nehri'nin güzergahını çıktığı noktadan itibaren asası ile çizmeye başlar. O bir çizdikçe su arkasından gelir. Böylece o muhteşem Dicle Nehri peygamberin izinden yaratılır. Ta ki Basra körfezine kadar. Ne kadar muhteşem değil mi.
... bu dicle ilçesinin ... Hz. ...

Ji Pênûsa Rozerînê Dîcle Û Ferat

pevçûnê de qetilkirina hevala wê Rûken li ser wê tesîrên giran hiştine, Kekê Mistefa û Dayika Fexrîye berteka Rozerîn a li hember vê mirinê weha vedigotin:

## "Dayê Rûken tê xewna min; ji min re dibêje were Rûken min bernade dayê"

"Dayika wê dibêje "Rûken hebû hevala wê, di şer de mir. Digrîya, digot dayê: 'Li dinyê hevalek min a tenê ya mezin hebû.' Bi Rozerîn re zendek jî hûnabûn. Digot 'Dayê wê ji min re çêkiriye'. Piştî mirinê Rozerîn, li dayika xwe, birayê xwe, li xwişka xwe, li bavê xwe li kesî guhdarî nedikir, kes nas nedikir. Digot 'Dayê Rûken tê xewna min; ji min re dibêje were Rûken min bernade dayê'. Min hebekî wê maçî kir, di hembêza min de xwe dirêj kir. Min li ser wê hebekî xwend, sahil bû,".

Li gor bavê wê jî ev mirina, Rozerîn qedandîye: "Ya Rozerîn qedand ev mirin bû. Gava hevalek wê ya ewqas nêzîk jiyana xwe ji dest da pir pir di bin bandorê de ma. Ev mirina wê ji binî ve qedandibû. Dev ji her tiştî berda."

Kuştina Rûkenê Rozerîn, kuştina Rozerîn jî min pir ji kûr ve hejandibû. Li Rojhilatanavîn weke Kurd jiyîna bi rûmet tim berdêlên wê yên weha hene. Lê li ser van erdana yên bi sedan salan e can didin tenê di nava vê mexdûrîyetê de stendina dest divê ku ne rast be.  Ew di heman demê de mirovên ji bo hebûna xwe û rûmeta xwe di ber xwe de dane ne... Heke berxwedan tunebûya, ewê ev zilma jî tunebûya. Heke erdên me ji sed salî zêdetir e warê mirinan e ev di heman demê de ji ber mirovên canê xwe ji rûmeta xwe re kirine sîper û ji ber ku vir warê berxwedanê ye.  Bi awayê gotina Kekê Mistefa, Rozerîn ne şervanek bû, sivîl bû. Lê pêvajoya rû da wan mecbûrî vê rewşê hişt.

## “Ê Rozerîn jî di wê heyamê de mirina hevalek wê pir zêde bandor li wê kir”

Bavê wê vedibêje: “Di heyama wê pêvajoyê dest pê kir de bi mirovan re hebekî tirs hebû. Dema dewlet bi wî awayî bi tundîyê hat gel bi rastî jî ne li hêvîya tundîyek weha bû. Hilbet heta wê pêvajoyê gel xwepêşandanên xwe yên civakî, çalakîyên xwe bi rihetî dikir. Ji biçûkan heta mezinan hemû kesan xwe bi rihetî îfade dikir. Lê di wê pêvajoyê de di encama dewletê bi taybetî weke rayeyek eşkere rayeya “tu dikarî berdê” da ewlehîyê her tişt guherî. Di 5ê Pûşberê de mitîng çêbû li vir û li wê mitîngê û piştî wê pir mirov mirin. Tavilê piştî wê, dema şerên bajaran dest pê kir di kombûnek biçûk de gel êdî ne bi gaza îsotê û ava bitazîq û hwd. rasterast bi çekan dihat armanc stendin û bi taybetî ciwan dihatin armanc stendin. Pêşî hemû kes di nav de bûn lê paşê hilbet gel xwe paş ve kişand, pêşî zarokên xwe taliyê xwe paş ve kişandin. Lê hin mirovan jî di vê pêvajoyê de berpirsîyarî hîs kirin. Herçî ku ne amadebûna jî xwe mecbûr hîs kirin. Ji ber ku gava ew tundî dîtin xwe mecbûr hîs kirin. Rozerîn jî yek ji van kesan bû. Qet bi tu awayî ne şervanek bû. Tenê pirtûkên xwe yên xwendibû, tiştên xwe yên lêkolabû, tiştên xwe yên ji mirovên bi wan re dipeyivî bihîstibûn… hişmendîyek wê ya weha hebû. Lê wê heyamê jin be ciwan be zarok be, pîr be nebe ji ber ku berîdana tundîyê pir giran bû ciwanan û zarokan qet nekarîbûn qebûl bikirana, mahdê wan qebûl nedikir. Lê yên ev tundî pêk tanîn ev tundîya dixistin çapemenîyê jî. Li ser meselê, tiştên bi Hecî Loqman Birlik hatin kirin û hwd. ê Rozerîn jî di wê heyamê de mirina hevalek wê pir zêde bandor li wê kir.”

Biryardana me ya ji bo hînbûna çîrokên hevalên me ne rasthatin bû. Ev biryarek cidî bû. Ji ber ku vê pirsê me dihejand: “Em bihatana kuştin me yê bixwesta herî pir kîjan hêla me bê zanîn, me yê bixwesta herî pir çi neqlî yên piştî xwe bikira.” Ev erdên ku çemên weke Dîcle û Ferat watedar, çiyayên xweşik û evîn, destan û dengbêj lê hene di heman demê de ji sed salî zêdetir e bi bîra mirin û qetlîam û berxwedanan tije dibe û di ser re dihere. Û belkî jî tiştê rasthatin e tenê nemirina me ye. Ji ber wê em di heman demê de yên weke “nekarîbûn bihatana kuştin” em mecbûr in bibin bîra yên hatin kuştin, armanca wan hilgirin û hesabê wan jî bipirsin. Derbarê hêvîyê de pir tiştên erênî û neyînî hebin jî em biryardar in ku hêvîyê biçînin. Lê encax hêvîyek ku wate û ked wê bihûne dikare bibe hêvîyek rast. Encax

em weha dikarin hemû mirovên xwe yên ji jiyanê hatin qut kirin bidin jiyandin.

Rozerîn ewê bixwesta herî pir çi tiştên aîdî wê bêne zanîn, em hewl didin vê hîn bibin. Em pirsa ji çi tiştan hez dikir, kêfa wê ji çi tiştan re dihat dikin. Lewra hevalên me, zarokên gelê me ne tenê nûçeyek ji rêzê ne. Ew bi rengên jê hezdikin, bi xwarin û mekanan, bi lîstikên xwe û hevalên xwe re her yek çîrokek gewre ne...

## "Dayê ji min re biçûktîya min vebêje"

Dayika wê neqil dike: "Ji kûzenên xwe pir hez dikir. Pir alîkarîya wan dikir, ders dida wan. Ji hevalên xwe û malbata xwe pir hez dikir. Li malê ji alîkirina min pir hez dikir. Ji ber ku nexweşîya wê ya kronîk hebû di mijara kar de min qêmîşî wê nedikir. Wê jî piranî ji muhabeta bi min re hez dikir. Ji min re tim digot 'Dayê ji min re biçûktîya min vebêje'. Li cem min atlêtekî wê yê mor hebû ji biçûktîya wê, min jê re tanî û ew nîşan didayê, her tiştê wê...

Bi wêneyê re mijûl dibû, jiyana wê ya dibistanê pir serkeftî bû. Bi fotokêşîyê re têkildar bû. Ji dîrokê pir hez dikir. Ji lêkolîna rabirdûyê... Binere têkeve rûpelê Sertaç, li Amedê çiqas cihên dîrokî hebin sûretê wan kişandiye. Helbestên wê nivîsandîye hene. Çîrok jî nivîsandine. Ji guhdarkirina muzîkên biyanî jî pir hez dikir.

## Dara sakura

Gava em dipirsin bê darek an kulîlkek jê hez dikir hebû Kekê Mistefa dibersivîne: "Darek bi navê dara sakura heye, çîroka wê hebû. Ji wê pir hez dikir. Dar mezin dibe lê çawa ku şîn dibe dikeve." Dayika Fexrîye jî lê zêde dike: "Ji bilî wê dara jiyanê ya avatar ku nivîskarekî  ew nivîsandibû hebû. Çîroka vê darê jî bandor li wê kiriye. Wê xêz jî kiriye..."

Gava Kekê Mistefa û Dayika Fexrîye dibêjin ji kulîlka sakura(Kulîlka dara prunus) pir hez dike jî ez pir şaş dimînim. Ez cara pêşî vê darê dibihîzim: Dema ez çûbûm malê min bi telaşek mezin li vê kulîlkê nerîbû û tiştekî pir zelal hebû... Rozerîn çîroka kulîlka pir jê hez dikir par ve kiribû. Weha nivîsandibû di înternetê de:

"Sakura di çanda Japonan de kulîlkek xwedî girîngîyek mezin e. Kulîlkên wê hêdî hêdî vedibin lê zû diweşin. Hem destpêka jiyanê yanî mizgînîya biharê

dide, hem jî sembola dawîya xwe ya jê nayê revîn e. Sakura navê kulîlkên dara prunusa ku di hembêza xwe de mirinê û biharê pev re dide jiyandin e."

Ha Rozerîn jî weha bû. 16 salek tije tije derbas kiribû. Lê di heyama herî tije ya jiyana xwe de ji jiyanê hate qut kirin. Min weha hîs kir ku belkî divê em Rozerîn bi vê kulîlka herî pir jê hez dikir bistînin dest... Serenavê nivîsa min jî bû weha. Ferqa Rozerîn û hevalên me yên din ên ku hatin kuştin ji vê darê ev bû ku: Wan di hembêza xwe de ne mirin, tenê bihar û jiyan hildigirtin. Li van erdana yên mirin hildigirtin û verdişîyan jî yên zarokên me, hevalên me ji jiyanê qut dikirin bûn. _

## "Me li dibistanê gul danî ser rûneştoka wê, salekê kesek li wir rûnenişt"

Kekê Mistefa, ji bo Rozerînê dibêje "Ji gulan jî pir hez dikir". Heta piştî bi salan hevalên Rozerîn hatine û veya jî gotine ji Dayika Fexrîye re, "Me li dibistanê gul danî ser rûneştoka wê, salekê kesek li wir rûnenişt."

Em berdewam dikin bi tiştên hem dayika wê hem jî bavê wê neqil dikin li ser Rozerînê dipeyivin û wê tînin bîra xwe.

## "Dema pevçûnên kuçeyan nû dest pê kirin ji tirsan dernediket kuçeyê"

Bavê wê: "Ji hin muzîkjenên navdar pir hez dikir, bi lênûska xwe ve zeliqandîye. Ji İngilîzî jî pir hez dikir. Pir tirsonek bû lê ewqasî jî azwer bû. Dema pevçûnên kuçeyan nû dest pê kirin ji tirsan dernediket kuçeyê. Rozerîn li gor her temenî dikarîbû xwe amade bikira. Di nava zarokan de tê bigota ku eyn weke zarokekê ye. Bi kesê heftê salî re jî tê bigota ku di heman temenî de ye."

## "Rengê herî pir jê hez dikir mor bû"

Dayika Fexrîye jî vana lê zêde dike: "Ji goştê biraştî, ji goştê sor pir hez dikir. Rengê herî pir jê hez dikir mor bû, binere li wir kincê mor xêz kiriye, li wê derê jî porekî mor heye."



Xêzên Mor Ên Dayika Wê Qala Wan Kiribû



Xêzên Mor Ên Dayika Wê Qala Wan Kiribû

## “Ji civakê hez dikir”

Kekê Mistefa bersivê dide pirsa me ya lîstikek wê jê hez dikir hebû: “Lîstikek hebû kaxizên lîstikê hebûn di destên wan de heta êvarê dilîstin. Lîstikek jêhatîbûna laşî jî hewce dikir bû. Paçek bû, li ser perçeyek paç tiştên rengo rengo hebûn. Destê xwe dîne ser spî nigê xwe dîne ser zer… Di pêşbirkekê de bi ser ketibû. Ew lîstika jî ji wir kar kiribû.” (Qesta lîstika twîstirê dike.) “Min wê lîstika hilanîbû, hê li cem min e. Ji lîstina kişikê jî pir hez dikir.” Ê Dayika Fexrîye jî bi bişirîn ev têne bîra wê: “Govendek em li herêmê dilîzin heye, ji lîstina wê jî pir zêde hez dikir.” (Bi ken muzîka govendê di ber xwe de distrê). “Muzîkek wê govendê jî hebû. Min jixwe her beşa wê nedizanîbû. Tenê *wey lo lo lê, wey lo lo lê*… Ji min re digot tu bistrê ez bilîzim. Min hemû nedizanîbû, dîsa jî min distra wê jî dilîst.” Gava em dixwazin mekana, werzîşa, heywana wê jê hez dikir biaxivin vana têne bîra Kekê Mistefa: “Weke beşa werzîşê bala wê pir li ser atletîzmê bû. Mekana kêfa wê pir ji çûna wê re dihat devera çolterî bû.” Dayika Fexrîye jî vana lê zêde dike: “Pir ji werzîşê hez dikir. Carinan xwe bi darê digirt û mekîk dikşand. Hilbet nexweşîya dil pê re hebû. Ji ber wê dibû pirsgirêk, me nedihişt. Ji çûna mala hevalên xwe û ders dana wan pir hez dikir. Ji Xana Hesenpaşa pir

hez dikir. Ji civakê hez dikir, hertim dixwest di civakê de tiştekî biafirîne, tiştekî hînî zarakan bike, tiştekî bihêle. Acizîyek yekî/ê heba teqez dixwest çareser bike. Ji kûçik û pisîkan pir hez dikir. Pisîkek wê jî hebû: Navê wê Terabithia bû." Gava dayik vana neqil dike Xwişka Rozerînê Gulşah a ku weke Rozerîn wênesaz e, got ku pisîka Rozerîn navê xwe ji filîmekî stendîye: "Rozerîn navê pisîka xwe ji filîmê *Pira Terabithia* stendîye."

## "Kenekî wê yê pir xweşik hebû… henekvan bû, pir henekvan bû"

Hilbet hêlek balkêş a her mirovî heye. Derbarê hevalên xwe de ji nav pirsên me herî pir meraq dikir yek jê jî ev bû. Dayika Fexrîye dibêje "Kenekî wê yê xweşik hebû" û kenê Rozerîn ê li gelek sûretan xuya ye tê bîra wê. Kekê Mistefa jî, hêla Rozerîn a henekvan tê bîra wî: "Henekvan bû, pir henekvan bû lê dema cidî dibû jî pir cuda bû. Ew cidîyeta te çi bikira te qet nedikarîbû xera bikira. Heke li ser hizrekê diponijî serê wê li tiştekî aliqîbûya, te henekek bikira bi awayekî cuda tev digerîya. Cidîyeta wê qet xera nedibû."

## "Makîneya wêneyan ez li ku bibînim tê bîra min…"

Mekan û obje… Belkî jî tiştên bîrekê herî pir zindî dihêlin… Di vê xebata derbarê zarokên hatine kuştin de qalkirina mekan û objeya tînebîrê[*anımsatan*] li gelek cihan bû pirseke me nekarîbû bipirsîya. Weke mînak me nedikarîbû ev pirsa ji malbata Cemîleya li Cizîrê 12 salî hate qetilkirin bikira. Ji ber ku obje û mekan carinan dibe sedema bibîrhatinek[*anımsama*] mirov bibe heta kêlîya kuştinê û awayên kuştinê bîne bîra mirov û bi vî awayî dikare li ser mexdûran bandora êşkenceyê pêk bîne. Me ev pirsa kêm caran karîbû raste rast bipirsîya û ji nav cihên me dikarîbû bipirsîya yek jê jî mala Rozerîn bû. Dayika Fexrîye di derbarê mekan û obje tînin bîra wê de vana gotin: "Qada Daxqapi, tîne bîra min.  Em pir rûniştin li wir, pir rûniştin… Ez kenê wê yê li Daxqapiyê ji bîr nakim.  Ez şalê wê yê gewr û pêlava wê ya werzîşê ya spî ji bîr nakim. Makîneya wêneyan li ku bibînim tê bîra min… Bavê wê di demek nêzîk de makîneya wê diyarîyî zarokek keç a di temenê Rozerîn de ye kir…" Kekê Mistefa jî lê zêde dike û dibêje "Mekana pir tîne bîra min dibistana dawî çûyê Cumhuriyet Anadolu Lisesi[*Lîseya Anadoluyê ya Cûmhûrîyetê*] ye: dema ez wir dibînim, çi cara ez diherim wê semtê dilê min şikestî derbas dibe".

Her ku em li Kekê Mistefa û Dayika Fexrîye guhdarî dikin em pê dihesin ku Rozerîn xwedîyê dê û bavek çiqas xweşik e jî. Dema çîroka dirêj a zaroka xwe vedibêjin ku ji muzîka lê guhdar dikir,digihaşt heta mekanên jê hez dikir, kulîlkan, daran hezkirina wan xwe bi hertiştê xwe dide hîskirin. Ewqas ku ez ji malbatê re vê hevoka ecêb saz dikim: Ji bo ku hûn evqas xweşik nêzîkî Rozerînê bi xwe û bîra xwe ya di derbarê wê de bûn li ser navê hevala me Rozerîn em spasîya we dikin.

## “Tu carî neheqî qebûl nedikir... Îja ku mêrek li jinekê neheqîyê bike qet”

Yek ji xalên herî girîn di derbarê Rozerînê de ku bala min dikşîne jî dibe hestyarîya wê ya di mijara azadîya jinê de. Hê ku em nû ketibûn malê yek ji nivîsên Dayika Fexrîye li ber me raxist jî nivîsa ji rûpelekê pêk dihat a bi navê “Bilginin Cinsiyetçiliği”[*Zayendparêzîya Zanînê*] ku ji alî Rozerîn ve hatiye nivîsandin bû. Bi dirêjîya axaftinê jî me carê ev anî bîra xwe û me ew di bîra xwe de parast.

Bavê wê hestyarîya qîza xwe ya di derbarê vê mijarê de weha neqil kir: “Rojekê gotibû ‘Bavo tê ji min re vê pirtûkê bikirî?’, min jî got ku em pev re herin bikirin. Cara pêşî min dît ji bo pirtûkekê evqas kêfa wê dihat... Pirtûk bi navê *Jîneolojî* bû. (Kovara Jinan a Zanistî û Teorîyê) Min zanîbû sîyasî bû. Gelek tiştên dişibiyan wê dixwend lê çima ji bo wê pirtûkê pir bêtir kêfa wê hatibû min fêhm nekir. Di heftê de teqez pirtûkek du pirtûk xelas dikirin. Hemû hevalên xwe yên li dibistanê jî wê ber bi xwendinê ve dikşandin. Ez ne ku ji bo zaroka min e pesnê wê didim. Lê pir cuda bû. Dema ez pê re rûdiniştim û dipeyivîm te digot qey ne zarokek lê weke di temenê te de ye. Axaftina wê, xîtaba wê, nerînên wê yên li yê li hember xwe...”

Dayika wê axaftinê distîne: “Rozerîn bi hemû heqên xwe zanîbû. Tu carî neheqî qebûl nedikir. Ji cerga ku mezin bû pê ve bavê wê ji tirsa wê nekarîbû ji min re bigota kirt. Di tiştekî biçûk de jî dengek derketa bang dikir: Bavoooo! Bavooo! Bav digot temam.” (Dibişire.)

## “Digot her tişt di dil û mejiyê mirov de ye”


Rozerîn bi her tiştê xwe mirovek xwedîyê têgihiştineke mezin e. Bi gotina bavê wê “Qet ne yek alî bû bi ruhê lêkolînê nêzîkî xebatê dibû. Piranî

dixwend.” Kekê Mistefa neqil dike ku Rozerîn heyamekê berê xwe daye pirtûkên dînî jî, raveya Tirkî ya Încîl, Tewrat, Quran, Zebûrê xwendîye. “Di heyama xwe ya dawî de berê xwe dabû mealên, îlmîhalên filan ê pirtûkên pîroz jî. Încîl, Tewrat, Quran, Zebûr; raveyên vana yên Tirkî xwendibû. Di nivîsên wê de jî hûn bala xwe bidinê dibêje ew pir jî ne girîng in, însan girîng in. Piştî van xwendinên xwe digot her tişt di dil û mejiyê mirov de ye...” Rozerîn piştî xwendina ewqas metnên pîroz tiştekî dikare bibe ayeta miravatîyê gotiye: Her tişt di dil û mejiyê mirov de ye...

## “Ne şîna ezmanê şipşîn ne rengê qehweyî yê axa bîna miskê jê tê tenê kesk”

Gava Rozerîn bi bavê xwe re gihaştîye Herîdanê ji xwezaya wê, ji şînahîya wê pir bandor girtiye. Lê di heman demê de di nivîsa xwe de pirsyarîya dîroka gund, Ermenîyên ku 100 sal berê niştecihên vir bûn çima ne li gund in jî kiriye:

> *Me got rê filan û em gihaştin Herîdanê. Herîdan li cihekî ji tiştê ez difikirîm jî wêdetir bû. Piştî min ew xweşikahîya, ew şînahîya dît ez fikirîm ku bajar jî çi ye. Bifikirin ji keskê pêvtir tiştek tune ye. Ne şîna ezmanê şipşîn ne rengê qehweyî yê axa bîna miskê jê tê tenê kesk.*
>
> Qama daran ji qama avahîyên li bajêr jî dirêjtir bû. Werhasil em hebekî ber bi jor ve çûn. Û paşê em çi bibînin apo begekî li dor temenê 70-75an li nava zevî dixebite. Yanî ya rast kesên di vî temenî de an mirî ne an jî li nav nivînên xwe li benda mirinê ne. Şaşker bû lê rast bû. Werhasil em hatin cem apo beg û me dest bi axaftinê kir. Em pir û pir axivîn derbarê vî cihî de em bûn xwedîyê gelek agahîyan. Heta ya herî girîng berê li vir Ermenî jî jiyabûn.  Apo beg bermahîyên Ermenîyan ên li vir nîşanî me da. Ji gorên wan bigrin heta alavên wan. Heta girê em lê sohbet dikin girê Ermenîyan e. Li vir li gor tê gotin dêrên Ermenîyan hene.  Heta li vir hilberîna zêr jî tê kirin. Hilbet di rabirdûyê de. Hûn pirsa niha çima li vira Ermenî tune ne bikin ji ber hin bûyeran e. Divê li dibistanê vê hînî we kiribin. Heta ji ber van bûyerana paşnavê malbata me jî hatiye guhertin. Weke hûn fêhm dikin vira ne gundekî ji rêzê ye. Berevajî gundên dinê cihekî dîroka wê xurt e. Heke em qala dîroka vira bikin ewê hewce bike em pirtûkekê binivîsînin. Heke hûn bixwazin hûn dikarin bi xwe werin û lêbikolin.



...olmasınız...
Yol falan derken Heridana vardık. Heridan düşündüğümde aksinde bir
yerdi. O güzelliği, yeşilliği gördükten sonra şehirde neymiş diye düşündüm.
Düşünün yeşilden başka birşey yok. Ne masmavi gökyüzünün mavisi
Ne ... gibi kahverengisi sadece yeşil.
Ağaçların boyu şehirdeki binaların boyundan bile yüksekti. Neyse biraz
yürüdükten sonra doğru ilerledik. Ve sonra ne görelim 70-75 yaşlarında bir
bey amca tarlada çalışıyor. Yani aslında bu yaştaki kişiler
ya ölmüş ya da yatağında ölümü beklerler. Şaşırtıcıydı ama gerçekti
Neyse bey amcanın yanına geldik ve konuşmaya başladık
Bol bol konuştuk bu yerin hakkında birçok bilgi sahibi olduk.
Hatta en önemlisi eskiden burda ermeniler bile yaşamıştı. Bey amca
bize buradaki ermeni kalıntılarını gösterdi. Mozarlarından tutun eşya-
larına kadar. Hatta sohpet ettiğimiz tepe ermeni tepesidir. Burada denilene
göre ermenilerin kiliseleri vardır. Hatta burada altın üretimi bile yapıl-
maktaymış. Tabi geçmişte. Şimdi neden burda ermeniler yok diye sor-
sanız bir takım olaylar yüzünden. Okulda size bunu öğretmiş olmalılar.
Hatta bu olaylar yüzünden bizim ailemizin soyadıda değiştirilmiştir. Anlaya-
cağınız burası sıradan bir köy değil. Diğer köylerin aksine tarihi kuvvetli
bir yer. Eğer buranın tarihinden bahsedersek bir kitap yazmak gereke-
cek. İsterseniz kendiniz gelip araştıra bilirsiniz.

## “Mirov ji rêyên bi kulîlk nagihêje qet tu serkeftinan”

Ev beşa Rozerîn di wî temenê xwe de nivîsandibû ez dubare dikim: “Ne şîna ezmanê şipşîn ne rengê qehweyî yê axa bîna miskê jê tê tenê kesk”. Ya dilê wê herî xweşik neqlî me dike Rozerîn bi xwe ye... Tenê kesk... kesk... tenê kesk... Bi vî awayî hesas nêzî xwezayê dibe Rozerîn... ji ber ku min wê nas kirîye ez pir aram im lê ya herî girîng ez pir xurt im. Ez ji xwe re dibêjim li van erdên hevalên me li ser navê mirovbûnê mîrateyên weha cidî hiştine divê luksa me ya em bêhêvî û bêhêz bibin tune be. Divê em di hundirê ked û wateya bêtir de bin. Divê kêlîyekê tenê em bi keskê bihesin... keskê... Çi dibêje hevala me Rozerîn “Kesk, tenê kesk...” Niha çima li vir Ermenî tune ne... Ev hevok jî di vê nivîsê de derbas dibe... Yên hatine qetilkirin, hatine sirgûnkirin piştî sed salî ji alî zarokek ku kesek ji aliyê heman failî ve hateye qetilkirin e di vê nivîsê de hatine bi bîr anîn... Ji bilî şikenandina vê çerxê çareyek me ya din tune ye... Erdên me ji çerxên bi vî awayî têr bûne. Em dixwazin êdî mirin jî bi ecela xwe were... Gava min di nivîsek ji nav nivîsên ji Rozerînê mabûn de ev hevoka dît min dirêj dirêj li wê kaxizê nerî: “Nivîskarê navdar ê Fransî La Fontaine dibêje ‘Mirov ji rêyên bi kulîlk nagihêje qet tu serkeftinan’...” Weha nîşe stendibû Rozerîn. Heta ku mirin li van erdana bi ecela xwe were emê daxwaza jiyîna di nava aştîyê de bikin û weke ayetekê wê hevokê dubare bikin: “Mirov ji rêyên bi kulîlk nagihêje qet tu serkeftinan.”

## “Rozerîn ne tenê zaroka min bû hevala min bû.”

Ev gera Rozerîn di nivîsa xwe de bi hûrgilîyan vegotîye em ji Kekê Mistefa jî guhdarî dikin:

“Dema Rozerîn hê di çaxên dibistana seretayî de bû em bi wê re çûn gundê me Herîdanê ku bi ser Pîranê ve girêdayî ye. Gundê me di 90an de hatibû şewitandin. Hê cara pêşî wê dibim gund hilbet. Dihere pola pêncan an jî şeşan. Hê dema ji vir dihere gund dest bi nivîsandina çîrokê dike. Ewê têkeve cihekî çawa, dorhêleke çawa; vana xeyal dike. Hilbet gava çû gund nizanîbû gund çawa hatiye vê rewşê. Hilbet me digot bila her ku mezin bibe ew bi xwe hîn bibe. Lê wê bi pîrên gund re dest bi axaftinê kir û ji wan dîroka gund dipirsî. Dipirsî ku çima ketiye vê rewşê.  Ji dîrokê pir hez dikir. Mêrekî pîr vedigot, got ku gava hûn li gund li wê digerîyan  a rast ew li cem min li hewşê rûniştî bû. Dema hûn dihatin ji bo sohbeta me neqede xwe vedişart, taliyê gava hûn diçûn ji wir derdiket berdewamî sohbetê dikir. Paşê hilbet min ji xwe re got, ez ji vê zaroka çi vedişêrim. Lê belê min ji Rozerînê qet tiştek venedişart. Rozerîn ne tenê zaroka min bû hevala min bû. Di heyama dawî de pir zêde pirtûk dixwendin. Û ya din bi bergehek yekalî nedixwend giştî, fireh dixwend.

## “Ji dêvla weyê vana bidîta hûn nejîyana yahû!”

“Gava gundê me tê şewitandin dema gund vala dibe malbatek heye, li bin navê sûcê alîkarîya terorê pir diherin ser malbatekê. Ferdên mêr ji gund derketine, ji ber gotine tiştekî nakin tenê jin hene. Dema leşkeran gund vala kirine jineke 60 salî şûtîtazî li meydana gund gerandine. Paşê Rozerîn ev bûyera bihîstîye. Ji kalkê xwe re dibêje ku gava bûyerek weha qewimî tu li gund bû? Kalkê wê dibêje ku vana pir hatin jiyîn. Rozerîn pirsa ‘Her tişt cuda ev cuda, tu li wir bû?’ dike. Kalkê wê dibêje, ‘Qîza min ez li wir bûm lê min nekarîbû tiştek bikira. Leşker li ser serê me bû’   Rozerîn dibêje ‘Kalko te li wir, gava ew jin şipîtazî li meydana gund bû te çi hîs dikir, te xwe weke dijî didît?!’. Kalkê wê jî ditengije, hilbet hêrs dibe. Ji ser serê xwe diqewirîne. Rozerîn hilbet li hember wî nifşî hebekî veya difikire: “Ji dêvla weyê vana bidîta hûn nejîyana yahû!” Ji ber vê li hember nifşên berê hebekî hêrsa wê hebû!

Rozerîn wê rojê bi sazkirina van hevokan belkî jî bang li me jî dike, em ên ku di pêvajoya ew bi xwe dihate kuştin de. Di wê heyama bi vî awayî bajar xera dibûn û wehşet dihatin jiyîn de gelo me xwe weke dijî didît?... Bêguman ev pirseke zor e. Ji vê pirsê re, tenê ji zarokên dahatûyê re, ji hevalên me re em welatekî lê bi rûmet dikare bê jiyîn bihêlin em dikarin bibin bersiv. Wê rojê, bi dilê rihet, em dikarin bêjin em dijîn û me xewnên zarokên xwe jî nîvco nehişt. Heke em vê xewnê nîvco bihêlin hêrsa Rozerîn a li hember kalikên xwe ewê zarokên me jî li hember me hîs bikin û emê ji pirsên wan re nebin bersiv. Li ser  navê em karibin hem li rabirdûyê hem li dahatûyê têrwate binerin  divê em destên xwe bidin hev û rojên xweş bihûnin an na bi awayekî mafdar emê bibin kesên ev hêrs berê xwe dide wan.

## “We nekir ku her tişt li ser milê me ma.”

Hêrsa Rozerîn weha tê bîra Dayika Fexrîye: “Di van heyamên dawî de weke ji kalikên xwe nefret dikir bû. Rojekê min pirsî ev rewşa. Got ku dayê ez ne ji ber hezkirina min ji wan re tune ye bi hêrs tije me. Ez dibêjim ku heke wan ev doza hilgirtana li min nediket, zarokên wî, apên min bikirana, li min nediket. Hîsa min ji ber vê ye.” Kekê Mistefa jî dîyalogek dişibe vê neqil dike: “Gava min digot me ewa eva kir jî, ka binere we tiştek bi dest xist? Digot, we bi dest nexist, we nekir ku her tişt li ser milê me ma.”

## “Dema Rozerîn kete Sûrê şer tune bû li wir”

Em ji Kekê Mistefa di derbarê pêvajoya Rozerîn hate qetilkirin de tiştên dixwaze neqil bike dipirsin: “Gava min û dayik bangî ewlehîyê kirin gotin ku ‘Zarok çawa kete Sûrê, çawa kete vê rewşê? Baldar bin! Gotin bila zarokên we yên piştî vê nekivin vê’ û hwd.  Dema Rozerîn kete Sûrê şer tune bû li wir. Pitika nû çêbibû jî hebû, mirovê 70 salî jî hebû. Hemû kes li wir bûn. Em jî li wir bûn. Mînak Tahir Elçî li cihê ji bo ew taxrîbata, tiştên bi avahîyên dîrokî dihate kirin nîşan bide çûbûyê hate kuştin. Hê nehate ronîkirin. Rozerîn ji ber li wir dorpêçkirî mabû hate kuştin.”

“Piştî Tahir Elçî hate kuştin demekê, ji bo demeke kurt hate gotin ku bila mirovên sivîl derkevin û hwd. Hilbet heta wê çaxê leşkerî neketibû wir. Di wê dema kurt de Rozerîn nekarîbû ji Sûra weke bajarê labîrent derketa û li wir ma. Nekarîbû ji Sûrê derketa. Ji wê labîrentê di demeke ewqas kurt de belkî ez jî nekarîbûma derketama. Û li wir ji bo demekê jî li cem dê û bavek

kal ma. Ji çêbûna xwe ve nexweşa dil bû jixwe derman tim bi xwe re digerandin. Gava ew malbat jî ji Sûrê derdikeve Rozerîn dibêje ku ez derkevim dikarin min bi nîşangeran bikujin. Rozerîn berî here wir tavilê jî diçû wanegehên walîtîyê vekiribûn. Heta kêlîya dawî jî diçû wê wanegehê. Heta kêlîya dawî xwendekara lîseyê bû, serkeftî bû. Bêdewamîya wê tune bû. Ango heta çû Sûrê jî diçû dibistanê. Dewletê jî zanî bû, ew sivîl bû. Tiştê di vê pêvajoyê de li serê dewletê aliqî bû ev bû." Kekê Mistefa, vê jî neqil dike ku Rozerîn ji alî segvanan ve hatîye kuştin: "Di wê pêvajoyê de kesê hate kuştin ne tenê Rozerîn bû. Zarokek, heta pitik hate kuştin.  Ji her kesî re hatîye gotin ku 'Nîşanger hene qet serê xwe dernexin'. Lê Rozerîn demekê gava derdor ker dibe serê xwe derdixe û tê kuştin. Ji mirinê yekser di heman rojê de em agahdar bûn."

## "Ji bo em cendekê xwe bistînin me dest bi greva birçûbûnê kir"

Pêvajoya me navê Rozerîn esil bi zêdeyî bihîst pêvajoya li cendekê dihat gerandin bû. Malbata Rozerînê bi îsrar li pey cendekê wê çûn. Bi mehan di ber xwe de dan û mafê herî bingehîn ê mirovî, mafê veşartinê daxwaz kirin. Îro ketina me ya li pey çîroka Rozerînê jî ez weke berdewamîya vê pêvajoya lêgerînê dibînim.  Lewra em jî dixwazin ev çîrok wenda nebe û em li pey çîroka hevalên xwe diherin. Kekê Mistefa di vê pêvajoyê de qonaxa bi dewletê re têkildarbûnê jî weha neqil dike: "Kesên din ên bi Rozerîn re hema hema di heman pêvajoyê de hatibûn gulekirin hebûn. Di wê heyamê de kesên diyarkirî jî hatibûn veşartin. Yên cihê wan diyar bû hebûn. Lê cendek nedikarîbûn bihatana stendin. Cihê cendekê Rozerîn jî me nedizanîbû. Dema weha bû me jî ji bo em cendekê xwe bistînin me dest bi greva birçûbûnê kir. Li Komeleya Mafê Mirovan a Amedê me 20 rojan grev berdewam kir."

## "Pir diyar bû ku hêzên din jî bi eşkerahî li ser kar bûn"

"Gava ku em diçûn walîtîyê me didît di destê walî de jî tu tişt tune ye. Me çi bigota digot ku: 'Du deqan bisekinin' diçû cihekî û bi hinan re dipeyivî. Ango li wir berpirsîyar ne walî bû. Pir diyar bû ku hêzên din jî bi eşkerahî li ser kar bûn. Gundê me jî gundekî pir bîrewer e. Gundê me tavilê bi însîyatîfa xwe ji bo cendek daxwazname dan hev. Piştî mirina Rozerîn hê hefteyek nebibû 460 îmze hatin berhevkirin. Me bir walîtîyê. Gava walî ev daxwaznameyana

dîtin şaş ma. Got ku ‘Evqasî mezin nekin jixwe ewê ev cendekana bên stendin, we ev mirovana çima tevlî vê kir di vê pêvajoyê de’. Min jî got ku ‘Haya min jî jê tune ye van mirovana, xwe bi xwe  ev daxwaznameyana berhev kirine. Û ev mirovana giş li parka hember dipên.’ Pirsî got bi rastî jî. Min got heke hûn dixwazin binerin, got ku ‘Ez van daxwaznameyana niha naxim fermîyetê.’ Li wir tiştekî weke îtirafekê got: ‘Ev min derbas dike…’ Ev dihat wateya ku ev ne karê wî bû. Pirsî got bi şexsê xwe, tena serê xwe tu dikarî sibê were. Min got ku heke tiştekî erênî bibe ezê sibê werim. Got sibê were ji bo axaftinê. Roja dinê ez çûm, ne li wir bû. Piştî 2-3 rojên din ez çûm. Min bir dozgerîyê, nîşeyek nivîsand li pişt daxwaznameyê. Şand cem dozger. Ez çûm cem dozgerê wê heyamê. Li wir bi wî dozgerî re hevbandorîyek pir bi pirsgirêk çêbû. Segvana şervan a bi navê Roza ku li Sûrê şervan bû bi Rozerîn re tevlîhev kiribûn. Ji ber vê sedemê hem dozgerî hem jî ewlehî xwedî helwesta dijminane bûn.”

## “Armanca piştgirîya malbatên li wir vala derxîne hebû”

“Min daxwazname dan dozger. Got temam dîne vir û here. Min got binerin walî beg jî li daxwaznameyan nîşeyek nivîsand. Dozger got ‘Guhên vîya ker in wî derxin derve’. Ê li wir bir got ‘ Dirêj neke jixwe ewê têkildar bibe!’. Tavilê piştî daxwaznameyan Ensarîoğluyê AKPyî[*Partîya Dad û Pêşveçûnê*] derketibû û gotibû ‘Me bi malbatan re hevdîtin kir emê cendekan bidin malbatan. Malbat hatine cem me lê milîtanên li Sûrê nadin’. Hayê me jê tune ye hilbet. Lê hemû malbatên li İHDê[*Komeleya Mafên Mirovan*] em pev re di çalakîyê de bûn bi çavê dijmin li me nerîn. Gotin qey em bi Ensarioğlu re ketine têkilîyê. Lê ya rast hevnaskirinek me jî tune ye. Min niherî em nikarin ji nav meselê derkevin, me bang li çapemenîyê kir. Û li wir me ji Ensarioğlu re got ku: Bi kesî re hevdîtin nehatiye kirin, ev mirova çima daxuyanîyek weha dide? Bila bêje bi kê re axivîye. Armanca piştgirîya malbatên li wir vala derxîne hebû.”

Li hember ev piştgirîya malbatan a ji bo mafê veşartinê yê zarokên xwe dabûn dest pê kirin jî midaxeleyên weha qebe hatine kirin û  hatiye xwestin ku ev piştgirî jî bê lawazkirin. Li hember malbatên cendekê zarokên xwe dixwazin jî nêzîkahîyek weha, ruhê pêvajoyê pir zelal îfade dike.

## “Dewlet jî peyamê dide a rast, dibêje li dû we girse tune ye...”

Kekê Mistefa neqil dike ku di vê pêvajoya li cendek gerandinê de têra xwe piştgirîya civakî tune bû:

“Têra xwe piştgirîya civakî tune bû. Ez pir baş zanim ku mirovên dilê wan perçe dibû hebûn. Lê ev tirs û endîşeya pozîsyona wan jî guhertibû. Yan na dayikan di nav xwe de organîzasyonek çêkirin. Dayikên di greva birçîbûnê de bûn û hin dayikên ji derve civîyan. Ewê daxuyanî bidana çapemenîyê û têketana Sûrê. Lê 20-30 dayik bûn. Destûr nedan. Fermandarê li wir jî got, ‘Heke 100 jinên din hebûya tu bixwaze jî nexwaze jî belkî bihata hiştin lê niha nabe destûra vê girseyê bê dayin.’ Dewlet jî peyamê dide a rast, dibêje li dû we girse tune ye...”

Di dawiya ev hemû pêvajoyên dijwar de cendekê Rozerîn hate veşartin... Rozerîna ku di 8ê Rêbendanê de hate qetilkirin di 7ê Pûşberê de bi têvlêbûnek girseyî hate definkirin.  Li ser erdên me mafê zarokek 16 salî yê veşartinê jî hewceyî bi berxwedanek bi mehan dajo dike. Lê divê qet neyê ji bîr kirin ku di vê pêvajoyê de mesele ne tenê mexdûrîyet bû. Li ser navê rûmeta mirovahîyê, li ser navê lê xwedî derketina zimanê xwe, çanda xwe, hebûna xwe û heta ya dawî jî cendekê xwe ev têkoşîn hate nîşan dan. Û zilm dan ber çavên xwe. Ev hemû tiştên hatin jijîn tenê ji ser mexdûrîyetê bên nirxandin nabe xwedî lê derketina bîra mirovên xweşik ên me ew wenda kirin. Ev encax dibe bêbîrhiştin[*hafızasızlaştırma*]. Heke armanca me em vê bîrê wenda nekin be, divê em zanibin kesên em wan bîrdikin[*hafızalaştırdığımız*]  ji mirinê bêtir jiyan, ji serî tewandinê bêtir berxwedan, ji jirêzêbûnê bêtir wate hilgirtine.

## “Ji zaroka min berîya min dewlet berpirsîyar e”

Di derbarê pêvajoya darizandina derheqê qetilkirina Rozerînê û rewşa heyî ya bêcezatîyê de Kekê Mistefa vana neqil dike:

“Niha jixwe ez tim dibêjim ku zaroka min weke sivîl hate qetilkirin. Temenê wê biçûk bû. Ji zaroka min berîya min dewlet berpirsîyar e. Heta 18 salî dewlet di hedê herî jor de berpirsîyar e. Dewletê di vê rewşê de kesê di berpirsîyarîya xwe de ye kuşt. Niha dozek heye, doz niha li Daniştayê[*dadgeha bilind*] ye. Li îstinafê îade kirin. Agahiyên di ev jevrenivîsînên pêvajoya darizandinê de divê berê pêşîn herin ji parêzer re,

paşê ji me re werin lê ew agahiya, pêşî ne ji parêzer re ji min re şandin. Ji parêzerê me re jî bi awayekî li dijî qaydeyan ranegihandine. Xwestin mafê di maweya 15 rojan de birina dadgeha jor jî bi hîleyan ji holê rakin. Dibû ku ez bifikiriyama ku hayê wî jê heye û min neqlî parêzer nekira. Di vê xalê de malbatên qet tu agahiya wan tune ye jî hene. Heke malbat nezanibin ewê çi bibe. Ewê doz biketa yanî. Min neqlî parêzer kir me doz bir dadgeha jorê."

## "Wan jixwe ceza nestendin min weke bavê wê ceza stend"

"Wan jixwe ceza nestendin min weke bavê wê ceza stend. Pêşî 5 sal dabûn, paşê hikim taloq  kiribûn. Tirkîye zagonên xwe nasepîne. Dezgeya darizandinê ya li vî welatî serî pir tevlî hev dike. Ji heman bûyera 5 sal taloqkirin dabûn dîsa salek û neh meh ceza dan. Di maweya taloqkirinê de heke ji heman sûcî dosye vebe tê cezayê hatiye taloqkirin jî razê. Lê li vir bûyer heman bûyer e. Parêzer li dadgehê jî got, ji bûyera jixwe heye, ya hê pêvajoya wê ya darizandinê didome, ya taloqkirin hatiye dayîn dîsa ceza dan."

Xwezî dema me pirsên di derbarê hiqûq û darizandinê de dipirsî ji vana hêviya me ya derbarê pêkhatina dadê hebûya, lê dema em pirsan dipirsin jî em bersivê dizanin: "bêcezatî û xelatkirina faîl…"

## "A rast pênc sal derbas bûye lê pêvajo hê weke do berdewam dike"

Em ji Kekê Mistefa weke dawî dipirsin bê ka peyamek wî ya taybet heye yan na: "Rewşeke ne tenê malbata me hemû malbatên ên li Sûrê jiyana xwe ji dest dan û ji bo cendekan di çalakîyê de bûn berpirsîyar in heye. Ew jî cendekê Hakan Aslanê ku jiyana xwe ji dest dabû ye. Malbata wî di wê pêvajoyê de hat xwestin tevlî wê çalakîyê jî bibin. Lê ew dê-bavêk pîr bûn. Dayik bi qansêra pişikê bû. Endama malbatê ya din jî zaroka wan a keç bû. Malbat li Gogsîya Erziromê dijî. Me ji malbatê re got ku hûn herin jixwe emê li dû cendek bigerin hûnê ji çapemenîyê jî lê binerin. Malbat çû me cendekê hemû kesan şopand, stend. Lê me nekarîbû wî bistenda. Tenê malbata wî nekarîbû bigihişta cendekê xwe. Sê meh berê cendekek derket em difikirin ku ew e. Niha ji bo bê ka ew e yan na ewê tespîta nasnameyê bikin. Lê ji cihê hatiye tarîfkirin jî derketîye. Agahîyên xwînê yên malbatê li ewlehîyê tune ne. Bavê wî dibêje min xwîn daye. Bav dihere dîsa xwînê dide, xwîn hê

nû gihaştîye Amedê. Li benda encamê ne. Bi vê hêla xwe a rast 5 sal derbas bûye lê pêvajo hê weke do berdewam dike. Cendekê Hakan hê ji bo tespîtkirinê disekine. Hilbet, em ji hêla Hakan Aslan ve di wê pêvajoyê de jî pir pê biliyan lewra me xwe berpirsîyar hîs dikir. Lê di encamê de bêyî bê dîtin ew çalakî sekinîbûn… Ew nehate dîtin, em piştî veşartina Rozerînê çûn serdana wan. Em dixwazin piştî encam derkeve bi malbatan re herin serdana malbata Hakan Aslan bikin…”

Sal 2021 e û ji 2016an bi vir ve pêvajo hê berdewam dike. Ango pêvajoya lêgerîna cendekan dev ji teze mayîna di bîran de berdin pêvajoyek hê berdewam dike ye… Li Sûrê hê di înşaatên li ser kavilên mezin têne çêkirin de pir pêkan e ku mirov rastî li cendek û hestîyan were… Ev pêvajoyek berdewam dike ye..

## “Çiqas kesk… kesk… pir kesk…”

Bi vî awayî em amûra xwe ya dengtomarkirinê didin hev û belgeyan nivîsan dîsa paşve dixin kîsik. Niha her tişt di mejiyê me û dilê me de ye. Di encama îsrarên Dayika Fexrîye de em li ser sifreya wan a xweşik rûdinên, em xwarinek xweş dixwin. Û çavê min dîsa bi paceya biçûk a vê odeya ku li keskê Hewselê dinere û bi dehan kulîlk lê hene dikeve. Rozerîn ji vê pacê pir li derve nerîbû… niha ez jî bi hevalên xwe re ji wir dinerim û bi Rozerîn re dubare dikim: Çiqas kesk… kesk… pir kesk… *Ne şîna ezmanê şipşîn ne rengê qehweyî yê axa bîna miskê jê tê tenê kesk…* kipkesk…

Rozerîn hevala me ye… ronîya çavê me ye… em hêza jiyandina bîranîna wê û wateya wê dîsa ji wê distînin… Ne pir edebî ne peyvên min… Ya edebî ye hîsên min in… Ya edebî ye hîsên me yên xweşik ku bi hevalên min ên xweşik, hevalên min en rê Medzan û Yasemîn re me li pey çîroka hevalên me dibe ne… Biçûk be jî me xwest hewldanek bi wate be li ser navê mirovahîyê, li ser navê gelê me yê yekta, li ser navê çem û çiyayên xweşik ên van erdên xweşik; li ser navê bêhna axê, dengê baranê, ronîya tavê… Li ser navê fera di çavên zarokên li ser erdên me de. Li ser navê li hember sekinîna yên lorîkên dayika me ji me re distrê werdigerînin qêrînan, “*hawar*” an… li ser navê em xeyalên hevalên xwe yên xweşik Nîhatên xwe Cemîleyên xwe Ceylanên xwe ji bîr nekin û nedin ji bîr kirin… Me hîs kir bê zarokên me, hevalên me çiqas xweşik in… Emê ji bîr nekin û bidin jiyandin…

Ez vê nivîsa ewê her di bîrên me de berdewam bike bi risteyên  Nâzım Hikmet ên Rozerîn di çalakîya dibistanê de xwendibû û qeydî vîdyoyê kiribûn diqedînim...

## ***Di Derbarê Jiyînê De***

*Jiyîn ne ya heneka ye,*
*tê bi cidîyetek mezin bijî*
*weke sihorîkekî li ser meselê,*
*ango, bêyî li hêvîya tiştekî dervî jiyînê û ji jiyînê wêde be,*
*ango, ewê hemû kar û barê te jiyîn be.*

*Tê jiyînê cidî bistîne,*
*ango, di wê radeyê de, weha ku,*
*li ser meselê, piyên te girêdayî ji paş ve, pişta te li dîwêr,*
*an jî berçavkên te yên mezin,*
*bi qutikê xwe yê spî li laboratûwarekê*
*tê karibe ji bo mirovan bimre,*
*hem jî ji bo mirovên te rûyê wan jî nedîtîye,*
*hem jî gava tu kesî zor nedabe te ji bo vê,*
*hem jî tişta herî rast, herî xweşik*
*ku tu zanibe jiyîn e jî.*

*Ango, tê jiyînê weha cidî bistîne ku,*
*di heftêyê xwe de jî, li ser meselê, tê zeytûnan biçînî,*
*hem jî ne go ji bo ewê ji zarokan re filan bimîne,*
*li hember ku tu ji mirinê ditirsî ji ber ku tu ji mirinê bawer nakî,*
*jiyîn, ango ji ber ew bi ser dikeve.*

Nâzım Hikmet

Vîdyoya Rozerîn helbest dixwîne.

*Çîroka merxezek zingargirtî û reşbûyî*

# Xurbet (Selma) Kılıç

Li erdnîgarîya me ji kişwerên herî xweş yêk jê jî bêşik payîz e. Kuçeyên li herêman, bi rengên, lîstikên, dengên zarokan tije dibe û rengên din li payîzê zêde dike... Lê çi heyf ku dorhêla şer guh kişweran nade û berdewam dike. Şer digihêje Selmayê jî weke gelek zarokên din. 17 Kewçêr 2001 serê sibehê di encama girtina ser malekê de Selma tê gulekirin, eyn weke Uğur Kaymaz û weke Xezal (Gazal) Beruya ku di heman salê de di êrişa kûçikên leşkeran de jîyana xwe ji dest da. Hê berî ku rengên xwe bide payîzê...

Medzan Nakçi

## Destpêk

Rawestgeha ewil a hevdîtinên me Farqîn bû. Di dema rêwîtîya me de, min di wesayîtê de çend nîşe girtibûn; ber bi Farqîna ku welatê min e û 20 sal



Dayîka Remzîye

rabirdûya min pê re heye, ez di rêwîtîyeke hestên herî tîr hîs dikim de me. Ezman xwe reş girêdaye, baran weke ku dike bibare. Qêrîna min bû, dengê bayê ji derve tê. Min nivîsandibû ku “Qêrînên min, me gav bi gav nêzî çîrokên hevalên me dike” û pişt re min lê zêde kiribû “niha em nêzîktir in, herî nêzî we ne...” Selma, hevala me ya pêşî ye ku me li çîroka wê guhdarî kir. Emê ji Dayika Remzîye guhdarî bikin bê Selma çiqas wêrek û bêtirs bû û jîyana xwe çawa ji dest daye...

Ji bo em çîroka Selmayê hîn bibin me yê bi dayika wê re hevdîtin çêbikira. Bi kelecan û hestên xwe Yasemîn, Xemgîn (Yusuf) û ez dema em li sûkê rûniştî bûn û em li benda hevalê ku navbeynkar bûn, careke dawî me bala



Wêneyê Xurbet Ku Li Dîwarê Malê Daleqandiye

xwe da agahîyên Selmayê yên ku heta wê kêlîyê em gihaştibûnê û em li ser pirsên emê bipirsin xebitîn... Telefona em li bendê bûn hat. Em bi rê ketin, mala Selma li taxa jêr a Farqînê bû. Li wê taxê berxwedana xweserîyê hebû di 2015an de. Gava em ber bi mala Selma ve diherin, ji ber metirsîyên ewlehîyê, hevalê ku ji me re bibû referans hewl dide ku bi qasî guncav be me di cihên ewle de bibe. Li her derê taxê hema hema kamerayek du kamera, wesayîtên zirxî û kalekol. Pê re em digihêjin mala Selmayê. Li malê çend zarokên biçûk û Dayika Remzîye ya ku li benda me bû. Temenê Dayika Remzîye li dor 55-60an e, bi dev li kenî, ji dil û canî û berxwêderîya xwe me pir xweş pêşwazî dike. Gava dorhêl kêlîyekê bêdeng dibe dayik dest bi vegotina Selmayê dike.

“Navê Selma yê esil (yê li malê) bi rastî ‘Xurbet’ bû. Dema ew çêbû bavê wê li Bandırmayê dixebitî, li xurbetê bû. Ji ber ku bavê wê li xurbetê bû me navê Xurbet li keça min kir lê di nasnameyê de weke Selma derbas dibe.” Em li bavê Xurbetê dipirsin “Bi salan di girtîgehê de ma. Gava diçû Newroza Amedê ya 2008an di qezaya trafîkê de jîyana xwe ji dest da...” Dayik dibêje ku bavê wê pir ji Xurbetê hez dikir, pir qîmet didayê û hertim Xurbet bi bîr

dianî. Piştî em ji bo dest bi hevdîtinê bikin destûrê dixwazin û amûra dengtomarkirinê vedikin dayik dest bi vegotinê dike.

## “Kî dikare ji çem avê bîne?”

Dayika Remzîye jineke bi kelecan, yeka berxwêderîya xwe diparêze û bi qasî vê jî hêvî dide ye. Pêşî em bi Xurbet zarokek çawa bû dest bi pirsên xwe dikin. Piştî bêdengîyek kûr dayik dest bi vegotinê dike: “Xurbet keçek min a pir bêtirs û wêrek bû.” Û bi awayekî balkêş bîranîneke weha parve dike ku kêlîyeke “bîrê ya derberarê salên 90î” ya ji min re qet ne xerîb e tê jiyîn. Farqîn bajarekî di salên 90î de ji tundîya dewletê û Hizbullahê bi awayê herî giran para xwe stendîye û şahidîya gelek kuştin, qetlîam û wehşetan kirîye ye… Bi vebêjên nifşê berîya min re pir dişibîyan hev  bîranînên Dayika Remzîye yên bi Xurbetê re! Dayik berdewam dike: “Di 90an de li Farqînê dema Hîzbullahê her roj mirov dihatin gulekirin, kesî nekarîbû serê xwe derxista derve. Di wê pêvajoyê de êvarekê em bi malbatî rûniştibûn, em ketin şert me got kî dikare avê ji çem bîne. Ji nav me hemûyan hew ew rabû got ‘Ezê bînim’ û wê êvarê çû ji çem av anî. Bavê wê jî piştî wê rojê digot ‘Wele keça min cegera bi me re tune ye bi te re heye’… Pir wêrek bû keça min.”

## *“Keçika jehatî”, “Kevanîya mala min bû”, “Dilê wê zîz bû”*

Piştî xulekek-du xulekan em dest bi pirsên weke Xurbet yeka çawa bû, ji çi hez dikir, di jîyana xwe ya rojane de çi dikirin û têkilîya wê bi derdora wê re çawa bû dikin. Dayik bêhneke kûr dikşîne û dest pê dike. “Hevalên Xurbet pir bûn, pir ji Xurbetê hez dikirin…” Hevalên Xurbetê bi awayê “keçika jêhatî” bang dikirinê. Xurbet bi rastî jî pir jîr , wêrek û kesayetek pir xurt bû.  Dayik berdewam dike, “Li malê bi piranî li xwişka xwe ya biçûk dinerî. Pir ji Newrozê hez dikir. Pir xêrxwaz bû, mezina malê bû.” Piştî hebekî disekine lê zêde dike : “Kevanîya mala min bû.” Yanî ya ku karên malê li hev tanî ew bû. Xurbet ji dem bihurandina li malê hez dike, bi xwişka wê ya biçûk Newroz re navbera wê pir baş e, bi hevalên xwe û derdora xwe re pir baş li hev dike…  Dayika Remzîye gotineke Kurdî ya demên dirêj e ku ne min ne jî hevalên min ên xebatê bihîstine dibêje: “Dilê wê zîz bû , yanî yeka dilê wê tenik û hestyar bû. Bi wê re hevaltî kirin pir xweş bû. Zarokek keç a egîd û bêtirs bû.” Zîz, ji bo em nifşên nû peyveke pir hindik lê dihat rasthatin bû, ji

ber vê em pir şaş mabûn û me gotina herî rast piştî hevdîtin qedîya û em ji malê derketin dît. Ji bo peyva Zîz bi Tirkî gelek wate (xesas, hestyar, tenik û hwd.) hebûn.[13] Ji bo Xurbet gotina herî watedar dilzîzbûna wê bû… Têkilîyên wê  hem bi derdora wê re baş bû hem jî ew bi xwişka xwe ya biçûk Newroz re têkildar dibû û jê pêv kesayetek wê ya alîkarxwaz hebû evana jî nîşanên dilzîzbûna wê bûn… Û dayik lê zêde dike: “Ji muzîkên Kurdî pir hez dikir, tim lê guhdarî dikir…”

## “Li Farqînê rojê sê-çar, carinan pênc kes”

Emê bi awayê qewimîna bûyerê û atmosfera polîtîk a heyamê berdewam bikin. Ligel ku ji dilê me nayê em ji Dayika Remzîye qewimîna bûyerê bipirsin jî kêlîyekê em hêzê ji wê distînin û dikarin bipirsin… Eşkere ye ku atmosfera polîtîk a heyamê awayekî berdewamîya salên 90î ya li Farqînê ye. Vebêjên malbata min bi xwe, lêkolînên heta îro hatine kirin û tiştên Dayika Remzîye dibêjin bi zelalî nîşan didin ku li dorhêlek çawa tê jiyîn. Bi gotina “Jixwe ji destpêka salên 90î heta wan heyaman tundîya Hîzbullah hebû, li Farqînê rojê sê-çar, carinan pênc kes dihatin kuştin! Ew demana pir bi nexweşî bûn, kes bi kesî bawer nedibû” dest pê kir Dayika Remzîye. Navbera salên 2000-2003an jî  awayekî berdewamîya heyama tarî ya di salên 90î de hate jiyîn bû û tundîyê cih bi cih dikarîbû xwe nîşan bidaya. Lewra li herêmê OHAL [Rewşa Awarte] diket sala xwe ya 14an û di hundirê heman salê de OHAL sê caran dîsa dihat dirêjkirin…

## “Oy Xurbeet, oy bavoo…”

Niha jî emê ji Dayika Remzîyeyê guhdarîya “wehşeta” hate jiyîn ku wê bi xwe şahidîya wê kirîye bikin. Wehşet guleya ku Xurbet ji jîyanê qut kir e, wehşet li zarokek keç a 18 salî miameleya terorîstîyê kirin e û wehşet guhên faîlan ên feryadên Xurbetê û bavê wê nabihîzin e…

“Bi şev  saet dihat çaran, telefonek hat, gotin ewê bigrin ser mala we. Em jî ji xew rabûn, li holê tiştek tune bû min ê ji ku zanîbûya ewê gule bera keça min bidin…  Şeveqê li dor heftan li derî xistin, hemû kesên li malê bûn ji xew rabûn. Keça min Xurbet derî vekir, leşker û polîs li malê qul bi qul gerîyan, ê me jî hayê me ji tiştekî tune bû. 2000-3000 leşker polîs ketine taxê me

[13] [Ev nivîs bi Tirkî hate nivîsandin û ji bo Kurdî hate wergerandin.]

tiştek jê fahm nekir, herhal du kes hebûn ew digirtin...” Ev hemû vebêjana min birin zaroktîya min. Dema ez 13 salî bûm sibehek adarê girtibûn ser mala apê min, ez pir qilqilî bûm, min ji hewşa mala me serê xwe carekê



Xurbet Û Bavê Wê

rakir tax tije polîs û leşker bûn û wesayîtên zirxî yên mezin... Mala apê min li quntara çîyayên Farqînê ye; li çîyê leşkerên yek rêzbûyî hebûn, qaşo li cebilxaneyan digerîyan. Ev hemû tiştên diqewimîn pir balkêş bûn, bi ser malê de girtina ewqas leşker û polîsan û li hemû malê êşkence kirina wan û miamele kirina wan a xerab di jîyana min de, “di bîra min de” maye... Tiştên wê sibehê Xurbet jiya û hîs kirin hebekî be jî ez dikarim hîs bikim. Dayika Remzîye bi hevokên xwe yên tûj berdewam dike.

“Min nerî anons kirin gotin ‘Li malê tiştek tune ye’. Di wê navberê de ez çûm ber paceyê, paceya me li kuçeyê dinere. Ji nişka ve bombe avêtin hundirê malê! Mal jî pir qelebalix e, apên keça min hene, pismam û dotmamên wê yên biçûk hene, jintîyên min hene; li malê em li dor 24 kesan bûn... Bombe jî kete hundirê malê, ber Quranê, neteqîya. Paşê amîrê ewlehîyê derket qatê

jor got ‘Ev mal zîyaret e’, got ‘we pîm kişandîye lê neteqîyaye’ weke henekê xwe bi me bike...”

Û dor tê ser tiştên Xurbetê jiya ne. Hawarên Xurbet û bavê wê ji aqlê min dernakevin. Kêlîyên Xurbet ji jîyanê qut kirin pir dilsoj in; ewqas faîlên guhên xwe girtin, qetlîama digot ez têm û tiştên paşê hatin jiyîn...

“Amîrê ewlehîyê hê bi şaşwazî li bombeyê dinerî, paşê ji nişka ve ji keça min re got ‘Were derîyê embarê veke’. Xurbet rahişt mifteyê û çû, piştî derîyê embarê vedike ji bo were cem me dizîvire, wê hingê ji panzêrê gule berdidin. Guleyên ji panzêrê berdan yek jê li keça min ket. Piştî dengê çekan em zûka daketin jêr, keça min bi birîndarî li erdê dirêjkirî bû. Ez qêrîyam! Min hewl da ez herim cem keça xwe, leşker û polîsan min girtin nehiştin, bi ser de êşkence bi min kirin, fîstanê min jî çirandin, ez nekarîbûm biçûma cem keça xwe... Ez dîsa derketim jorê, ji bo kincên xwe biguherim; wê hingê min qazaxek dît, min zûka li xwe kir. Gava bavê keça min pirsî got ‘Çi bû Remzîye?’ min got ‘Mala te xera bibe, Xurbet kuştine’. Bi gotina min re bavê wê bi carekê re xwe gihand jêr. Keça min wê hingê ji bavê xwe re dibêje ‘Meraq neke tiştekî min tune ye’. Weke min berê jî got keça min pir wêrek bû... Polîs û leşker nahêlin bavê wê here cem Xurbet, keça min û bavê xwe maweyekê ji hev re hawar hawara wan a ‘oy Xurbeet oy bavoo’ bû... Keça min birîndar bû, di halê li erdê dirêjkirî de. Bavê wê jî maweyekê di destê polîs û leşkeran de bû. Hê jî hawarên wan ji hev re dikirin feryadên wan ji bîra min naçin...”

Xurbet ji hêla xwe ya çepê gule dixwe û demekê bi awayê birîndar, li erdê bêyî tu midaxele bêkirin tê sekinandin. Em qala hişmendîyek weha dikin ku faîl xwe li kerîyê datînin, guh nadin qêrînên bav û zarokê, ji alî ewlehîyê ve qet bi tu awayî destûra têkilîya wan nayê dayin û ew tên astengkirin. Ev hişmendîya piştî Xurbet jîyana xwe ji dest dide jî berdewam dike, bêhiqûqî li pey hev berdewam dikin... Dayika Remzîye pêvajoya ku nakeve tu qeyd û raportan vedibêje. Em berdewamî guhdarîkirinê dikin.

“Ewê tiştek bi keça min nehata, wêrek bû... Guleyek lê ketibû. Gule li hêla çepê ya zikê wê ketibû, ewê tu tişt bi keça min nehata...”

Piştî biserdegirtina malê êşkenceya li malbatê berdewam dike... Ji alîkî ve Xurbet hatîye gulekirin ji alîkî din ve li malbatê kirinên derhiqûqî berdewam dikin. Dayika Remzîye berdewam dike pêvajoyê neqil dike. “Bavê keça min,

apên wê, pismamên wê, min, jintîyên min û zarokên me binçav kirin; li malê kî hebû kî tune bû em giş birin. Wê hingê Xurbeta min bi halê wê yê birîndarî xistine panzêre, di panzêrê de êşkence pê kirine, bi çekê li serê wê xistine. Birînek keça min tenê hebû, dema wê şuştin gotin ji serê xwe jî birîn bûye…" Ji ber ku tiştên dayik qal dike di raportan de derbas nabe em hemû pir şaş man. Guhên me tiştên din dibihîstin. Piştî ku Xurbet hatîye gulekirin ji dêvla ambûlansê wê xistine panzêrê û di panzêrê de li gor tiştên dayik neqil dike, faîlên ku tu qêrîn nedibihîstin êşkence pê kirine û bûne sebep ku jîyana xwe ji dest bide… Xwişka Xurbet a biçûk jî dema hevdîtinê bi me re bû. Û bi awayekî eşkere dibêje di wê heyamê de pir biçûk bû û ji tiştên weke xewnan di bîra wê de maye yek jê jî ev bû: "Bi halê birîndarî Xurbet xistin panzêrê û êşkencê bi wê kirin…" Dayika Remzîye bi dengê xwe yê diricife berdewam dike. "Ji sedî not keça min di panzêrê de şehîd xistin…"

Hilbet weke ev hemû tiştana ne bes bûn li nexweşxanê jî bêhiqûqî berdewam dike. Qet bi tu awayî destûr nehatîye dayîn ji bo bijîjk midaxele bikin. Li hember bertekên bijîjkan, li hember ku gotine "Ev keçka li çîyê nehatiye gulekirin, li malê hatîye gulekirin" jî hema weha ji jîyanê xatirê xwe dixwaze Xurbet… Di encama xwînbûna hundirî de jîyana xwe ji dest dide Xurbet.

Di vê pêvajoyê de hemû bêhiqûqî berdewam dikin. Di binçavan de, li nexweşxanê, li taxê, di veşartinê de… Em ji Dayika Remzîye pirsa di binçavan de çi jiyan dikin. "Êşkence bi hemû mêran dikirin. Dema ez li qereqolê bûm amîrê ewlehîyê hat, me gelekî nîqaş kir…" Em tavilê dîyalogan dipirsin û berdewam dikin ku gotinên xwîna mirov  sar dikin bibihîzin: "Min ji amîrê ewlehîyê re got, heke tiştek bi keça min were, ezê ji te heta Ewropayê (AİHM) bibim dozdar. Bersiva wî da jî 'Ezê ji te bibim dozdar, ji 12ê şevê bi vir ve polîs û leşkerên min li ser pîyan disekinin' bû. Paşê bi ser hev de pirs dipirsîn, way efendîm navê keça te çima Zozan e, navê wê yê kod Zozan e, wateya navê Zozan çî ye? Li malê çima navê wê Xurbet e, di nasnamê de çima Selma ye? Ez jî bersivan didim ha Zozan di Kurdî de tê wateya  çîyayên bilind, navê keça min ê kod filan tune ye…" Hêzên ewlehîyê di wê navberê de midaxeleyî veşartinê jî dikin û bi gotinên "Di demên şevê de ewê du mêr di karên veşartinê de amade bin, ewê kesekî din tune be" hişyarîyê didin û gef jî li malbatê xwarine gotine "An na emê qîza we weke teror nîşan bidin", faîlên ku guhê wan qêrînan nabihîze/ faîlên ku guhên wan ji qêrînan re ker e… Dayika wê bi awayekî dilşkestî dibêje "Min dixwest ez keça xwe şeveqê veşêrim". Peyv dibin girêk di qirika Dayika Remzîye de…

Piştî sê rojan mêrên malbatê ji qereqolê berdidin. Dayik dibêje “Şîna me hê li erdê bû… Xwîna keça min hê li erdê bû,” û berdewam dike “Bavê keça min, apê wê, kurên apê wê dîsa girtin…”.

Em dixwazin bipirsin ku piştgirîya civakî heye yan na. Xurbet ji jîyanê hatîye qutkirin, êşkence û miameleya xerab li malbatê hatîye kirin. Binçavkirin, girtin, tiştên li nexweşxanê hatin jiyîn… Dema ev hemû dibûn, piştgirîya hiqîqû di çi astê de bû? Rapor hatibûn amadekirin? Ji alî sazîyan ve heyet hatibûn şandin? Dema em vana dipirsin dayik dîsa dest pê dike, vê carê qala çapemenîyê dike: “Çapemenîyê bi ser de girtina malê bi wêneyên çîyayên Farqînê dikirin nûçe! Çapemenîyê keça min weke teror îlan kiribû…” Em hîn dibin ku heyet û sazî di ketina Farqînê de hatine astengkirin, dayik dibêje “Hikûmetê nehişt heyet vekolînên xwe bikin,” û berdewam dike: “Dema destûr dabûn ketina wan heyet hatibûn, hemû kes hatibûn şînê jî.” (STK, partî û sazîyên hwd.) “Di heman demê de, Tahir Elçi jî hebû di heyetê de.” Gava nûçeyên çapemenîyê yên reşkirinê berdewam dikirin astengkirina ketina navçeyê ya heyetên lêkolînê wehşeta qetlîamên di salên 2015-2016an de li herêmê hatin jiyîn tîne bîra mirov. Pir baş tê bîra min. Di qedexeyên derketina derve de li Farqînê destûra ketina heyetan nedihat dayîn. Ez bûm şahidê hebûna Tahir Elçi ya di heyetê de. Mirovan jîyana xwe ji dest dabûn. Dema qutkirina avê û ceyranê û bi dehan bêhiqûqîyan berdewam dikirin zimanê çapemenîyê nehatibû guhertin! Nehiştina hikûmetê ya ji bo ketina heyetan a navçeyê û lêkolîn kirina wan nehatibû guhertin!

## “Ezê bi rêya Ewropayê (AİHM) bibim dozdar”

Bi fikra ku divê berdêlek ji jîyanê qutkirina Xurbetê û bi ewqas bêhiqûqîyan re rûbirû mana malbatê hebe, em pirsa failê bûyerê derketîye holê yan na dikin.

“Ji serê bûyerê ve me nexwest em dozê bi hikûmetê re bibin, me doza xwe bi rêya İHDa Amedê vekir. Jixwe dema ez di bin çavan de bûm min ji amîrê ewlehîyê re gotibû. ‘Ezê bi rêya Ewropayê (AİHM) ji we bibim dozdar.’ Ji serî ve ji dada Tirkîyê hêvîyek me tune bû. Derfetên parêzerîyê İHDa Amedê da. Doza me mixabin ku… hê berdewam dike…”

Bi vegotina danişîn çawa derbas dibûn, pêvajoya dozê, bêdadî û serpêhatîyên dijwar ên ku dîtine berdewam dike Dayika Remzîye. “Em

diçûn danişînan, 20 sal derbas bûye, baş nayê bîra min li dadgehan çi bibûn… Berîya danişînan me bi İHDa Amedê re hevdîtin dikir, bila sax bin me qet tenê nehiştin. Çend caran danişîn çêbûn, faîl derneketin holê. Dema



Xavikên Xurbetê

divîyabû faîlan ceza bikin ên me girtin, her yek ji wan du-sê salan di girtîgehê de girtî man…" Ligel ev hemû bêhiqûqîyan, eşkere li holê ye ku qet bi tu awayî dad pêk nehatîye, dîsa jî gotinên dayikê tespîtek gelekî balkêş bû ji bo min. Dema em binpêkirinên mafan ên li erdnîgarîya Kurdistanê tên jiyîn di çarçoweya dad û hiqûqê de difikirin, dîyar e ku faîl qet bi tu awayî dernakevin holê û faîl bê ceza dimînin. Dayika Remzîye dibêje "Ewê kî ceza bistîne? Ka ewê ji ku bistîne? Gotinek pêşêya ya Kurdan a pir xweş heye" û gotina "Kûçik, goştê kûçikan dixwin?" bi me re parve dike. Belkî jî divê em sedema parastina faîlan, bêceza hiştina wan, pêknehatina darazê di gotina pêşîyan a dayik neqil dike de bigerin…

## Hemû kes hînî bêdadîyê kirine

Dayik piştî bûyerê di heman rojê de bi hemû jinan re tê binçavkirin û tê berdan. Gava em pirsa piştî binçavkirinê dikin, "Piştî ez ji bin çavan derketim min çavên xwe li nexweşxanê vekir. Li ser serê min hemşîreyek hebû, min zûka pirsî 'Rewşa keça min çawa ye?' Piştî hemşîrê gote 'Rewşa wê baş e xaltîkê, meraq neke' bi bîstekê min bihîst ku keça min şehîd ketîye, jîyana xwe ji dest daye…" Dora nexweşxanê bi hêzên ewlehîyê tije bûye, mixabin tu kesî nekarîbû Xurbet bibîne, midaxele nehatîye kirin… Ligel ewqas tiştan jî

midaxeleyî karên veşartinê dikin, hê şîn li erdê endamên malbatê tên girtin û tên şandin ji bo girtîgehê. Dayik bi dirêjahîya du-sê salan, dema mêrê wê girtî ye di ber xwe de dide.  Berdewamî vegotina tiştên di wê pêvajoyê de jiyabû dike, "Jixwe li vî welatî dad tune ye, hemû kes hînî bêdadîyê kirine. Mêrê min du-sê salan girtî ma. Li şaredarîyê dixebitî. Bi awayekî min hewl da heyamên dijwar derbas bikim. Mêrê min piştî ji girtîgehê derket dîsa vegerîya karê xwe… Mirov heta derd nebîne nekare tiştinan fêhm bike. Dema ciwanek dimre, ez dibêjim xwezî ez bigîhîştamê, min dilê xwe jê re vala bikira…  Xurbeta min ji min stendin 'Zarok kezeb e ka ji bîr dibe?'." Digrî: "Keça min bi zilmeke pir mezin çû…"

## Piştî Xurbet tê gulekirin cejna tê pîrozkirin!

Xwişka Xurbetê wê çaxê hê pir biçûk e. Ji nişka ve tiştin tê bîrê û bi me re parve dike "Xwişka min bi birîndarî xistin panzêrê. Piştî panzêr çû leşker û polîs di destên xwe de bi şekiran hatin û li hemû zarokên li taxê şekir belav



Merxezek Zingargirtî

kirin. Dema belav dikirin digotin 'Îro cejn e zarokno, me terorîst kuştin, ha ji we re şekir'…" Li erdnîgarîya Kurdan, li zarokan şekir belavkirina leşker û polîsan, bi xerakirin-tundîyê re paralel dihere. Di pêvajoya pevçûnê ya dawî de jî vê rewşê xwe nîşan da. Di sala 2016an de li Cizîrê, di qedexeyên derketina derve de jî me şahidiya mînakên dişibin vê kir.   Ji bo me zarokan li van deran cejn jî ha weha derbas dibin…

## "Ez bêhn dikim, bêhn dikim"

Dema em pirsa tiştên li dû Xurbetê mane dikin dayik vedibêje: “Min ji keça xwe re çeyîz çêkiribû. Piştî ew çû min gotibû ‘Nebû miradê keça min, bila bibe miradê hinên din!’ û belav kiribû wê çaxê… Min kinc û tiştên keça xwe sala çûyî ji malê derxistin. Xavika wê hê li cem min e, merxeza[çengelli iğne] wê hê bi xavika wê ve ye! Ez bêhn dikim, bêhn dikim.” (Digrî.) Dayika Remzîye bangî nevîyê xwe yê biçûk dike û dibêje “Here ji sindoqa li odê ye xavika Xurbetê derxe û bîne”. Dema nevîyê Dayika Remzîye anî, xavika Xurbetê bi awayekî pêçayî û merxeza wê hebekî zingargirtî û reşbûyî disekinî… Gava em xavika Xurbetê radihêjinê, dîtina alîyê merxezê yê zingargirtî bêdadîyê, dîtina alîyê reşbûyî jî hebûna jiyanên tarîkirî dide hîskirin…

*Zaroka ku li ser kirasê xwe giya berhev dike*

# Xezal (Gazal) Beru

Xezal deh salî bû. Bo komkirina gulikan bi rê ketibûn. Bo kêra xwe ya wenda bibîne ji havalen xwe qetiya û çû nêzîkî qereqolê. Leşkerên qereqolê kuçikên xwe har kirin û bi ser ve şandin. Bi êrîşên kuçikan hate kuştinê.

Gava me dest bi xebata bîra zarok/tîyê kir, weke karê pêşî em li ser daneyan hûr bûn. Gava em li ser daneyan hûr dibûn em rastî binpêkirinên mafê jîyanê yên ku me metel dihiştin, yên ku emê bi hêsanî pêrgî wan neyên, yên ku emê nebihîzin (heta ji sala 2000an bi vir ve hatine jiyîn û me nebihîstîye) dihatin û me fêhm dikir ku xebata me xebatek bîrê ya çiqasî mezin e û ji bo vê xebatê pêdivîyek çawa heye. Ji bo binpêkirinên mafê jîyanê yên ku ne di bîra me de ne çend mînak: "zarokek di encama polîsan bera dû wî dane ji qatê 7. ketîye, zarokek navê wî nayê zanîn ku di encama polîsan bera dû wî dane ji rêyê ketîye çem, çend zarokan dema pev re bi hewan-top-moşekavêjê dilîstin ji ber teqîna rû daye jîyana xwe ji dest dane, du birayên bi navê Mihemed û Fûrkan ên ku gava li malê di xew de bûn di encama wesayîta zirxî li dîwarê mala wan xistîye jîyana xwe ji dest dane, zarokên gava li mala xwe di xew de bûn di encama guleyên topê li mala wan ketîye jiîyana xwe ji dest dane..."

Gava em li ser binpêkirinên mafê jîyanê yên hejmara wan digihêje bi hezaran û birîndarîyên ji ber binpêkirina mafan hûr dibûn, bûyerek ku me dilerizand û di civînen me de hertim di rojeva me de bû hebû: "Gazal Beruya(Xezal) 11 salî di sala 2001an de li gundê Saxnîsê yê navçeya Kanîreşa Çewlîgê di encama leşkeran kûçik bi ser wê de berdan hate kuştin." Mirin di raporê de weha derbas dibe. Qetilkirina hevala me ya bi vî awayî bi miameleyek dermirovî, awayekî kuştinê yê ku me qet nizanîbû û nebihîstibû bû. Gava me di derbarê Xezalê de dest bi lêkolînê kir em gîhaştin agahîyên pir hindik, em li ser raporên piştî bûyer qewimî derketibûn hûr bûn. Di rapora piştî lêkolînên heyetan alîkarê Gerînendeyê Giştî yê İHDê Osman Baydemir daxuyandibû de, hatibû gotin ku ji sala 1994an bi vir ve di encama êrişên kûçikan de gelek kes birîndar bûne. Li gor encama xebata me ya daneyî jî di sala 2006an de di encama êrişa kûçikan de sê hevalên me yên birîndar bûne hene. Jê pê ve emê şahidîya xwişka Xezalê Meral Beru ya di rapora heyetê de derbas dibe, di nivîsa ekşî sözlükê de ya ku li jêr pev re bibînin.

Xezal zarokek 11 salî bû û hevala me bû. Me xwest em çîroka hevala xwe bi bîrkirinê[*hafızalaştırıp*] nas bikin û bigihêjin hevala xwe. Di pêvajoya me ya qadê de em hema hema bi hemû sazî û kesên li herêmê re ketin têkilîyê û me hewl da em bigihêjin malbata Xezalê û hevalên wê. Û çi heyf ku qet bi

tu awayî me nekarîbû bi malbata wê û hevalên wê re têkilî danîya. Em dîsa jî dixwazin pir bi sînor be jî çîroka Xezalê neqil bikin. Li jêr, jêwergirtina me ji kesekî bi navê bikarhêner ê anonîm nivîsandîye kirîye ku di ekşi sözlükê de em lê rast hatin çîroka Xezalê neqil dike.

> *hazal berü keçeke di sala 1991an de ji hecî û zibêdeyê çêbûye ye... hûn navê wê çawa dinivîsînin binivîsînin, xezal berü, gazal berü... qet ferq nake.*
>
> *ev keçika di 1991an de çêbûye di mêjûya 19ê adara 2001an de ji alî kûçikên li ber qereqola cendirmeyan a bajarê çewlîgê navçeya kanîreşê gundê saxnîsê rastî êrişê hat. ji ber birînên giran ên li ser laşê xwe jîyana xwe ji dest da.*
>
> *keçeke 10 salî rastî êrişa kûçikan tê.*
> *10 salî...*
> *em werin ser tiştên wê rojê hatin jiyîn...*
> *sedem; gîhaya gulikê...*
>
> *"..reng, kulîlk û pelên gîhaya gulikê ya li çîyayên çewlîgê şîn tê ji ya li behra spî şîn tê cuda ye. Gulika behra spî, ji metreyekê zêdetir dirêj nabe. lê qama gulika li rojhilat şîn tê heta du metreyan dirêj dibe dehere. gulika li rojhilat şîn tê di binê wê de pelên dişibin şerîdan ên baqan çêdikin û goşîyên kulîlkan yên di rengê spîya ber bi pembe ve dihere tune ye. pelên wê di şiklê rozetê de ye û di hundirê van pelên kesk de, di mehên biharê de bi rojên bi tav yên pêşî re kulîlkên zero zero vedikin..."*
>
> *"..ev pelên di şiklê rozetê de yên şîn î di hundirê wan de kulîlkên zer vedikin weke sebze dihatin xwarin, ji kokên wan yên dihatin hişkkirin jî gulik dihat bidestxistin.."*
>
> *"..ne gîhayek ji her derdî re derman bû bi navê xwe yî di latînî de 'eremurus spectabilis'. salên ku toza ji kokên wê yên hatine hişkkirin maye bi leymûndiz û talîjarîyê re dihat lihevxistin, celebek merhema birînan baş dike dihat bidesxistin belkî jî pir li paş mabû.."*

*têkîlîya wê ya bi mijara me re;*
*“..zarokên gundê saxnîsê her sal, dema bihar dihat, derdiketin berhevkirina gulikê. weke zarokên din ên li gundên cîran. heke di demek evqas zû de ji kokên xwe neyên hilqetandin û di ser re demsalek havînê derbas bibe, gulik bi qasî qama zarokekî derbas bikin dirêj dibûn û diçûn. lê zarok bi meha biharê re li çîya û giran digerîyan, pelên gulikên didîtin, carinan bi kokên wan re didan hev..”*

*rûdan;*
*“.. ji bo çûna qada gulik lê ne ji ber qereqola gundê saxnîsê ya girêdayî navçeya kanîreşa çewlîgê dihat derbasbûn û çûyîn. zarokên keç ên gund roja bûyer qewimî, serê şeveqê civîyabûn û ketibûn rê. Amadehîyên wan tam bû, ji bo gulikan jêbikin kêrên zarokan jî di destên wan de amade bûn. ji tiştên ewê bên serê wan bêhay di nava coşê de ketin rê..”*

*“..hejmara mirovên rastî êrişa kûçikên li ber qereqola saxnîsê disekinîn û dihat zanîn ku ji vir xwarinê dixwin ne hindik bû û bi ser de mirovên di van êrişan de birîndar bibûn ji sala 1994an bi vir ve di vê mijarê de gilî dikirin, lê nekarîbûn mercîyek guh bida van gilîyana bidîtana..”*

*bûyer;*
*şahida herî nêzîk xwişka wê meral berü vedibêje;*
*“..roja bûyerê şeveqê li dor nehan ez, xwişka min xezal, û ji dehan zêdetir zarokên keç em pev re çûn berhevkirina gîhaya gulikê. ji bo berhevkirina gîhaya gulikê ji ber ku diviya di ber qereqolê re bê derbasbûn em ji ber qereqolê derbas bûn, lê piştî demekê me ferq kir ku xezal kêra me wenda kirîye. bi xezalê re em ji keçikên din veqetîyan û ji bo em li kêra xwe bigerin em paş de vegerîyan. gava em gîhaştin qereqolê, leşkerên ji me nêzî 15-20 metreyan dûr di du mewzîyên cuda de nobet digirtin hebûn. li hundirê hewşa qereqolê ya bi têla direhî dorpêçkirî çar, ji mewzîyan a nêzîktirî me hema li cem wê du kûçik disekinîn. leşkerê li mewzîya nêzîkî me nobet digirt ji me xwest ku em ji vir bi dûr bikevin. Min jî got ‘birayê leşker, me kêra xwe wenda kir, gava em bibînin emê herin’. leşker me nîşanî kûçikên li cem xwe da*

*û got 'bigire!'. li ser vê yekê du kûçikên hema li cem mewzîyê disekinîn dest pê kirin bi reyîn ber bi me ve bi lez hatin. gava kûçik gîhaştin me pêşî dev me nekirin. tenê direyan. ji ber ku xezal ji min biçûktir bû ditirsîya û digrîya. min wê xist pişt xwe. kûçik pir mezin bûn. ez jî tirsîyam, min dest bi girî kir. min bi awayê 'birayê leşker neke, birayê leşker ewê dev me bikin, birayê leşker me xelas bike' dikir qêrîn. li ser leşkerê di heman mewzîyê de dîsa got 'bigire!', kûçikên di hewşa qereqolê de jî têlên direhî derbas kirin û gîhaştin me. min fêhm kir ku ewê dev me bikin. em jî ber bi hundirê goristanê ve revîyan. ji ber ku xezal xwe bi kincê min girtibû maweyekê bi min re revîya. lê ji ber ku dîwarê goristanê hebekî bilind bû xezal nekarîbû derketa û pênc şeş kûçikan pev re xezal gez dikirin û wê dikişkişandin. min dest pê kir bi qêrîn ber bi gund ve bazdam.."*

*"..kûçik kûçikên qereqolê ne, hertim li wir disekinin. heke leşker negota bigire ewê kûçikan êrişî me nekirana.."*

*şahid 2 – leşkerê nobet digirt*
*"..li gor vegotina şahidan dûrahîya navbera cihê bûyer lê qewimî û leşkerê nobet digirt ji çend metreyan pêk dihat û leşkerekî qereqolê yê ku dema bûyerê li dûrahîyek pir kin di nobetê de bû, sedema mudaxile nekirina xwe weha rave kiribû; 'min nekarîbû cihê nobetê terk bikira!.."*

*encam;*
*"..meral di nava tirsê de revîyabû û ji gundîyên pêrgî wan hatibû re, gotibû xwişka wê rastî êrişa kûçikan hatîye, xwestibû wê xelas bikin. çi heyf ku êdî pir dereng bû... yên ku gîhaştibûn û hatibûn tiştekî zêde karibin bikin nemabû. gava çûbûn ber serê xezal kûçik jî di rewşa sakînbûyî de bûn. ji ber ku xezal êdî nekarîbû biperpitîya jî. laşê wê ji tevgerek êrişkarîya kûçikan zêde bike bêpar bû. kincên lê bûn perçe parî bibûn û laşê wê yê bi diranê kûçikan perçe bibû hey xwîn jê diçû.."*

*"..laşê xezal ê ku tazî û di nav xwînê de li betanîyekê pêçan. ji binefserekî sedye xwestin gundîyan. binefser got 'sedye tune ye' ji wan re... pê re xeber şandin ji gundîyekî re, qemyoneta aîdî wî anîn cihê*

*bûyerê, xezala li betanîyê pêçabûn xistin vê qemyonetê û ber bi kanîreşê derketin rê..”*

*ders;*

*“lê li welatê min îro*
*xwîna mirov ji avê erzantir e*
*lê belê keda herî xweşik mirov bi xwe ye*
*ma hêsa ye ji xewên xwînî rabûn û*
*lorandin” 14*

Û dîsa em li mînakek dinê ya polîtîkaya bêcezatîyê rast tên ku weke mekanîzmaya xelatê faîl dernakevin holê û binpêkirina mafê jîyanê yê Xezal bi bêdadmendîyê encam dibe… Vekolînên di raporên heyetê de cih digrin ji me re neqil dikin ku bûyer nehatîye pirsyarîkirin, berpirsîyar (faîl) derneketine holê. Ji vê re hebekî be jî STK bûne deng. Ji alî walîtîyê ve destûr nehatîye dayîn ji bo çêkirina çalakîyên Xezal Beru yên ku piştî Xezal jîyana xwe ji dest da di sala 2004an de destpê kirin. Çalakîyên ji alî İHDya Çewlîgê ve her sal bi îstikrar li ser navê Xezal Beru dihatin organîzekirin heta sala 2010an berdewam kirine. Çalakîyên weke “Pêşbirka Xezal Beru ya Çîrok û Helbestê”, “Çalakîya Xezal Beru ya Bafirok û Hawirdorê” hatine lidarxistin lê piştî sala 2010an çalakîyên li ser navê “Xezal Beru” dihatin lidarxistin ji alî walîtîyê ve hatine qedexekirin! Ji bo hûnandina bîrê, encax bi çalakîyên evqasî watedar û xweşik ku zarok jî tê de daxilkirî, dikarîbû tevkarî bihata kirin. Ya ku hatîye qedexekirin ne çalakî ne, ya ku hatîye qedexekirin a rast îsrara nejibîrkirina Xezal e…

[14] Çavkanî: https://eksisozluk.com/entry/10621883




Ji Şahiya İHDê Wêneyek

Xezal hevalek me ya ku weke zarokekê di nava rengên xwezayê dîyarîyî wê kiribû de, di nava jîyanê de digerîya bû. Ber bi jîndarîyê ve diçû, bi xwezayê re hevdu nas dikirin, hem jî li qadek  gera zarokekî herî pir lê dikare pêkan be, li gundê xwe. Em li nava xweşikahîyên xwezaya kipkesk pêşkêşî me dikir bûn, me bi hemû hesasîyeta xwe ya zaroktîyê pêl axê dikir, ji bo em li van deran bimeşin me yê mirin bida ber çavê xwe hem jî dema em zarokek biçûk bûna, hem jî dema derdên me yên biçûk yên weke em kêra xwe li paş nehêlin hebûya. Ewê kê zanîbûya encama veya ewê mirinek weha hovane bûya...

*Di bîra zarokan de mirina zarokan*

# Pêlavek

Ji çavê zarokekî, tiştên di derbarê qetilkirina zarokekî din de hatin neqilkirin...

Mirina Beşîrê li Lîcê hate qetilkirin derbasî qeydan jî nebûye. Ji wî bi paş de pêlava wî ya li cihê mayin lê teqîyayî û bîra zarokên li gund a li ser wê pêlavê hatîye avakirin maye. Em bi ciwanek ji gundê Beşîr re ku nexwest navê xwe bide di derbarê qetilkirina Beşîr de tiştên ji zaroktîyê di bîra wî de mane peyivîn...

Hevpeyvîn

Li ser daxwaza kesê pê re hevpeyvîn hatîye kirin navê wî/wê veşartî hatîye hiştin.

## “Ev çi pêlav e, çima hêlek wê tune ye?”

-Tu dikarî hebekî xwe bide naskirin?

Ez li gundê Gir yê bi ser Lîceya Amedê ve girêdayî ye di 1995an de çêbûm. Malbata me bi piranî bi cotkarîyê mijûl dibû, hilbet pê re xwedîkirina heywanan jî. Ez heta 5-6 salîya xwe ji ber çonga bavê xwe venediqetîyam û bi wî re diçûm nav zevî û mêrgê. Li gundê me qereqolek heye, dora qereqolê bi çîtan hatîye girtin, li hin cihên wê yen dîyar xetereya mayin lê hebe heye. Çopên leşkerîyê hebûn, em jî dema zarok bûn bi zarokên cîranan re hertim diçûn ser van çopana û me hewl dida em hin malzemeyên dîyar bidin hev. Hin ji vana konserve, sabûn, şampûan, alavên kevn ên destê duyem ku ewê neyên bikaranîn... Rojekê gava ez bi bavê xwe re çûm çêrandina heywanan, ez dibêm hê temenê min li dor 6an bû, weha di bîra min de maye, min pêlavek dît; şewitî bû, tenê hêla wê ya dawîyê şewitî bû pir tiştek bi hêla serî nehatibû, li qadek rast disekinî. Min got “yabo”, “Ev çi pêlav e, çima hêlek wê tune ye?” Got “Ev pêlava rehmetîyê Beşîr e.” Min pirsî bê ka çawa mirî ye.. Pêl li mayinê kir... Mayin çi ye... Ha dixin bin axê gava tu pêl dikê tu diteqî, tu dimrî... Baş e lê ewê kî, ji bo çi vê bike? Cihê em niha pêl dikinê bi mayin e, em ji ku dizanin?... A rast cihê em pêl dikinê dibe ku bi mayin be jî nebe jî... Li gundê me çend heywanan jî gava pêl li mayinê kirine mirine.. Kî vê dike... Dewlet ji bo xwe biparêze vêya dike. Ha li hin cihên dîyar mayinan dixe bin axê... Min got, ev çawa parastin e. Tê nobetê bigrî, tiştekî dinê bikî lê xistina mayinan çi ye?

### *Beşîr gotibû qey mayin pêlîstokek e û ji bo kêfkirinê pê lîstibû*

Werhasil paşê çîroka Beşîr di aqlê min de disêwire. Berîya her tiştî ez nizanim ku mayin çi ye. Ez nizanim ku tiştekî çawa ye. Ez nizanim ku Beşîr bi kîjan nigî pêl kirîyê. Hertim vana di aqlê min de derbas dibin. Ha ez hertim van pirsana ji bavê xwe dipirsim: Çima ev pêlav ewqas sal in li vir e û kes ranahêjê. Malbata Beşîr li ku ye, çima ranahêjin vê pêlavê? Ji ber vê bûyerê bi min re trawmayek cidî çêbû. Lewra zarokek we heye, dimre, paşê cendekê wî perçe perçe dibe. Pêlavek şewitî ya ji zaroka we maye heye, malbat çima ranahêjê? Ez hertim bi

wan pirsan derdikevim hemberî bavê xwe. Bavê min dibêje malbata wî jî ne li van deran e, çûn. Min pirsa “Baş e, ji wan heyaman yekî ku Beşîr nas dike heye?” kir. Got ku xalê te Mihemed, ew û Beşîr di heman temenan de bûn. Wê rojê her du pev re heywan birine çêrandinê, ev bûyer qewimîye. Paşê ez bi xalê xwe Mihemed re peyivîm, min got ku Beşîr çawa mir? Wî ji min re weha vegot: A rast Beşîr pêl li mayinê nekiribû, Beşîr gotibû qey mayin pêlîstokek e û ji bo kêfkirinê pê lîstibû û mayin di hundirê çend sanîyan de teqîyabû. Xalê min jî ligel ku di navbera wî û Beşîr de hebekî dûrahî hebû jî di guhê wî de hin pirsgirêk çêbibûn wê heyamê. Malbatên me jî me ji ber bûyera Beşîr, ji bo em nerin ser sergoyê leşkerîyê û li wan hêlan negerin hertim me hişyar dikirin, hertim bûyera Beşîr tanîn bîra me: Digotin hûnê bibin weke Beşîr, hûnê weke Beşîr bimrin... Vê jî bi me re hertim tirsek, trawmayek çêdikir.

## *“Gava me leşkerek didît em direvîyan”*

- Di wê heyamê de li Lîcê li gund atmosfer bi giştî çawa bû? Yanî rewşa di hundirê şerekî de bûnê, rewşa di bin sîya çekê de bûnê pir giran bû li gundê we an hê siviktir bû?

Di wê heyamê de têgihiştina min a bûyerên bi vî rengî ne pir pêkan bû. Tenê ji wê heyamê di bîra min de vana mane, gava me leşkerek didît em direvîyan, gava fermandarek dihat gund hertim me xwe vedişart. Bavên me, apên me di wan heyaman de tundî dîtibûn, hertim ji me re qala vana jî dihat kirin. Bi piranî jixwe demên me yên çûna çopê jî bi vê heyamê re têkildar bû. Hê bêtir ber bi êvarê re, gava roj diçû ava berîya tam weha tarî bibe gava ronahîya bi qasî em karibin ber xwe bibînin dima em diçûn. Heke tu bipirsî bê çima di wan deman de... Li gundê me qereqol heye, dora wê bi çîtan girtî ye. Çopa leşkerîyê datanîn qadên hebekî nizim, ango cihê herî nizim ê berîyê. Me jî di wan saetên leşkeran me nedidîtin de diçû alavên xwe didan hev, tanî carinan li malê carinan li cihekî din vedişart û em weha vedigerîyan. Di wam deman de herçî ku jîyana li gund baş nayê bîra min li gundê me hê bêtir malbatên heywan xwedî dikirin û bi cotkarîyê debara xwe dikirin hebûn. Gundê me vediqete du cihên cuda, yê ku em dibêjin gundê kevn, yê ku piştî erdheja Lîcê ava bû, ku tê de pergalek holikan[baraka] hebû, em jî di wê holikê de dijîyan.

Yên ku malên wan di erdheja Lîcê de xera nebibû jî li cihê niştecih ê kevn ê gundê niha dijîyan. Lê bi piranî di nava hemû gundan de yekîtîyek, hevbandorî, têkilî bi zêdeyî hebû. Dikare bê gotin ku di wê heyamê de jîyana gund bi piranî bi xwedîkirina heywanan û cotkarîyê re li hev dihat.

*"Bi hezaran zarok, bi hezaran heywan, bi hezaran mirovên me yên li ser sergoyê leşkerî mirin hene."*

- Gava me bi giştî li daneyên di derbarê mirina zarokên li bajarên Kurdan de ne niherî em pir zêde rastî bûyerên têkildarî sergoyê leşkerî hatin. (Mirinên gava li ser sergoyê leşkerî li tiştinan digerîyan, gava li ser sergoyê leşkerî dilîstin qewimîbûn.) Ev berê xwe dana zarokan a ji bo sergoyên leşkerî -hilbet dibe ku gelek sedemên wê hebe- ji ber çi bû? An jî hemû sedem dibûn yek û wan ber bi wir ve dahf didan?

"Niha ez pêşî bûyerê bi çîroka min bi xwe jiya li hev bînim û paşê di derbarê ez bi giştî çi difikirim de daxuyanîyekê bidim. Niha hewldana zarokên li gundê me ya hertim ji bo dîtina tiştinan, çend ji sedemên bingehîn a xwedîbûna tiştinan aborî bû, sedemên din jî enerjî û reqabeta zaroktîyê dida bûn. Dikare bê gotin ku yek ji sedemên me jî ber bi sergoyê leşkerî ve dahf dida têkilîyên reqabetê yên di nav zarokan de bû. Ez mînak didim gava çop dihate avêtin me dizanîbû ku wê rojê çop hatîye avêtin, gava wesayîta leşkerî diçû em li benda saeta êvarê diman û diçûn. Çima? Ji bo ku berhema herî xweşik em bi xwe rahêjinê. Ne tenê zarok mezinên me heta yên kal jî diçûn pêdivîya xwe ya konserveyê ji wir temîn dikirin. Û yanî bûna sergoyê leşkerî ya li wir... bi rastî li gor cihê xwe cihekî pir absurt, pir balkêş e. Lewra leşkerî jixwe qereqola xwe, jixwe ji hêla xwe ve erdekî xwe ya pir mezin heye. Erdekî xwe ya dora wê bi çîtan hatîye girtin heye. Li wir ne li cihekî tesadufî lê hê bêtir li cihekî qismê herî nizim ê berîyê xistina wê ji hêla me ve jî dikir ku em hêsantir bigihêjinê. Jixwe xwestina em weke gundî ji sergo fêdê bibînin bi wan re hebû. Lewra valakirina li wî cihî bi eşkereyî vê nîşan dide: 'hûn dikarin tev bidin'. Li beşê paş ê qereqola leşkerîyê cihekî nêzî 10-15 an jî 15-20 donimî heye. Tu dikarî vêya bi rehetî binax bikî an jî bi awayekî din ji holê rakî. Ango ez bawer im ku yê li ser sergo qeza hatîye serî ne tenê Beşîr e

lewra weke te jî got îro li vê erdnîgarîyê bi hezaran mirov, bi hezaran heywan, bi hezaran zarokên me yên li ser sergoyê leşkerî mirine hene. Evqas bêbesîret, evqas bi awayekî hêsan xistina holê ya van sergoyana ya rast me weha dide fikirandin: Gava em ji îro li rabirdûyê dinerin, gelek tişt bi zanebûn hatine kirin, ji bo gelek tiştan bi qasî têrê bike tedbîr nehatîye stendin û bi vî awayî nêzîkbûna li vê bûyerê ji hêla wan ve hê bêtir girîng bûye. Lewra gava em niha lê dinerin bi rastî di wê heyamê de hin heywanên dîyar jî pêl li mayinê kirin, ew heywan jî telef bûn."

## "Heke min ew pêlava nedîta ezê pir talîyê hînî bûyera Beşîr bibûma"

- Cara pêşî gava te pêlav dît tu hîn bû ku bûyer qewimîye?

"Eyn weha. Hebekî ji ber zaroktîya xwe ez mirovek bi meraq bûm. Min hertim ji bavê xwe pirs dipirsîn heta dema bersiv nedida, min wî hêrs dikir, carinan ji ber vê sedemê bûye ku şîmaq jî li min xistîye: Digot ku "Tu pirsên çiqasî tewşo mewşo dipirsî". Lê ji ber zaroktîya min binyadek min î pir bi meraq hebû. Wê rojê li wir bûna wê pêlavê bala min kişandibû û hêla wê ya pêşî di eslê xwe de saxlem, hêla wê ya dawîyê  yanî hêla pehnîyê jî şewitî bû vê jî bala min kişandibû, yanî min meraq kir bê çima weha ye. Yanî wê rojê heke min ew pêlava nedîta ezê pir talîyê hînî bûyera Beşîr bibûma. Lê bi saya ew pêlav wê rojê li wir bû pêvajo weha pêş de çû: Bi pêşî vê ji bavê min pirsîna min paşê jî çûn û pirsîna min a ji xalê min, taliyê jî meraq kirina min a malbata Beşîr û bi hînbûna min a mayin dişibe tiştekî çawa ya ji xêzefîlman teşe girt.

Ma min bersiva pirsên min dipirsî distend, min distend. Lê tu objeyê nasnakî, tu nizanî Beşîr çawa mirî ye, bi awayekî çawa qewimîye weha tu pir meraq dikî, heta tu dibehecî bê ka çawa dibe ku pêl li mayinê dike û dimre. Mayin tiştekî çawa ye, ma cinawirek e? Yanî tu pir meraq dikî, bi demê re tu vê hîn dibî û ji ber vê ye ku ev pêlav li ber çavê min evqasî bi qîmet e. Çima ji alî wê malbatê ve li qorzîyek malê nehat daliqandin, ez îro hê difikirim ku gelo ji ber ku tiştekî ewê dîsa êşa wan nû bike ye (lewra hê bandora wê heye). Ya na ka çima ew pêlav ji wir nehat rahiştin?"

-Qada pêlav lê bû qet tê bîra te, zevî bû, mal hebû li kêleka wê?

“Belê tê bîra min. Ez weha vebêjim, gundê me hebekî girik e, bi çîya ye heta navê gundê me ji Kurdî cihê bi girik tê, li qismek wê jixwe mal hebûn, li qismê girik jî kanîyek hebû, kanîyek xwezayî, mal jî li dora kanîyê kom bibûn. Li qismên din jî bi piranî zevî û qadên heywan dikarin lê biçêrin ku em jê re dibêjin mêrg hebûn, ha li vê qada mêrgê di heman demê de çopên leşkerîyê hebûn. Ha cihekî weha hebekî bi çîya, bi kert û kort bû, a rast qadek hêlek wê berîyek ripîrast hêlek wê jî hindikekî girik bû. Qada pêlava Beşîr lê bû cihekî ha ji berîtîyê weha hêdîka derbasî girik dibe, niha jî te dît li wir rez û baxçe lê ne bû.”

## “Ew pêlav 7 salan li wir ma.”

-Baş e çiqas wextî li wir ma tê bîra te?

“Belê. Wê hingê ez 6 salî bûm, hê min dest bi dibistanê nekiribû, heta em ji gund derketin ew pêlav 7 salan li wir ma. Di 13 salîya min de me ji gund bar kir bajêr. Ew pêlav wê hingê hê li wir bû û li dora pêlavê min û kûzenê xwe me çend kevir danî û me pêlav dîsa danî wir.”

## “Min pêlav dixist destê xwe û min hewl dida heta nimra wê ez lê binerim.”

-Baş e te û kûzenê xwe we bi çi armancê kevir danîn kêleka wê pêlavê?

A rast gava ez bi kûzenê xwe re diçûm heywanan biçêrînim pêlav li navenda çêrandinê cih digirt. Min hertim ji kûzenê xwe jî pêlav dipirsî lewra te dît bi temen ji min mezintir e, te dît bi Beşîr re ne di heman temenî de be jî ji min mezintir e… te dît min ji wî jî dipirsî ha bê çawa bû û qewimî. Weha min erd dikola pêlav dixist destê xwe, min hewl dida heta nimra wê ez lê binerim. Jixwe ji ber ku qismê pehnîyê tune bû min nedidît. Ha ez hertim bi pêlavê re eleqedar dibûm, car dibû ku min radihişt kevirên li derdorê û pêlav vedişart jî, ha car dibû ku piştî wê bi heftakê min derdixist jî. Di dawî de fikra dora wê çîtkirinê hat û min pêlav xiste navê û li dora wê 5-6 heb…

-Piştî we bar kir Amedê te her tişt ji hev derxist?

“Na ya rast berîya wê çêbû. Lewra telewîzyona pêşî bavê min anîbû gund, te dît me tê de li xêzefîlman filan temaşe dikirin. Te dît mesela mayinê, di sehneya mayinê ya Tom û Jerry de hate aqlê min û gava em li gund diçûn dibistanê jî em hînî hin teqemenîyan dibûn. Hilbet piştî wê min hebekî dinê pev xist û mesele ji hev derxist.”

-Tu jê agahdar bû ku tu pêvajoyek darizandinê ya bûyerê çêbû yan na?

“Na. Ne tenê di derbarê vê bûyerê de, apê min, bavê min, kalkê min, mervên me yên din ên gund, gundîyên me  yên belasebeb hatin lêdan qet bi tu awayî li hemberî dewletê tu berxwedanek wan a heq û hiqûqê çênebibû ku bûyera Beşîr jî weke şaşîya Beşîr be hate tevgerandin li gund. Bertekên weha dihat dayîn...”

-Bertekên weke ew çima li wir bû?

“Eyn weha. Weke bila baldar bûya... Bûna sergoyî ya li wir qet bi tu awayî nehat pirsyarîkirin lê bûna Beşîr a li qadek xwezayî hate pirsyarîkirin. Niha jî heke bûyerek biqewime dîsa lêpirsînek, tiştek te dît ez nafikirim ku ji alî gundê me bê vekirin.”

-Baş e piştî bûyerê te bi malbata wî re tu têkilî danî û ji malbata wî paşê te çi agahî stendin an jî te stend?

“Min nekarîbû bi malbata wî re dîyalogekê çêbikim, tenê ji ber ku paşê min malbata wî pir meraq kir, çi dikin, li ku ne, bi çi karî mijûl dibin ez wana jî hîn bûm. Piştî bûyera Beşîr tam bi 2 an jî 3 salan tiştê ji min re hate gotin di hundirê vê demê de bavê wî tê kuştin. Yanî faîl ne dîyar e, weke faîlî meçhûl... Piştî wê heyamê li gund mirinek din rû dide, malbatek dinê. Ew jî faîlî meçhûl. Ha ji ber vê rewşa malbatê ji ber mirina Beşîr û bavê wî malbatê bar kirîye Erzinê. Bar kirîye Hatay Erzinê. Di serî de weke karkerên rojê-mûsimê dest bi kar kirine. Niha jî bi karên awayê pirtiqal, narencîye yên çandinîyê mijûl dibin. Niha karker in.”

-Weke dawî peyamek te ya taybet heye?

“Di rewşên vî cureyî de qe nebe em dikarin vêya bibêjin: Ji bo Beşîr û yên weke Beşîr mirin ji weke bavê Beşîr faîlî meçhûl bûna wî bêtir ez dikarim neqil bikim ku em dixwazin hîn bibin ew kî ne û divê faîl bê dîtin. Yanî di vê xalê de hem li gundê me, hem li gundên derdorê

nezanîna mirovan a heqê xwe-hiqûqa xwe, vana hîn nebûna wan û heta îro jî bûyerek Beşîr biqewime berxwedan nedana gundan, malbatan, nezanîna wan î heqê wan hiqûqa wan çî ye me xemgîn dike. Peyama ez dixazim bidim jî hînkirina lêgerîna heqê xwe hiqûqa xwe ye, ji vana re xêzkirina rê-rêbazek û metodekê ye. Lewra hew di wê rewşê de ewê bûyer hebekî dinê derkevin holê û dikarin hindik bibin.”

# Hîn dîmenên ji pêvajoya xebatê



Bi Dayika Xurbet, Remzîye Kılıç Re





Bi Dayik Û Bavê Rozerîn, Fahriye Û Mustafa Çukur Re



Bi Dayik Û Bav Û Xwişka Nihat Re



Bi Dayik Û Bavê Cizîrê Re

Ev grafîkên ku di navbera salên 2000 û 2020an de binpêkirina mafên jiyanê yên zarokan nîşan didin, bi saya raporên saziyan hatine tomar kirin.

### Çavkanî

https://tihv.org.tr/yillik-insan-haklari-raporlari/

https://www.ihd.org.tr/td_d_slug_2/

https://www.mazlumder.org/tr/main/yayinlar/yurt-ici-raporlar/3/&SayfaNo= (Kürt illerine dair raporlar)

### Raporên Komeleya Gündem Çocuk

https://www.raporlar.org/2011-gundem-cocuk-yasama-hakki-raporu/


https://www.raporlar.org/turkiyede-cocuklarin-yasama-hakki-raporu-2012-gundem-cocuk/

https://www.raporlar.org/turkiyede-cocugun-yasama-hakki-raporu-2013-gundem-cocuk/


https://www.raporlar.org/turkiyede-cocugun-yasama-hakki-raporu-2014-gundem-cocuk/

https://www.raporlar.org/turkiyede-cocugun-yasama-hakki-raporu-2015-gundem-cocuk/


# Li gor sal û temenên xwe zarokên ku hatine kuştinê û birîndarkirinê




## Li gor bajaran zarokên hatinê kuştinê





## Li gor bajaran zarokên hatinê birîndarkirinê



# Li gor temen û salan hejmara zarokên hatine kuştinê




# Li gor temen û salan hejmara zarokên hatine birîndarkirinê



**Heke Nehatina Kuştin dê Niha Hevalê Me Bûna**

Li Bajarên Kurdan Binpêkirinên Mafê Jiyanê yên Zarokan

HAKİKAT ADALET HAFIZA MERKEZİ

HAFIZA MERKEZİ

Spasî bo Chrest Foundatîon û Komeleya Heînrîch Böll Stîftungê ji ber alikariya wan bo vê xebatê.

CHREST FOUNDATION

HEINRICH BÖLL STIFTUNG DERNEĞİ TÜRKİYE TEMSİLCİLİĞİ